



Kovara zîmanê kurdi

KANÎZAR

hejmar 2, 2015

Naverok

Sernivîsar: *Kanîzar* zaravayên kurdî tîne ba hev

Husein Muhammed: Peyvsazî bi dariştinê

Rizgar Behadur: Gerdnîş le kurdî kirmaşanî

Peyva vê carê: Zanîn

George Yule: Dirûvên dangan di zimanê de (ji inglîzî: Dilyar Amûdî)

Nasandina kitêbekê: Rêzimana kurdiya başûrî bi fransî

Hasan Aslan: Rêzimana soranî bi zazakî

Ferhengoka zimannasî

Diyako Haşimî: Zanistî wergêrran

Şoreş Reşî: Lêkolînên nû li ser hindûewropî

Dilyar Amûdî: Ravek di soranî de

Dadname – ferhengoka dadnasî ya inglîzî-kurdî

Kurterêbera rastnivîsînê

Sernivîsar

Kanîzar zaravayên kurdî tîne ba hev

Kerem bikin hejmara duyem ji kovara ziman û zimannasiya kurdî, Kanîzarê, xwendevanên hêja.

Em vê hejmarê bi çar zaravayên kurdî pêşkêşî we dikin. Ji bilî kurmancî, di vê hejmarê de nivîsek bi soranî, yek bi kurdiya başûrî (bi devoka kirmaşanî) û yek jî bi zazakî peyda dibe. Ji bilî nivîsên bi zaravayên cuda, em herwiha zaravayan bi hev didin nasîn: Di vê hejmarê de du nivîs li ser rêzimana soranî hene lê ew ne bi soranî ne. Yek bi zazakî û ya din jî bi kurmancî ye. Em herwiha kitêbeke li ser kurdiya başûrî (feylî, kelhurî, kirmaşanî) bi kurmancî bi xwendevanên hêja dinasînin.

Di vê hejmarê de Husein Muhammed vekolîna xwe ya dirêj li ser peyvsaziya kurdî didomîne. Vê carê mijara wî peyvsazî bi dariştinê ye anku bi alîkariya paşpirtik û pêspirtikan (sufîks û prefîksan). Heman vekolîn dê di hejmarên bîn de jî berdewam be.

Rizgar Behadur nivîseke bi kirmaşanî li ser daçekan (prepozisyonan) di wê devokê de de pêşkêşî dike. Wek di hejmara yekem de jî, Dilyar Amûdî vê carê jî nivîsarek ji kitêba zimannasê navdar George Yule wergerandiye. Mijara vê carê dengnasî (fonolojî) û dengdanî (fonetîk) e.

Dilyar herwiha waneyek anku dersek li ser ravekê di soranî de jî bi kurmancî pêşkêşî dike. Mijara duyem û dirêjtir ya li ser rêzimana soranî, nivîsara Hasan Aslan ya bi zazakî ye. Bi vê nivîsarê kek Hasan û Kovara *Kanîzar* dîrokê qeyd dikin: yekem car e ku rêzimana soranî bi zazakî tê behskirin. Têkiliyên navbera zimanan yek ji giringtirîn mijarên zimannasiyê ne. Di vê hejmarê de Diyako Haşimî di nivîsara xwe ya bi soranî de bi awayekî zanistî û zimannasî nêzîkî wergerandina ji zimaneke li zimaneke din dibe.

Şoreş Reşî bi nivîseke berhevdana kurdî û çend zimanên din yê hindûewropî tevî karwanê *Kanîzarê* dibe. Herwiha em ferhengokeke zimannasî û ferhengokeke peyvên dadnasî anku hiqûqî raberî we xwendevanên ezîz dikin.

Kerem bikin, *Kanîzara* xwe bixwînin û jê re binivîsin!

PEYVSAZÎ -- 2 --

PEYVSAZÎ BI DARÎŞTINÊ

Husein Muhammed



Di peyvsaziyê de mebest ji **darîştinê** (*derivation*) çêkirina peyvan ji peyvên xwerû/sade bi alîkariya **gireyan** (afîks, qertaf, *affix*) e.

Gireyên darîştinê dikarin **pêşpirtik** (pêşgir, pêşqertaf, pêşbendik, prefîks, *prefix*) bin ku dikevin pêşiya peyva bingehîn:

- hêvî → **bihêvî**
- hêvî → **bêhêvî**
- rehet → **nerehet**

Gireyên darîştinê herwiha dikarin **paşpirtik** (paşgir, paşqertaf, paşbendik, sufîks, *suffix*) bin ku dikevin dawiya peyva bingehîn:

- hêvî → hêvî**dar**
- rehet → rehet**î**

Pêşpirtik û paşpirtik dikarin bikevin gel peyvên serbixwe (wek “hêvî” yan “rehet” li jor) yan jî rehên neserbixwe yê lêkeran:

- -zan- → **nezan**
- -zan- → **zana**

Du paşpirtik dikarin bikevin dûv hev jî:

- birîn → birîn-**dar** → hêvî-**dar-î**

Herwiha pêşpirtik û paşpirtik dikarin di heman demê de li gel eynî peyvê peyda bibin:

- hêvî → **bê**-hêvî-**tî**
- ket → **der**-ket-î

Gire herwiha dikarin **navpirtik** (navgir, navqertaf, navbendik, infîks/interfîks, *infix/interfix*) bin ku dikevin nava peyva bingehîn:

- vekirî → **venekirî**
- veşartî → **veneşartî**
- derketî → **derneketî**

Di kurdî de tenê **-ne-** wek navpirtika peyvsaz heye lê navpirtikên çemandinê / tewandinê zêdetir in jî lê ew peyvên nû çênakin, tenê karê çemandinê dikin:

- derkevin → **derdikevin** / **dernakevin** / **dernekevin** / **derbikevin**

Navpirtik dikarin herwiha wek cûreyeke pêşpirtikan jî bîn hejmartin:

- ketî → **ne**-ketî → **der-ne**-ketî

Lê di hin peyvan de forma xwerû peyda nabe. Bo nimûne, em dizanin ku peyva *ve-şart* ji *ve-şart-in* pêk hatiye (bidin ber forma devokî *ber-şartin* û hevwateriya *wê* ya soranî *şardin-ewe*) lê peyva **şartin* wek peyveke serbixwe di kurdî de peyda nabe. Loma em neçar in ku *ve-* beşek bingehîn ji peyva *veşartin* hesab bikin. Loma gava ku em gireya **-ne-** li *wê* zêde dikin û dixin navbera *ve-* û **-şartin**, hingê **-ne-** bi zerûrî navpirtik e, ne pêşpirtik e. Lê li gel gelek peyvên din, ew dikarin wek pêşpirtika duyem bîn hejmartin:

- **wer-ne**-girtin

CUDAHIYÊN GIREYAN JI HEV

Gire dikarin bi kêmî bi van awayan ji hev cuda bin:

- Gire dikarin li gor cihê xwe ji hev cuda bin: Hin gire dikevin berî peyva bingehîn (pêşpirtik), hin dikevin dûv peyva bingehîn (paşpirtik) û hin jî dikevin navbera du beşên peyveke pêkhatî (navpirtik).
- Gire dikarin li gor maneya xwe ji hev cuda bin: Bo nimûne, pêşpirtika “bi-“ maneya hebûna tiştekî dide lê “bê-“ dijawateya wê ye anku maneya nebûna tiştekî dide.
- Gire dikarin li gor “birrgiriya” xwe ji hev cuda bin: hin gire tenê li gel rengdêran li kar in, hin li gel navdêran, hin li gel lêkeran û hwd. Bo nimûne “bê-“ li pêşiya navdêran li kar e (wek “bêav, bêxwê, bêkes”) lê li gel rengdêran nayê bikaranîn (ji bilî hingê gava ku rengdêr bi guhastinê hatibin navdêrkirin anku wek navdêran bèn bikaranîn).

1. RENG DÊRSAZÎ

Mebest ji **rengdêrkirinê** (*adjectivization*) çêkirina rengdêran (sifet, *adjective*) ji birrên din yên peyvan e. Di kurdî de rengdêr dikarin bi alîkariya gireyan ji navdêran (ism, substantîv, *noun*), lêkeran (fiil, verb), hejmarnavan (*numeral*), hokeran (zerf, *adverb*) û cînavan (zemîr, *pronoun*) bèn dariştin. Bo nimûne:

- rengdêr ji navdêran: av → avî, xwê → bêxwê
- rengdêr ji lêkeran: kuşt → kuştî, zan-în → nezan
- rengdêr ji hejmarnavan: yek → yekem
- rengdêr ji hokeran: paş → paşîn, → îro → îroyî
- rengdêr ji cînavan: xwe → xweyî, ez → ezî
- rengdêr ji rengdêran: rast → rastîn, kevn → kevnar

1.2. RENG DÊRKIRINA NAVDÊRAN

Navdêr dikarin hem bi alîkariya pêşpirtikan û hem jî paşpirtikan bibin. Berbelavtirîn pêşpirtikên kurdî yên rengdêrsaz (rengdêran çêdikin) *bê-* û *bi-* ne. Mişetirîn paşpirtika rengdêrsaz *-î* ye lê herwiha *-dar* û *-în* jî berbelav in. Ji bilî wan, çendîn paşpirtikên din jî dikarin navdêran bikin rengdêr.

1.2.1. BI PÊŞPIRTIKAN

BÊ-

- Wate: ya/yê ku tişteke nîne, tişteke tine ye, ji tişteki mehrûm e
- Hevreh: soranî, kurdiya başûrî û zazakî *bê-*, farisî *bî-*
- Hevber: inglîzî *-less*, tirkî *-siz¹*, erebî *bila²*
- Nimûne: bêav, bêheval, bêhêvî, bêkes, bêmal, bêxêr

BI-

- Wate: ya/yê ku tişteke heye, xwedî tişteki ye, tişteke pê re ye, tişteke li gel e
- Hevreh: zazakî *bi-*, soranî *be-*, kurdiya başûrî *we-*, farisî *ba-*
- Hevber: inglîzî *-ful*, tirkî *-li*, erebî *zû-*, *-î*
- Nimûne: bihêvî, bimal, bikar, bixêr, bişeref

NE-

- Maneya “neyînî, menfî, negatîv” dide peyvê
- Hevreh: soranî, kurdiya başûrî, farisî *na-*, *ne-*
- Hevber: inglîzî *un-*, *in-*, tirkî *olmayan*, erebî *la*
- Nimûne: nemêr, nemirov, nemerd, neyar³

PÊŞPIRTIKÊN DIN

¹ Di peyva *namûssiz* (bênamûs) li hin deverên derveyî Bakurê Kurdistanê de jî ketiye kurdî.

² Di peyva *bilasebeb* / *bîlasebeb* (bêsebeb, bê ti sebeb) de ketiye kurdî jî.

³ Di rastiyê de pêşî ev nimûne (mêr, mirov, merd, yar) bi guhastinê ji navdêran bûne rengdêr û paşî jî bûne rengdêrên dijawate.

Ji bilî bê- û bi- jî çendîn pêşpirtikên kêmtir berbelav hene ku mirov dikare navdêran pê bike rengdêr:

- berguman, berdest
- hev: hevbend, hevpar, hevxem
- dij: dijber, dijwar
- bin: binerd
- ser: sererd

Lê peyvên wiha di zimannasiyê de adeten ne wek pêşpirtik lê wek peyvên serbixwe tên hesibandin û peyvên wiha çêkirî jî ne wek peyvên dariştî (bi pêşpirtikan yan paşpirtikan çêkirî) lê wek peyvên pêkhatî (bi hevgirtina du yan zêdetir peyvan peyda bûyî) tên hejmartin. Bo nimûne, peyva *hevpar* ne wek *pêşpirtik + navdêr* lê wek *cînav + navdêr* tê analîzekirin.

Di farisî de carinan *na-* dikeve berî navdêran û wisa rengdêran çêdike. Ev diyarde ji tesîra farisî carinan di soranî de jî tê dîtin. Lê ji bilî çend nimûneyên farismancî yê wek *naumêd* (bêhêvî, bêumêd), di kurmançî de bi pêşpirtikên *na-*, *ne-* mirov nikare navdêran bike rengdêr.

Hev- - pêşpirtik yan ne?

Di kurmançiya navendî û ya nivîskî de cînavê *hev* (each other, birbirini, yekdîger, be'dha be'den) wek peyveke serbixwe heye⁴. Loma mirov dikare bibêje ku gotinên wek *hevkar*, *hevling*, *hevbîr* ne bi pêşpirtika *hev-* lê ji du peyvên serbixwe pêk hatiye. Lê *hev* wek peyveke serbixwe di kurmançiya rojhilatî de ne li kar e. Li cihê wê û varyantên wê *hevdu*, *hevdin*, *hevûdu*, *hevûdin* di kurmançiya rojhilatî peyvên wek *yekûdu*, *êkûdu*, *yekdu*, *êkdu* hene. Lê *hev-* dîsa jî wek pêşpirtik di kurmançiya rojhilatî de jî heye: *heval*, *hevling*, *hevrê*, *hevrik*. Di soranî de jî hevrehê *hev* ya kurmançî *haw-* e lê wek peyveke serbixwe peyda nabe. Di farisî de hevrehê *hev* ya kurmançî *hem* e ku wek *hem*, *him* di kurdî de jî cih digire. *Hem* di farisî de wek peyveke serbixwe jî li kar e lê ji hevrehê xwe ya kurmançî zêdetir maneya *jî*, *herwiha* dide.

Ji ber sebebên diyarkirî statuya paşpirtikiya *hev-* û varyantên wê *hem-*, *him-* di kurdî de ne bi temamî zelal e. Di kurmançiya rojhilatî de *hev-* û di soranî de *haw-* bê şik paşpirtik in ji ber ku ew wek peyvên

⁴ Di hin devokan de tenê bi formên “*hevdu*, *hevudu*, *hevdin*, *hevûdin*”.

serbixwe di wan lehceyan de peyda nabin. Lê di kurmanciya navendî de û di farisî de rola *hev-*, *hem-*, *him-* wek ya paşpirtikan e lê di rastiye de ew peyvên serbixwe ne.

1.2.2. BI PAŞPIRTIKAN

-î

Navdêr dikarin bi çendîn paşpirtikan bibin rengdêr. Mişetirîn paşpirtika rengdêrsaz ^{-î⁵} ye:

- Wate: ji tişteki, xelkê deverekê, têkilî, tişteki, tişteki di nav de heyî, ji tişteki çêkirî
- Hevreh: soranî û farisî *-î*, kurdiya başûrî *-ig* û *-î*, zazakî *-î* û *-ij*, pehlewî *-eg*, avestayî û hexamenişî *ye-eke-*
- av → avî
- evîn → evînî
- zivistan → zivistanî
- şev → şevî
- pirteqal → pirteqalî

Ev paşpirtik di erebî de jî heye û erk û wezîfeya wê jî çêkirina rengdêran ji navdêran e. Paşpirtika erebî û ya îranî têkilî hev bûne û di kurdî de êdî ne herdem diyar e ka ew ji îranî yan jî ji erebî ye. Di peyvên ji erebî wergirtî yan bi rêya erebî wergirtî de, peyva xwerû hatiye kurtkirin

- Fransa → fransî
- Îtalya → îtalî (herwiha îtalyayî)
- Almanyaya → almanî (herwiha almanyayî – lê ev nadir e)
- Kanada / → kanadî / kenedî (herwiha kanadayî / kenedayî)

Di peyvên ji erebî wergirtî de *-et* yan *-iyet* / *-iyat* tê avêtin gava ku *-î* lê tê zêdekirin:

- siyaset → siyas-et → siyasî

⁵ Heman paşpirtik di soranî û farisî û herwiha di erebî de jî rengdêran ji navdêran çêdike. Hevdema wê *-y* di inglîzî de jî navdêran ji rengdêran ava dike: *water* (av) → *watery* (avî, têrav, şil). Di kurdiya başûrî de ew adeten bi forma *-ig* e ku di pehlewî de jî wisa bû.

- hikûmet → hikûm-et → hikûmî
- cimhûriyet → cimhûr-iyet → cimhûrî
- edebiyat → edeb-iyat → edebî

Di herdu nimûne dawiyê de di rastiyê de formên navdêr (cimhûriyet, edebiyat) ji formên rengdêr (cimhûrî, edebî) hatine çêkirin û formên rengdêr ji formên din yên navdêr (cimhûr, edeb) hatine çêkirin.

-YÎ

Eger navdêr bi vokalekê (a, e, ê, o, u, û) bi dawî bê, hingê Y dikeve navbera wê û paşpirtika Î

- çiya → çiya-y-î
- qehwe → qehwe-y-î → qehweyî
- Zaxo → zaxo-y-î → zaxoyî (têkilî Zaxoyê, girêdayî Zaxoyê)
- mû → mûyî

Eger ji xwe peyv bi Î bi dawî bê, hingê Î-yeke din lê zêde nabe:

- du+alî → dualî (ne *dualiyî / *dualîyî)

-DAR

- Wate: ya/yê ku tiştek heye, xwedî tiştekî ye, tiştek pê re ye, tiştek li gel e
- Hevreh: soranî *-dar*, kurdiya başûrî *-dar*, farisî *-dar*, pehlewî *-dar*, hexamenişî *dare-*
- Hevber: inglîzî *-ful*, tirkî *-li*, erebî *zû-*, *-î*
- Nimûne: dikandar, deyndar, birîndar, hêvîdar

Ev paşpirtik bi eslê xwe ji rehê dema niha *-dar-* (heye) ya lêkera farisî maneya *daştên* (hebûn, xwedî bûn) ketiye kurdî û maneya wê ya bingehîn "ya/yê ku tiştek heye, xwedî tiştekî ye, tiştek pê re ye, tiştek li gel e" dide.

Ew bi eslê xwe hevwateriya pêşpirtika "bi-" ye lê di hin peyvên de ji maneya bingehîn dûr ketiye:

- guhdar (itaetker, kesa/ê ku guh dide gotinên xelkê, kesa/ê ku bi gotina xelkê dike – ne "kesa/ê ku guh hene")

- xwîndar (“kesa/ê ku dixwaze tola kuştina mirovekî xwe hilîne” – ne “kesa/ê ku xwîn heye”)

Wek ku nimûneyên li jor yên wek *dikandar*, *deyndar*, *birîndar* diyar dikin, ev paşpirtik ji mêj ve di kurdî de heye. Lê ew vê dawiyê di nûpeyvyan (neolojîzman) de jî pir tê bikaranîn:

- dengdar
- rayedar
- femandar
- mijdar

Di peyva “kirdar” (pratîk, kirin) de “-dar” ne ji vê “-dar”ê ye lê di rastiyê de ji soranî “kird-ar” e anku “kir-ar” lê di kurmançî de beramberî wê “kiryar” (emel, kirin, kar, herwiha “tawan, xirabî, guneh”) ji zû ve li kar e.

-ANE

Ev niha yek ji çalaktirîn paşpirtikên dariştinê yên kurdiya nivîskî ye. Lê ew vê dawiyê bi rêya soranî ji farisî hatiye wergirtin û ji kurmançî derbazî zazakî jî bûye. Di hemû lehceyên kurdî de ew bi forma – ane ye, di farisiya klasîk de jî –ane bû lê êdî bi farisiya tehranî bûye –anê wek ku E di peyvên din jî li dawiya peyvyan di wî zimanî de bûye Ê. Bi pehlewî –aneg bû lê G ji vê paşpirtikê wek ji paşpirtikên din jî di zimanên nû yên îranî ketiye.

Ev paşpirtik xaseten hokerên demî (temporal adverbs) ji navdêrên demî çêdike lê ew bi hoker bi guhastinê (conversion) wek rengdêr jî tên bikaranîn:

- roj → rojane (her roj, her roj carekê) → rojnameya rojane
- meh → mehane (her mehê, her mehê carekê) → destheqê mehane
- sal → salane (her sal, her salê carekê) → teftîşa salane

-YAR, -IYAR

Paşpirtika –yar bi eslê xwe varyanteke paşpirtika –dar e û maneya “ya/yê ku tiştek heye, ya/yê ku xwedî tiştekî ye” dide:

- hişyar (bihiş, hişmend, aqildar, aqilmend, bîaqil, kesa/ê ku aqil heye
- bextiyar (kesa/ê ku bext û şansê baş heye)

Paşpirtika –yar herwiha li gel çend lêkeran jî li kar e û pê navdêran çêdike (li jêrtir binêrin).

-ÎN

Hevreha wê di soranî de jî –în e, di farisî –*gîn*, bi pehlewî –*gên*. Di soranî û zazakî de ew herwiha bi forma –in (ne –în) jî heye. Ew çendîn navdêran dike rengdêr, xaseten madenan:

- zêr(r) → zêr(r)în
- zîv → zîvîn

Gelek carinan forma bi –*în* tenê varyanteke forma bi –*î* ye:

- bîngêhîn – bîngêhî
- agirîn – agirî

Carinan forma bi –*în* tek alternatîv e:

- şermîn
- rengîn
- zengîn

Lê hin caran maneya forma bi –*în* jî ya bi –*î* cuda ye:

- şîrîn: têrşekir, ne tehl
- şîrî: ji şîr(î) çêbûyî / hatî çêkirin

-GÎN

Ev paşpirtik ji farisî hatiye wergirtin û di farisî de hevreha –*în* ya kurdî ye (li jortir binêrin). Ev paşpirtik di çend peyvan de heye:

- xemgîn

- lezgîn
- mizgîn

Ji bilî van peyvên, wisa diyar e ku di kurdî de peyvên din yê bi paşpirtika –gîn peyda nabin. Peyvên wek *rengîn*, *zengîn*, *bengîn* ne bi paşpirtika –gîn in lê ji *reng-în*, *zeng-în*, *beng-în* in.

-WÎ, -EWÎ, -AWÎ

Ev paşpirtik bi forma xwe ya –wî ji erebî hatiye wergirtin lê êdî li hin peyvên kurdî jî tê barkirin. Di kurdî de ew li gel çend peyvên rengdêran ji navdêran saz dibe û bi yek ji van her sê formên xwe berpê dibê. Bi piranî maneyeke negatîv û neyînî dide û maneya wê ji ya ”-yî” tengtir û taybettir e anku ew ne hemû maneya xwe ya peyva bingehîn dide:

- **bawî** (romatîzmî) – bidin ber “bayî” (her tiştê têkilî “ba”)
- **kîmyawî**⁶
- **rêwî**⁷
- **jehrewî**
- **xwînewî**⁸

Lê eger vokala dawiyê Ê, herfa kelijandinê dikare –W be:

- rê → rêwî

Eger herfa dawiyê Î be û –WÎ bikeve pey wê, Î dikare bibe E:

- Elî → elewî

Herwiha –A ya dawiyê jî dikare bibe E yan jî wek xwe bimîne:

- Îsa → îsawî / îsewî (file, xiristiyan, mesîhî)
- Mûsa → mûsawî / mûsewî (cihû, yehûdî)

⁶ Peyva *kîmyawî* bi taybetî bi maneya *çekên kîmyayî* di kurdî de li kar e. Ew herwiha bi forma xwe *kîmyasal* e. Paşpirtika –sal / –sel bi/ji tirkî ye.

⁷ “Rêwî” bi eslê xwe maneya “têkilî rê, aîdî rê” dide lê niha êdî zêdetir wek navdêr bi maneya “kesa/ê bi rê ve” (rêving, misafir, *passenger*) li kar e.

⁸ Herwiha bi forma “xwînewî” jî tê dîtin.

-OK, -OKE

Paşpirtika –ok berbelav e lê kêr rengdêr pê ji navdêran tên çêirin, ew jî zêdetir bi forma –oke ne:

- şerok, şeroke

-EKE, -EKÎ

Ev paşpirtik nadir e, pê tenê ev peyva berbelav tê çêkirin:

- sereke, serekî (bi inglîzî *main*)

-NAK

Vê dawiyê bi rêya soranî yan jî yekser ji farisî hatiye wergirtin, di wan de jî bi heman forma –nak e.

Çend rengdêrên negatîv/neyînî jê tên çêkirin:

- xeternak
- tirsnak
- xemnak

-BAR

“Bar” wek peyveke serbixwe û watedar heye. Lê hin hene ku –bar li dawiya wan e û mirov bi temamî nikare bibêje ka ew bi rastî ji “bar” ya bi maneya “tiştên hilgirtinê/rakirin”ê ye yan jî paşpirtikeke serbixwe ye. Ev –bar di kurdiya nivîskî ya nû de pir li gel lêkeran (rehê niha) li kar e (li beşa “Rengdêrkirina lêkeran” binêrin). Di rengdêrkirina navdêran de ew nadir e:

- xembar (xemgîn)

Ihtimalen ev ji peyva “bar” ya bi wateya “tiştên hilgirtinê/rakirin”ê hatiye çêkirin bi armanca “kesa/ê ku barê xeman hildigire, kesa/ê ku xem li ser wê/wî bar in” yan wek baran giran in.

1.2. RENG DÊRKIRINA LÊKERAN

Di kurdî de rengdêr dikarin li ser her sê rehên demên niha û bîn (R1), demên borî (R2) û forma ferhengî yên lêkeran (fiil, *verb*) bîn çêkirin. Di çêkirina rengdêran ji lêkeran hem pêşpirtik û hem jî paşpirtik dikarin bîn bikaranîn.

1.2.1. RENG DÊR JI R2

Di kurdî de rengdêrên ji lêkeran xaseten li ser rehê demên borî tîn çêkirin. Di çêkirina rengdêran ji rehê demên borî de bi gelemperî paşpirtika **-î** li kar e (hevreha zazakî “-e”, farisî “-e / -ê”, pehlewî “-eg”, avestayî û hexamenişî “e-ke”). Di çend nimûneyan de “-e” ya bi eslê xwe ji farisî li kar e. Hem lêkerên gerguhêz (transîtîv) û hem jî yên gerneguhêz (intransîtîv) wiha dibin rengdêr.

- girt+î → girtî (gerguhêz)
- keland+î → kelandî (gerguhêz)
- hat+î → hatî (gerneguhêz)

Eger rehê dema borî bi vokalekê bi dawî were, hingê paşpirtik **-yî** ye:

- bû → bûyî
- ma → mayî
- çû → çûyî
- jiya → jiyayî

Eger rehê demên borî yê lêkerê bi **-î** bi dawî bibe, hingê rengdêr li ser bingehê forma dirêjtir ya rehê demên borî (“-iya” li cihê “-î”) tî avakirin

- vegerr-î / veger-*iya* → veger-*iya-yî* (ne *vegeriyî)
- ken-î / ken-*iya* → ken-*iyayî* (ne *keniyî)

Adeten rengdêr ji lêkera “anîn” bi rehê wê yê demên borî “anî” nayê çêkirin. Lê rengdêr dikare ji forma wê ya kurmanciya rojhilatî “îna” (rehê demên borî “-îna-”) yan jî ji forma wê ya soranî “hênan” (-hêna-) bê avakirin:

- înayî
- hênayî

Herwiha lêkerên pêkhatî jî bi heman awayî dibin rengdêr:

- amade bû → amadebûyî
- hez kir → hez kirî
- dest pê kir → destpêkirî

Hêjayî bibîranînê ye ku hemû beşên rengdêrên wiha çêkirî bi hev ve tînin nivîsîn

- hez kirî (ne *hez kirî)
- destpêkirî (ne *dest pê kirî)

Wek prensîp, hemû lêkerên kurdî dikarin wiha bibin rengdêr.

PAŞPIRTIKA –E

Di çend peyvên de li cihê “-î”, paşpirtika “-e” heye:

- bijare, bijarte, bijarde
- xwende, xwande

Ev paşpirtik bi eslê xwe ji farisî ye û hevrehên “-î” ya kurmancî ye. Di farisiya klasîk de ew bi forma “-e” lê di farisiya niha ya tehranî de bûye “-ê”. Lê van çend peyvên wiha di kurdî de hin maneyên taybet û tengtir ji maneya hevrehên xwe yê kurdî yê bi wateyên giştî wergirtiye û çêtir e ku ev peyv wek xwe bînin bikaranîn û neyên “kurdîkirin”.

NEYÎNÎKIRINA RENGDÊRÊN JI R2

Rengdêrên ji rehê demên borî yê lêkeran çêkirî bi pêşpirtika “ne-” dikarin bînin neyînîkirin anku negatîvkirin:

- çûyî → neçûyî
- gotî → negotî

Eger lêker pêkhatî be, “ne-” di zimanê nivîskî de yekser dikeve gel beşa lêkera bingehîn:

- hez kirî → hez nekirî
- jikarketî → jikar neketî

Hin caran di axiftinê de û kêr caran di nivîsînê de jî “ne-“ dikeve destpêka hemû peyva pêkhatî:

- nehezkirî
- nejikarketî

MANEYA RENGDÊRÊN JI R2

Rengdêrên ji R2 (rehê demên borî) yê lêkerên gerguhêz (intransîtîv) aktîv e û diyar dike ku kesekî bi xwe tiştêk kiriye yan tiştêk bûye:

- çûyî (bi xwe çû)
- mayî (bi xwe ma)

Ev rengdêr diyar dikin ku di demên borî de tiştêk bûye lê encama wê dikare bigihe dema niha jî:

- mayî (berî niha biryara manê da lê niha jî hê li vir e)
- amadebûyî (hat lê belkî niha jî hê li vir e)

Rengdêrên li ser R2 yê lêkerên gerguhêz avakirî tebatî anku pasîv in. Ne wan bi xwe tiştêk kiriye lê tiştêk li wan hatiye kirin. Ew dikarin behsa demên borî bikin lê dikarin behsa niha jî bikin:

- kuştî (hatiye kuştin – kiryar di demên borî de bûye û êdî nayê kirin)
- hezkirî (hatiye hezkirin yan jî tê hezkirin – kiryar di demên borî de bûye lê dikare di dema niha de jî be yan jî di herdu deman de)

1.2.2. RENGDÊR JI R1

Di kurdî de rengdêr dikarin herwiha ji R1 (rehê demên niha û bîna) yê lêkeran jî bîna çêkirin. Berevajî çêkirina rengdêran ji rehê demên borî yê lêkeran (R2), li gel R1 çendîn paşpirtikên ji hev cuda li kar in:

PÊŞPIRTIKA BI-

Ev pêşpirtik di çêkirina rengdêr an navdêran ji rehê demên niha û bên yên lêkeran de kêm dîtî ye û tenê çend peyvan ava dîke:

- bi+wêr-în → biwêr (wêrek, bisteh, bicuret, bicesaret)

Ew herwiha hin navdêran ji R1 ava dîke, wek: bikuj (kujer, qatil, mirovkuj) û bikirr (kirryar, xerîdar, mişterî) – bo van li beşa navdêrsaziyê binêrin.

PÊŞPIRTIKA NE-

Ev pêşpirtik rengdêrên neyînî çêdike lê di pratîkê de di avakirina rengdêran ji R1 de pirr nadir e:

- nemir

- nezan

Di soranî û farisî de di vî haletî de zêdetir paşpirtika *na-* li kar e, ne wek kurmancî *ne-*:

- farisî: nadan (nezan)

PAŞPIRTIKA -A / -E

Paşpirtika “-a” nadir e anku tenê çend peyv li ser R1 jê tên çêkirin:

- zan-a (kesa/ê ku pirr dizane)
- bez-a (kesa/ê ku bo bezînê zîrek e)
- rew-a (biheq, legîtîm, mafdar)
- reh-a (rizgar, azad, filitî, serbest)
- dar-a (kesa/ê ku tiştêk heye, zengîn e, maldar û hwd.)
- tiwan-a, kar-a (bişiyar, bitaqet, kesa/ê ku dikare / dişê tiştan bike, jêhatî)

Ji van peyvan tenê “zana” di kurmancî de berbelav e. “Beza” kê li kar e, “dara, rewa, reha, tiwana” bi rêya soranî ji farisî hatine wergirtin û di farisî de ew ji “dar-, rew-, reh-, tiwan-“ hatine çêkirin ku rehê van lêkeran in: “daştên” (hebûn, xwedî bûn), “reften” (çûn, meşîn), “ristên” (filitîn, revîn, xwe

xilas kirin), “tiwanisten” (karîn, şiyar, taqet hebûn). Peyva “kara” ya nadir jî wergera yekser ji “tiwana” ya farisî / soranî ye.

Peyva “zana” di hin devokan de sivik bûye û bûye “zane”. Heman pêşpirtika “-a” peyva “xwenda / xwende” ji rehê demên borî yê lêkera “xwendin / xwandin” çêdike.

PAŞPIRTIKA -EK

Paşpirtika –ek çend rengdêran ji R1 yê lêkerên gerguhêz (transîtîv) ava dike:

- -wêr- (wêrîn, wêriyan) → wêr-ek
- -kuj- (kuştin) → kuj-ek

Lê hevkarîya R1 û paşpirtika –ek nadir e û tenê di hejmareke pirr kêrîk ya peyvan de tê dîtin.

PAŞPIRTIKA -OK

Paşpirtika –ok li gel rehê demên niha û bîr yê lêkerên gerguhêz (intransîtîv) dikare rengdêran çêke. Ev diyarde bi piranî çalak û berhemdar e anku peydabûna qalibê R1 (gerguhêz) + -ok têra xwe berbelav e û peyvên nû jî dikarin li ser wî bingehê bîr sazkin:

- -gerr- (gerrîn) → gerrok
- -rev- (revîn) → revok
- -hej- (hejîn) → hejok
- -hejhej- (hejhejîn) → hejhejok
- -recif- (reficîn) → recifok
- -leriz- (lerizîn) → lerizok
- -biriq- (biriqîn) → biriqok
- -tirs- (tirsîn) → tirsok

PAŞPIRTIKA -ONEK

Paşpirtika –onek varyanteke paşpirtika –ok e û li gel du-sê R1 yê lêkerên gerneguhêz rengdêran çêdike:

- -tirs- (tirsîn) → tirsonek
- -bizd- (bizdîn) → bizdonek

Wek ku ji nimûneyên me (tirsonek, bizdonek) jî dixuye, ev paşpirtik bi awayekî negatîv û heqaretî tê bikaranîn. Bikaranîna –onek di kurdî de gelekî bisinor e û wisa diyar e ku tenê ev peyv bi vî awayî ne.

PAŞPIRTIKA –INDE, -ENDE

Ev paşpirtik di farisî de bi forma –*ende* / –*endê* bi berfirehî li kar e, di pehlewî de jî wek –*endeg* hebû. Bi heman awayî di zimanên ewropî de jî paşpirtika –ent, -ant roleke wek vê paşpirtikê heye, bo nimûne inglîzî *student* (xwandekar, ya/yê ku dixwîne) û *assistant* (alîkar, ya/yê ku alîkariyê dike/dide). Ev paşpirtik bi dengê xwe yê fransî wek –an ketiye kurdî jî: *asîstan*, *faşîzan*.

Di kurdî de ev paşpirtik di çend peyvan de peyda dibe û bi zelalî vê dawiyê bi rêya soranî ji farisî ketiye kurmancî. Ew dikare rehê demên niha û bîna yê hem lêkerên gerguhêz û hem jî yê gerneguhêz bigire:

- firrinde (ya/yê ku difirre → teyr)
- bexşinde (ya/yê ku dibexşe, efûker, dilovan, dilnerm, birehm)
- dirrinde (ya/yê ku didirrîne, hov, wehşî)
- mayinde (ya/yê ku dimîne, ya/yê ku naguhere yan naqede)⁹

PAŞPIRTIKA -BAR

Paşpirtika –bar li gel rehê demên niha û bîna (R1) yê lêkerên gerneguhêz dikare rengdêran çêke. Paşpirtika –bar li gel navdêran û hin tiştên din jî li kar e û di wan e maneya “bar, li bin barê” dide, bo nimûne *xembar*, *gumabar*. Lê bi R1 yê lêkerên gerguhêz ve ew di kurdî de nû ye û bi piranî tenê aidî

⁹ Li ser rehê demên borî (-ma-) yê lêkera “man” hatiye avakirin, ne li ser rehê demên niha û bîna (-mîn-). Bo nimûneyekê ji bikaranîna vê peyvê, binêrin:

<http://www.dergush.com/modules.php?name=News&file=article&sid=4149>

zimanê nivîskî ye. Texmînen Celadet Bedirxan ew ji almanî neqil kiriye kurdî. Di almanî de jî ew dikeve pey rehê lêkeran û maneya “ya/yê ku dikare bibe tiştêk” yan “ya/yê ku dikare tiştêk lê bê kirin” dide. Di inglîzî de hevbera wê *-able* yan *-ing* e.

Tevî ku ev qalibê R1 + -bar di kurdî de nû ye jî lê di zimanê nivîskî de hatiye çalakkirin û bi rêjeyî pir tê bikaranîn:

- guherbar (ya/yê ku diguhere yan dikare biguhere): *rewşa guherbar*
- mirbar (ya/yê ku dimire yan dê bimire, ne nemir, be ebedî): *mirov mirbar in*
- şkêbar (ya/yê ku bi hêsanî dişkê, dikare bişkê): *amanên şkêbar*
- xwer-bar¹⁰ (tiştên ku tên xwarinê yan dikarin bên xwarinê, tiştên bo xwarinê bikêrhatî): *nebatên xwerbar*

Peyvên *dîtbar* (bi inglîzî *visual*) û bihîstbar (*audial, audio-*) li ser rehê demên borî (R2) hatine avakirin. Formên wan yê li ser R1 çêkirî jî hene:

- bînbar
- bihîzbar

“PAŞPIRTIKA” -BER

“Paşpirtika” –ber wek di peyvên wek *dilber, peyamber/pêxember, nameber* de yan jî di peyvên wek *nûber, pîrber, mezinber* yê nûçêkirî de di rastiyê de bi maneya teng ne paşpirtikek e. Di nimûneyên pêşîn de ew R1 yê kevnar ji lêkera *birin* e:

- peyamber (ya/yê ku peyamekê dibe)
- dilber (ya/yê ku dilê mirovî dibe, dilê mirovî jê distîne)

Di nûpeyvên wek *nûber, mezinber, kevnber* de ew ji rehê lêkera *bûnê* –b- ye û paşpirtika –er ya bikersaz (avakera navdêrên biker, bi inglîzî *agent noun*) e.

¹⁰ Peyva “xwer” bar li ser R1 yê kevnar (-xwer-) yê lêkera “xwarin” hatiye avakirin, ne li ser R1 yê niha li kar (-xw-).

PAŞPIRTIKA -ER

Paşpirtika –er vê dawiyê pir bo çêkirina navdêrên biker (agent noun – *bo çêkirina wan û herwiha etîmolojiya vê paşpirtikê ya pîrr-rehî li jêrtir li beşa Navdêrsazî binêrin*) tê bikaranîn. Lê di heman demê de gelek ji wan peyvan wek rengdêr jî li kar in. Paşpirtika –er dikeve gel rehê demên niha û bînan yê lêkerên gerguhêz:

- -kuj- (kuştin) → kujer: *jehra kujer* (jehra ku dibe sebaba mirina kesan an heywanan yan nebatan)
- -recifîn- (recifandin) → recifîner: *taya recifîner* (taya ku mirovî direcifîne)
- -cemidîn- (cemidandin) → cemidîner: *ava cemidîner*
- -şewitîn- (şewitandin) → şewitîner: *agirê şewitîner*
- -soj- / -sojîn- (sotin / sojandin) → sojer: *agirê sojer / sojîner*

Bi taybetî li gel lêkerên bi paşpirtika –andin / -andin, paşpirtika –er çalak û berhemder e. Li gel gelek lêkerên din jî yê gerguhêz dikare bê bikaranîn lê bi hinan re ne mimkin e:

- -gir- (girtin) → *girer (bi maneya “ya/yê ku tiştêkî” digire lê ti gotineke wiha di kurdî de peyda nabe).

Gava ku lêker bi berkara (biresera, *object*) xwe vet ê girêdan, hingê tenê rehê lêkerê li kar e, -er lê nayê zêdekirin:

- “jehra kujer” lê “jehra mirovkuj”
- “agirê sojer” lê “agirê leşsoj”

1.2.3. RENGDÊR JI FORMÊN FERHENGÎ YÊN LÊKERAN

Rengdêr ne tenê li ser rehên demên niha û bên (R1) û rehên demên borî (R2) lê li ser forma ferhengî ya lêkeran jî dikarin bên çêkirin. Mebest ji forma ew şiklê lêkeran e ku di ferhengan de wek peyvên serekî tên dîtin û li gor deman û kesan nehatine çemandin anku tewandin. Di kurmancî de ew ji R2 + -n yan R2 + -in pêk tên:

- çû-n, ma-n, vegeî-n...
- hat-in, keland-in, bir-in...

Di kurmancî, soranî û farisî de paşpirtika -î dikare bikeve pey hin lêkerên wiha û rengdêrên bi maneya “têkilî filan karî/kinê” jê çêke:

- çandin (ziraet, bi inglîzî *to cultivate, agriculture*) → çandinî (ziraî, *agricultural*)
- ragihandin (medya, pres, çapemenî) → ragihandinî¹¹

Wek prensîp ev awayê çêkirina rengdêran dikare çalak û berhemder be lê di pratîkê de heta niha di kurdî de kêm hatiye bikaranîn.

Di heman demê de, di hin devokan de û carinan di zimanê nivîskî de jî “çandinî” ne wek rengdêr (ziraî, *agricultural*) lê wek navdêr bi maneya “ziraet” (*agriculture*) tê bikaranîn.¹²

Wek ku ji peyva wergera li vir ya peyva “çandin”ê diyar e (ziraet, *agriculture*), ew peyv li vir ne wek lêker lê bi guhastinê (*li pêştir li beşa Guhastin binêrin*) wek navdêr (ism, *noun*) hatiye bikaranîn. Anku di rastiye de ev qalib ne çêkirina rengdêran ji lêkeran lê çêkirina rengdêran ji navdêran e.

Çêkirina rengdêran ji formên ferhengî yên lêkeran di kurdî de bi rêjeyî tiştekî nû ye û heta niha kêr hatiye bikaranîn lê hêdî-hêdî ber bi zêdebûnê ve ye. Li şûna vê bikaranîn, bikaranîna qalibê xwedîtîyê zêdetir serdest e:

- berhemên çandinê (li cihê “berhemên çandinî” ya nû)
- dezgehên ragihandinê (li cihê “dezgehên ragihandinî” ya nû)

¹¹ Bikaranîna heman peyvên wek rengdêr di komika “propagandayên ragihandinî” de <http://rudaw.net/kurmanci/kurdistan/3105201514> û wek navdêr: <http://argun.org/2009/02/18/ragihandini-bi-revebiriya-amatori-pes-nakeve-gabar-ciyan/>

¹² Nimûneyek ji bikaranîna peyva “çandinî” wek navdêr: <http://ku.hawarnews.com/li-kobane-candini-te-kirin/> û mînakê jî ji bikaranîna heman peyvê wek rengdêr: <http://www.kurdistantv.tv/kurk/Kurdistan/Berhem%C3%AA-%C3%A7andin%C3%AE-li-Kurdistan%C3%AA-z%C3%AAd-e-b%C3%BBne>

1.3. RENG DÊRKIRINA HEJMARNAVAN

Hejmarnav anku navên hejmaran (*numeral*) bi çend paşpirtikên ji hev cuda ji hejmarên sade yan bingehîn (*cardinal*) dibin hejmarên rêzî (*ordinal*). Di heman demê de ev hejmarên rêzî dibin rengdêr jî.

PAŞPIRTIKÊN –EM Û –EMÎN

Ev paşpirtik di kurmanciya nivîskî de hejmarên bingehî dikin hejmarên rêzî:

- yek → yekem(în)
- deh → dehem(în)
- sed → sedem(în)

Eger hejmara bingehîn bi vokalekê bi dawî bê, hingê Y-yek dikeve navbera wê û paşpirtikê:

- du-y-em(în)
- sê-y-em(în)

Peyva “duyem” herwiha varyantên wek “duwem(în), diwem(în), duhem(în)” jî hene.

Wek prensîp formên bi “-em” hejmarên rêzî yê li cihê navdêran in û formên bi “-emîn” jî li şiklên wan yê rengdêrî ne. Lê di pratîkê de herdu form wek hev wate û hevwezîfe tî bikaranîn.

Bikranîna paşpirtika –em(în) di kurmancî de niha belav e lê tarîxiyên ew nû ye. Ew vê dawiyê ji soranî yan jî bi rêya soranî ji farisî hatiye wergirtin. Di soranî ew jî wek kurmancî –em(în) û di farisî de jî bi forma “-om(în)” li kar e. Herwiha bidin ber fransî –ième û latînî –imus yê heverk (hevwezîfe).

PAŞPIRTIKA –AN

Di kurmanciya navendî de bo çêkirina hejmarên rêzî tarîxiyên paşpirtika –an (kurtkirî –a) hatiye bikaranîn û niha jî çalak e tevî ku di zimanê nivîskî de êdî li cihê wê gelek caran –em(în) ya li jor behskirî tê xebitandin.

- roja çara(n) = roja çarem(în)
- cara sisiya(n) / diduya(n) = cara sêyem(în)

- sala 2015an

Wek ku ji nimûneyan dawiyê diyar dibe, hejmara salan jî wisa tê diyarkirin wek ku rengdêr be, berevajî hin zimanên din, bo nimûne inglîzî *the year 2015* (ne *2015th*) an tirkî *2015 yılı* (ne *2015:nci yılı*).

PAŞPIRTIKA –Î

Hejmarên sade herwiha bi alîkariya paşpirtika –î dibin hejmarên rêzî û di heman demê de rengdêr jî. Ev forma hejmarên rêzî li gel navê mehan tê bikaranîn:

- yekî gulanê (roja karkerên cîhanê)
- bîstûyekî adarê (roja newrozê)
- 16î tebaxê (roja damezrandina Partiya Demokrat a Kurdistanê)

Wek din ev forma hejmarên rêzî ne li kar e, bo nimûne mirov li cihê "yê çarem/çaran" nikare bibêje "*yê çarî".

PAŞPIRTIKA –Ê

Di kurmanciya rojhilatî hejmarên rêzî û hejmarên rengdêrkirî bi paşpirtika –ê tîn çêkîrin:

- cara yekê / êkê (cara yekem)
- roja çarê (roja çarem, roja çaran)

Anku "ê" di kurmanciya rojhilatî de cihê "-em" ya soranî û kurmanciya nivîskî û herwiha "-an" ya kurmanciya navendî ya rengdêrsaz digire. Lê di kurmanciya rojhilatî de heman "ê" dikare herwiha rola "-î" ya kurmanciya navendî ya rengdêrsaza ji hejmaran jî bigire:

- yekê gulanê = yekî gulanê
- bîstûyekê adarê = bîstûyekî adarê

Lê di kurmanciya rojhilatî de forma "-î" li kar e:

- pazdeyî tebaxê (roja damezrandina Partiya Karkerên Kurdistanê), ne "*pazdeyê tebaxê"

1.4. RENGDÊRKIRINA HOKERAN

Hoker jî dikarin bi alîkariya çend paşpirtikan bibin rengdêr. Di kurmancî de hokerên cihî xaseten bi paşpirtika –în dibin rengdêr:

- jêr → jêrîn
- jor → jorîn
- paş → paşîn
- pêş → pêşîn

Herwiha varyanta bi paşpirtika –î jî heye:

- jêr → jêrî (wek "kurmanciya jêrî")
- jor → jorî (bo nimûne "kurdiya jorî" anku kurmancî)

Lê forma bi –î di heman demê de wek navdêr jî li kar e:

- pêş → pêşî (pêşiya wan)

Hokerên demî adeten bi –î yan –în dibin rengdêr. Eger hoker bi vokalekê bi dawî were, hingê Y dikeve navbera wê û paşpirtika –î:

- îro → îroyî / îroyîn

1.5. ÇÊKIRINA RENGDÊRAN JI RENGDÊRAN

Rengdêr ne tenê ji birrên din yê peyvan (navdêr, lêker, hoker) çêdibin lê dikarin herwiha ji rengdêran bi xwe jî bîn avakirin. Sazkirina rengdêrên nû ji yê heyî hem bi alîkariya pêşpirtikan û hem jî paşpirtikan mimkin e.

1.5.1. RENGDÊR JI RENGDÊRAN BI PÊŞPIRTIKAN

Di kurmancî de mirov dikare bi pêşpirtika ne- rengdêrên dijwate ji rengdêrên heyî çêke:

- baş → nebaş (xirab)
- xweş → nexweş (êşewî, bîvêr, xeste, nesax, bîmar, merîz, ne saxlem, biêş, elemdar)
- nas → nenas
- rehet → nerehet

Berevajî kurmancî, di soranî û farisî de bi piranî paşpirtika “na-” di vê rewşê de tê bikaranîn, ne wek kurmancî “ne-“. Li gel peyva “xoş” (xweş) di soranî de maneya peyva bi na- ji ya bi ne- cuda ye:

- naxoş (ne xweş, ne bi dilê mirovî)
- nexoş (nexweş, xeste, bîvêr, biêş)

1.5.2. RENGDÊR JI RENGDÊRAN BI PÊŞPIRTIKAN

Çend rengdêrên nû bi alîkariya paşpirtikan ji rengdêrên heyî peyda dibin. Hin caran maneya peyvan eynî ye, carinan jî piçekê ji hev cuda ye, hin caran jî yê ji hev cuda jî di pratîkê de gelek caran li şûna hev tên bikaranîn. Li vê derê em ê bo zelalkirina wan maneyên wan yê ji hev cuda bi inglîzî bidin. Ev nayê wê maneyê ku ev tek wateyên wan in:

- rast (right) → rastîn¹³ (real, true, actual)
- rast → rasteqîn¹⁴ / rasteqîne¹⁵ (real, true, actual)
- kevn (old) → kevnar / kevnare (antique, ancient)
- nû (new) → nûjen (modern)
- pîroz (holy) → pîrozwer¹⁶ (sacred)

Ti ji van paşpirtikan di çêkirina rengdêran ji rengdêran ne berdar e anku gelek rengdêr pê ji rengdêran nayên çêkirin. Di rastiyê de ev paşpirtik di çêkirina rengdêran ji rengdêran de yekane ne anku tenê li gel peyvekê peyda dibin. Bo nimûne, paşpirtika “-eqîn / -eqîne” tenê di peyva “rasteqîn / rasteqîne” de heye. Paşpirtika “-în” ji bilî “rast → rastîn” herwiha wek prensîp di “nerm → nermîn” de jî heye. Lê “nermîn” di pratîkê de wek rengdêr nayê bikaranîn. Ew tenê wek navê jinan Nermîn li kar e lê hingê ew ne rengdêr lê navdêr e.

Tek paşpirtikên piçekê berdar di çêkirina rengdêran ji rengdêran de “-ok” û “-ik” yên biçûkkirinê (diminutîv) in:

- hûr → hûrik
- biçûk → biçkok

Herdu paşpirtik dikarin di li gel hev jî bête bikaranîn anku dubare diminutîv bin:

- hûr → hûrik → hûrkok

Tarîxiyên peyva “biçkok” jî diminutîva dubare ye “biç-k-ok” lê forma “*biç” wek peyveke serbixwe (êdî) peyda nabe.

¹³ Tarîxiyên “rasteqîn” ihtimalen ji “rast+yeqîn” anku “rast-bawer” e lê niha ne bi wê maneyê li kar e. Forma “rasteqîne” ji “rast+yeqîn+e” ye. Nimûneyek ji bikaranîna peyva “rastîn”:

<http://zinarexamo.blogspot.fi/2009/06/dewleta-tirk-ruye-xwe-ye-rastin-nisani.html>

¹⁴ Nimûneyek ji bikaranîna peyva “rasteqîn”:

<http://www.diclehaber.com/news/content/view/431970?from=3708794062>

¹⁵ Nimûneyek ji bikaranîna peyva “rasteqîne”: <http://www.feminkurd.net/content.php?newsid=1474>

¹⁶ Nimûneyek ji bikaranîna peyva “pîrozwer”: <http://www.yuksekovahaber.com/yazi/gula-pirozwer-2-2410.htm>

2. NAVDÊRSAZÎ

Di kurdî de navdêr dikarin bi dariştinê ji rengdêran û hokeran û ji navdêrên heyî bên çêkirin. Bi marjinalî herwiha navdêr dikarin ji hejmarnavan, cînavan û daçekan jî bên dariştin. Dariştina navdêran di kurdî de tenê bi paşpirtikan mimkin e anku mirov nikare bi pêşpirtikan navdêran darêje.¹⁷

2.1. ÇÊKIRINA NAVDÊRAN JI RENGDÊRAN

Wek prensîp, hemû rengdêrên kurdî dikarin bi yek yan çend paşpirtikan bibin navdêr. Di pratîkê de jî çêkirina navdêran ji rengdêran di kurdî de diyardeyeke berbelav û çalak e. Paşpirtika herî biber anku produktîv di çêkirina navdêran ji rengdêran de *-î* ye.¹⁸ Wek prensîp, hemû rengdêr dikarin bi *-î* bibin navdêr. Lê di pratîkê de hejmareke paşpirtikên din jî heye ku her yek ji wan li gel hin rengdêran tê bikaranîn bo çêkirina navdêran.

PAŞPIRTIKA *-î*

Ev paşpirtik ji bilî kurmancî di lehceyên din yên kurdî de jî heye. Ew herwiha di farisî û hin zimanên din jî yên îranî de bi heman awayî ye. Di pehlewî û partî de ew bi awayê *-îh* bû, di avestayî û hexamenişî de *-ye-vehye-*.¹⁹

Wek prensîp ev paşpirtik dikare her rengdêrî bike navdêr:

- rast → rastî
- pak → pakî
- pîs → pîsî

¹⁷ Helbet rengdêrên bi pêşpirtikan dariştî jî dikarin bi *guhastinê* wek navdêr bên bikaranîn lê hingê mesele ne dariştina navdêran e. Bo guhastinê li beşa yekem ya vê vekolîna li ser Peyvsaziyê binêrin (Kovara Kanîzar, hejmar 1).

¹⁸ Paşpirtika *-î* di heman demê de bibertirîn paşpirtika çêkirina rengdêran ji navdêran e jî (li beşa 1. Rengdêrsazî binêrin). Niha ew herdu paşpirtik hevdeng in lê tarîxiyên ew ne hevreh in anku ne herdem wek hev bûne û ne ji eynî rehî ne. Bo etîmolojiyên wan yên ji hev cuda, li beşên nivîsarê yên li ser wan binêrin.

¹⁹ Di inglîzî de jî paşpirtika *-y* (bixwîne: *-î*) heman erk heye (honest = rastgo → honesty, modest = nefsbîçûk → modesty = nefsbîçûkî) lê tarîxiyên ew ne hevreh *-î* ya kurdî ye. Ya inglîzî bi rêya *-ia* ya latînî ji *-ia* ya yûnanî ye.

- hejar → hejarî

Rengdêrên bingeh dikarin xwemalî yan jî biyanî bin:

- feqîr → feqîrî (ji erebî)
- şaş → şaşî (ji tirkî)
- dilawer → dilawerî (ji farisî)
- gernas → gernasî (ji ermenî)
- notir → notirî (ji fransî)

Ne tenê rengdêrên ji peyvên sade (ne pêkhatî) lê herwiha rengdêrên pêkhatî yan dariştî jî dikarin dikarin bi –î bibin navdêr:

- ser-firaz → serfirazî
- birîn-dar → birîndarî
- bê-kes → bêkesî

Lê di çêkirina navdêran ji rengdêran de di kurdî de çendîn paşpirtikên din jî hene. Hin ji wan wek alternatîvên paşpirtika –î ne lê bi hin rengdêran re ew ji –î zêdetir li kar in. Carinan heta –î li gel wan peyvên pirr nadir e yan heta mirov dikare bibêje nayê bikaranîn jî. Li jêr em ê hewl bidin paşpirtikên din yê ku li navdêran ji rengdêran saz dikin li gor berdariya wan (çend biber in anku mişe ne) rêz bikin.

PAŞPIRTIKÊN –YÎ Û –HÎ

Eger rengdêr bi vokalekê bi dawî were, hingê li cihê paşpirtika –î, paşpirtika –hî yan jî –yî dikare were bikaranîn:

- amade (hazir) → amadehî / amadeyî (hazirî)

Ev herdu paşpirtik jî bi eslê xwe ji paşpirtika –î ne, tenê bo rêgirtina du vokalan li pey hev, Y yan jî H dikeve navbera wan. Lê gelek caran jî ne –hî / –yî lê paşpirtika –tî dikeve pey vokala rehî (li jêrtir binêrin).

PAŞPIRTIKA –AHÎ / –AYÎ

Paşpirtika –ahî di hin devokên kurmançî de û herwiha di soranî bi awayê –ayî peyda dibe. Ew paşpirtikeke îranî ye û di pehlewî de jî bi forma –ay hebû lê di farisiya niha de peyda nabe. Ev paşpirtik di kurdî de li gel çend rengdêrên kevnar li kar e bo navdêrkirina wan:

- bilind → bilindahî / bilindayî
- dûr → dûrahî / dûrayî
- kûr → kûrahî / kûrayî
- mezin → mezinahî
- ron → ronahî

Paşpirtika –ahî / -ayî êdî di kurdî de ne çalak e anku mirov nikare navdêrên nû ji hin rengdêrên din jî çêke. Tenê hejmareke bisinor ya rengdêran vê paşpirtikê bi kar tîne û mirov nikare ji bilî wan vê paşpirtikê bide gel hin rengdêrên din. Lê mirov dikare li cihê vê paşpirtikê carinan yek yan çend paşpirtikên din yê navdêrsaz bi kar bîne:

- ron → ronî
- bilind → bilindî
- mezin → mezinatî / mezintî / mezinî

Bi taybetî jî gava ku ev rengdêr beşek ji peyveke pêkhatî bin, hingê paşpirtika –î ya giştî tê tercîhkirin:

- ser-bilind → serbilindî (ne *serbilindahî)

PAŞPIRTIKÊN -TÎ, -ÎTÎ, -ATÎ, -YATÎ, -AYETÎ, -YETÎ, -ETÎ, -ITÎ

Tarîxiyên ev hemû eynî paşpirtik in. Ew ji du rehên cuda peyda bûne. Î-ya dawîya wan hevrehê –î ya kurdî-îranî ye ku me li jor behs kiriye. T û herfên din yê berî wê ji paşpirtika –ye(t) ya erebî ne. Anku di van paşpirtikan de du reh gihiştine hev û paşpirtikek (bi çend varyantan) jê peyda bûye.

Paşpirtika –îtî di kurmançiya navendî de xaseten li gel hin rengdêrên kurd tê bikaranîn bo çêkirina navdêran:

- şaş → şaşîtî
- hov → hovîtî

Li cihê van, herwiha varyantên bi paşpirtika –î jî mimkin in: *şaşî*.

Varyanta –tî xaseten hingê li kar e gava ku rengdêrê bingeh bi vokalekê bi dawî tê:

- zana / zane → zanatî / zanetî
- bajarî → bajarîtî
- mişe → mişetî

Paşpirtika –atî hin caran wek varyanteke paşpirtika –ahî / -ayî (li jortir binêrin) tê gotin:

- mezinahî / mezinatî
- dûrahî / dûratî

Lê ne herdem:

- ronahî / *ronatî²⁰

Varyantên -ayetî, -yetî, -etî, -itî zêdetir di çêkirina hin navdêran ji hin navdêrên heyî de cih digire – li jêrtir binêrin.

PAŞPIRTIKA -ANÎ

Bi paşpirtika –anî di du-sê peyvên navdêrên tî çêkirin:

- dost → dostanî
- mêr → mêranî
- xort → xortanî

Bi eslê xwe "dost" û "mêr" ne rengdêrê lê navdêr in. Lê ew herwiha wek rengdêrê jî li kar in, xaseten *mêr* bi maneya *wêrek*, *bicesaret*, *bicuret*. Loma mirov dikare bibêje ku –anî jî paşpirtikeke çêkirina navdêran ji rengdêran e. Lê mirov dikare herwiha wê wek paşpirtikeke çêkirina navdêran ji navdêran jî bihesibîne. Lê çawa be jî, ew paşpirtikeke nadir û kêmpayda ye. Herwiha bide ber –înî ya çêkirina navdêran ji navdêran li jêrtir.

PAŞPIRTIKA –VAN

²⁰ Stêrka * li berî peyvê diyar dike ku ew form peyda nabe yan şaş e.

Di nûpeyva (neolojîzma) *çalakvan*²¹ de paşpirtika –van bo çêkirina navdêrekî ji rengdêrekî hatiye bikaranîn. Ew hevwatera peyva navneteweyî *aktîvîst* e. *Çalakvan* li ber modela inglîzî *activist* hatiye çêkirin ku ew jî ji rengdêr *active* (çalak, aktîv) û paşpirtika –ist hatiye avakirin.

Ti nimûneyên din yê çêkirina navdêran ji rengdêran bi rêya paşpirtika –van peyda nabin.

2.2. ÇÊKIRINA NAVDÊRAN JI HOKERAN

Çend hokerên (*adverb*) cihî di kurdî de bi dariştinê dibin navdêr. Di dariştina wan de paşpirtika –î tê bikaranîn:

- paş → paşî: *paşiya tirimpêlê*
- pêş → pêşî: *pêşiya malê*
- ber → berî: *beriya xwe nedidît*
- daw → dawî: *dawiya çîrokê*
- jor → jorî: *joriya gundî*
- jêr → jêrî: *jêriya çiyayî*
- der → derî: *deriyê xanî*

Ev formên dariştî bi xwe di heman demê de wek hoker jî li kar in. Ew carinan wek rengdêr jî tên bikaranîn lê wek rengêr formên bi –în (*paşîn, pêşîn, dawîn, jêrîn, jorîn...*) zêdetir serdest in.

Ji bilî paşpirtika –î, herwiha çend peyvên bi paşpirtika –*ahî(k)* / –*ayî(k)* jî hene, bi taybetî di kurmanciya rojhilatî de:

- ber → *berahî(k)* (pêşî): *berahiya xwe nedidît*
- *dûm (dûv) → *dûmahî(k)* (dawî, xilasî): *dûmahiya çîrokê*
- pêş → *pêşahî*

²¹ Nimûneyek ji bikaranîna peyva *çalakvan*: <https://www.rojavanews.com/kurdish/index.php/kurdistan/item/2272-rojava-news>

2.3. ÇÊKIRINA NAVDÊRAN JI LÊKERAN

Lêker dikarin bi rehê xwe yê dema niha, bi rehê demên borî û herwiha bi forma ferhengî (rader, mesder, infinitîv) bi dariştinê bibin navdêr. Dariştina navdêran ji lêkeran bi piranî bi alîkariya paşpirtikan çêdibe lê herwiha pêşpirtika bi- jî hin peyvên wiha saz dike.

2.3.1. Ji rehê dema niha

Rehê dema niha piraniya lêkerên gerguhêz (transîtîv) û hin lêkerên gerguhêz (intransîtîv) dikare bo çêkirina navdêran were bikaranîn. Bi piranî peyvên wiha çêkirî dibin navdêrên biker (*agent nouns*) anku kesên yan aletên ku tiştêkî dikin. Bo nimûne:

- bêjer (ya/yê ku tiştêkî dibêje, spîker) ji bêj-er (-bêj- rehê dema niha yê lêkera “gotin” e)
- gerrok (ya/ê ku digere, aware, derbider) ji gerr-ok (-gerr- rehê dema niha yê lêkera “gerrîn” e)
- wêr-ek (ya/yê ku diwêre, bicesaret, cesûr) ji wêr-ek (-wêr- rehê dema niha yê lêkera “wêrîn” e)
- bikuj (qatil, mirovkuj, ya/yê ku kesekî yan heywanekî dikuje) ji bi-kuj (-kuj- rehê dema niha yê lêkera “kuştin” e)

PAŞPIRTIKA –ER

Paşpirtika –er bo çêkirina navdêrên biker ji rehê dema niha yê lêkeran vê dawiyê di kurdî (xaseten kurmançî û soranî) de pirr çalak bûye. Tarîxiyên ev diyardeyeke nû ye û têkilkirina çend paşpirtikên xwemalî û biyanî ye:

–er di paşpirtikên kevnar yê xwe malî de –ker (wek “karker”), –ber (wek “pêxember, peyamber”) û “-der” (wek “avder = ya/yê ku avê dide kesekî yan tiştêkî”) de heye. Lê di rastiyê de ev her sê paşpirtik rehê dema niha yê lêkerên “kirin, birin, dan” bûn û –er tarîxiyên di wan de ne paşpirtik bû lê beşeke wan ya bingehîn bû. Lê di kurmançiya navendî de “–er” ji rehê van lêkeran ketiye û tenê –d-, –k-, –b- mane (di-d-im, na-d-î, di-k-im, na-k-î, di-b-im, na-b-î). Di kurmançiya rojhilatî de û herwiha di soranî de –E- maye lê ji wan jî R ketiye (bi kurmançiya rojhilatî: -di-de-m, na-de-y, di-ke-m, na-ke-y, di-be-m, na-be-y).

Lê di çêkirina bikerên ji *navdêr/rengdêr + rehê dema niha* de van peyvên “kirin, dan, birin” (û hewiha “xwarin”) rehê xwe yê dema niha yê kevnar parastiye:

- kar-k-er, peyam-b-er, av-d-er, nan-xw-er (ne *kark, *peyamb, *avd, *nanxw) lê bide ber “stran-bêj, av-rêj, mirov-kuj...” (ne *stran-bêj-er, *av-rêj-er, *mirov-kuj-er...)

Ev paşpirtik herwiha li gel rehê dema niha yê lêkera “anîn” (bi devokî “hanîn, înan, hînan, înadîn, hînadîn”) anku -în- (bi soranî “-hên-“ ji “hênan”) jî tê bikaranîn tevî ku tarîxiyên di wî rehî de -er ne beşeke bingehîn ji wî rehî ye:

- der-în-er / der-hên-er
- bi-kar-în-er / bi-kar-hên-er

Heman paşpirtika -er di inglîzî û hin zimanên din yê ewropî de jî navdêrên biker çêdike. Bo nimûne:

- kill (kuştin, -kuj-) → killer (kuj-er, bikuj, qatil)
- sing (strîn, stran gotin) → singer (stranbêj)

Di tirkî de jî paşpirtika -er heye û bi maneyeke nêzîkî lê ne tam wekî inglîzî heye. Di rastiye de peyva kurmancî *koçer* ji tirkîya kevn *köçer* e ku bi tirkîya niha bûye *göçer* û maneya “koçker, barker” dide.

Paşpirtika -er ya niha bi çalakî li rehê dema niha yê lêkeran tê barkirin û pê navdêrên biker tên çêkirin, dikare wek encama hevghandina van her sê rehên îranî, inglîzî û tirkî bên dîtin.

Bergeha bikaranîna vê paşpirtika -er li gel rehê dema niha yê lêkerên gerguhêz wek prensîp bêsinor e tevî ku gelek ji van peyvan heta niha kêm hatine bikaranîn yan qet nehatine bikaranîn jî lê bikaranîna wan mimkin e:

- avêj-er (< avêtin)
- bêj-er (< gotin)
- çemîn-er (< çemandin)
- dirrîn-er (< dirrandin)
- hejîn-er (< hejandin)
- jenîn-er (< jenandin)
- kelîn-er (< kelandin)
- livîn-er (< livandin)
- mirin-er (< mirandin)

- nivîs-er (< nivîsîn)
- perçiqîn-er (< perçiqîndin)
- revîn-er (< revandin)
- sekinîn-er (< selixandin)
- şidîner (< şidandin)
- tewizîn-er (tewizandin)
- zivirîn-er (< zivirandin)

Lê –er li gel lêkerên gerneguhêz nayê bikaranîn. Bo nimûne, bikaranîna van peyvan di kurmançî de ne li kar e û nikare bê bikaranîn jî:

- *ç-er (< çûn)
- *gerr-er (< gerrîn)
- *rev-er (< revîn)
- *sekin-er (< sekinîn)

PAŞPIRTIKA -OK

Paşpirtika –ok rehê dema niha yê lêkerên gerneguhêz (intransîtîv) dike navdêrên biker (yên ku tiştêkî dikin):

- rev-ok (< rev-în)
- gerr-ok (< gerr-în)
- hej-ok (< hej-în)
- kenok (< ken-în)

Lê hin lêkerên gerneguhêz yên sade nikarin wiha bibin navdêrên biker û peyvên wiha di kurdî de peyda nabin:

- *ç-ok (< ç-ûn) anku “ya/yê ku diçe”²²
- *ê-y-ok /hê-y-ok (< hatin)

²² Helbest “çok” (bi inglîzî *knee*) wek beşeke ji lingê di kurdî de heye lê ne ji lêkera “çûn” e û maneya “ya/yê ku diçe” jî nade.

PAŞPIRTIKA –KAR

Paşpirtika –kar li gel rehê dema niha yê çend lêkeran navdêrên biker çêdike:

- nivîskar (nivîsevan, nivîser, edîb)
- ajokar²³ (ajovan, şofêr)

PAŞPIRTIKA –VAN

Çend nûpeyv bi paşpirtika –(e)van li gel rehê dema niha hatine çêkirin:

- parêz-van²⁴ (parêzer, parêzgar, mihafiz)
- nivîs-e-van²⁵ (nivîskar, edîb, kitêbnivîs)
- ajo-van²⁶ (ajokar, şofêr)

Paşpirtika –(e)van herwiha li gel rehê demên borî jî hin peyvan çêdike (li jêrtir binêrin).

PAŞPIRTIKA –GAR

Paşpirtika –gar peyva *parêzgar* ji rehê dema niha –parêz- yê lêkera “parastin” çêkiriye.

Paşpirtika –gar herwiha di peyva *rizgar* de ye. Ew wek rehê dema niha ji lêkera “risten” (revîn, filitîn, xwe xilas kirin, xwe rizgar kirin) ya farisî dixuye lê di rastiye de rehê wê lêkerê bi farisî –reh- e. Di rastiye de *rizgar* forma sivikkiî ji *ristgar* ya farisî ye ku ji rehê dema niha –rist- + -gar peyda bûye. Bo guherîne -STG- bi –ZG- bidin ber *dest+geh* → *dezgeh*.

PÊŞPIRTIKA BI-

Pêşpirtika bi- çend navdêrên biker ji rehê dema niha yê çend lêkeran çêdike:

- bikuj (< -kuj-, kuştin) anku “qatil, kujer, ya/yê ku kesekî dikuje yan kesek kuştîye)

²³ Nimûneyeke ji bikaranîna peyva “ajokar”: <http://www.trtnuce.com/haber/jiyan/ajokare-tankere-re-li-ber-bobelate-girt-24239.html>

²⁴ Nimûneyek ji bikaranîna peyva “parêzvan”: <http://www.yeniozgurpolitika.org/index.php?rupel=nuce&id=39331>

²⁵ Nimûneyek ji bikaranîna peyva “nivîsevan” bi wateya “nivîskar, edîb”:

<http://www.saradistribution.com/gedexeWejeZiman.htm>

²⁶ Nimûneyek ji bikaranîna peyva “ajovan”: <http://www.peyamner.com/Kurdi/PNAnews.aspx?ID=301512>

- bikirr (< -kirr-, kirrîn) anku “kirrya, mişterî, bayî, ya/yê ku tişteki dikirre yan tişteki kirriye)

- bi-k-er (< -k- < -ker-, kirin) anku “fail, aktor, kesa/ê ku tişteki dike yan tişteki kiriyê)

Bikaranîna vê pêşpirtikê li gel rehê dema niha yê lêkeran bo çêkirina navdêran biker diyardeyek nadir û neçalak e.

PAŞPIRTIKA -YAR

Bi kêmi peyva *kirryar* ji rehê dema niha yê lêkera *kirr-în* û paşpirtika *-yar* pêk hatiye. Wek din bikaranîna vê pêşpirtikê li gel rehê dema niha yê lêkeran bo çêkirina navdêran biker diyardeyek nadir û neçalak e.

2.3.2. Ji rehê demên borî

Hejmareke kêmi ya navdêran ji rehê demên borî + paşpirtikekê dibin navdêr. Paşpirtikên li kar lê -ar, -er, -ok, -ox, -(e)van in lê ti ji wan ne zêde çalak in. Hema-hema di nav gel de li gel rehê demên borî ne li kar in jî û çend peyvên bi wan çêkirî jî zêdetir nûpeyv anku neolojîzm in, vê dawiyê di zimanê nivîskî de hatine çêkirin. Belkî tek awarte û istisna peyva *mirar* ya berbelav û gelêrî ye.

PAŞPIRTIKA -AR

Çend rehê demên borî yê lêkeran bi alîkariya paşpirtika *-ar* dibin navdêr:

- got → gotar

- kuşt → kuştar (qetliam, qeleço, komkujî)
- mir → mirar

Ji bilî van rehê di kurdî de heyî, herwiha peyva “reftar” (tevger, miamele, *behavior/behavior*) heye ku ji lêkera farisî “reft-en” hatiye çêkirin. Ev peyv ne di kurdî de hatiye çêkirin lê yekser ji farisî hatiye neqilkirin. Wek din jî peyvên wiha – ji bilî “mirar” – di kurdî de (bi kêmî di kurmancî de) nû ne û tenê aidî zimanê nivîskî ne.

Peyva *nivîsar* (meqale, *article*) ji rehê dema niha yê lêkera “nivîsîn” (-nivîs-) û paşpirtika –ar hatiye çêkirin. Cudahiya vê peyvê ji peyvên wek “got-ar, reft-ar, kuşt-ar” ew e ku “nivîsar” ne li ser rehê demên borî ya peyva “nivîsîn” (-nivîsî-) lê li ser rehê dema niha (-nivîs-) hatiye avakirin.

Herwiha peyva “mir-ar” jî wek prensîp dikare ji rehê dema niha yan jî ji rehê demên borî be ji ber ku di kurmancî de herdu reh “-mir-” (ew di-mir-e, ew mir). Lê gava ku mirov li hevrehên wê di zaravayên din yê kurdî û zimanên din yê îranî de dinêre, mirov dibîne ku ew bi rastî ne li ser rehê dema niha lê li ser rehê demên borî ye. Di soranî, farisî û gelek ziman û zaravayên din de ew bi şiklê “mirdar, mordar, murdar...” e anku D di wan de heye. Ev D tenê di rehê demên borî de di van ziman û zaravayan de heye, ne di rehê dema niha de. Lê ji ber ku D ji kurmancî ketiye, mirov dikare bibêje ku “mirar” ji rehê dema niha yan jî ji rehê demên borî ye lê tarîxiyên ew bêguman ji rehê demên borî ye.

Peyva “nivîsar” nûpeyveke (*neologism*, peyveke nûçêkirî) û mirov dikare wê tenê wek istisna bibîne û bibêje ku paşpirtika –ar ji bilî wê navdêran ji rehê dema niha yê lêkeran pêk naîne.

PAŞPIRTIKA –OK

Di nav gel de û di zimanê nivîskî de jî paşpirtika –ok li gel rehê dema niha li kar e (li jortir binêrin). Lê –ok bi rehê demên borî re di nav gel de peyda nabe. Çend hewlên peyvsazî bo çêkirina hin peyvan ji rehê demên borî + -ok hatine dan lê bi ser neketine:

- bihîst-ok (telefon yan berguhk)

PAŞPIRTIKA -OX

Paşpirtika –ox li gel rehê demên borî di zazakî de hin peyvan çêdike:

- wendox (xwandevean), vatox (bêjer), rotox (firoşer, firoşkar)²⁷...

Ne diyar e ka çend ji peyvên wiha di zazakî de bi rastî bi çalakî di nav xelkê de li kar in û çend jî tenê çêkiriyên rêzimanivîsan in.

Di kurmançî de jî hewl hatiye ku ev paşpirtik bê nasandin û aktîvkin. Li gor Amed Tîgrîs “ajotox, çêkirox, firotax, gotox, kirox, kuştox, şîretkirox, vegirtax... Ji zaravayê dimilî derbasî kurmançî bûye. Mirov him di kovara Hawar û him jî di berhemên Cigerxwîn de rastî vê parkîtê tê. Li herêma Licê kurmançî di axaftina xwe ya rojane de bi kar tînin.”²⁸

Ji nimûneyên zazakî jî û yên kurmançî jî diyar dibe ku ew li gel rehê demên borî yên lêkerên gerguhêz li kar e. Ne diyar e ka ew dikare herwiha bi lêkerên gerguhêz re jî bê bikaranîn yan na. Lê heta niha ev paşpirtik di pratîkê de di kurmançiya nivîskî de pir kêr hatiye bikaranîn û di nav gel de jî li piraniya beşên Kurdistanê nenas e.

Ji aliyê etîmolojî ve ev paşpirtik dikare ji ermenî be. Lê li aliyekî din, di belûçî – ku zimanekî îranî – de jî peyda dibe. Loma mimkin e ku ew paşpirtikeke îranî be û mimkin e ku hevrehê paşpirtika –ok ya kurmançî be.

PAŞPIRTIKA -YAR

Di peyvên *kiryar* (emel, *deed*) û *biryar* (qerar, *decision*) de rehê lêkerên “kirin, birin” û paşpirtika “-yar” hene. Di peyva “kiryar” de –kir- rehê dema niha ji lêkera “kirin” e lê di peyva “biryar / birryar” de –birr- wek rehê dema niha ji lêkera “birrîn” dixuye. Di rastiyê de “biryar” jî “birrî+ar” e anku anku ew jî ji rehê dema borî ya lêkera “birrîn” (birrî) ye.

PAŞPIRTIKA -ER

Wek ku li jor hat behskirin, paşpirtika –er li gel rehê dema niha yê lêkerên gerguhêz çalak e yan hatiye çalakkirin. Li gel rehê demên borî ew adeten ne li kar e.

²⁷ <http://www.kirmancki.com/index.php/dersen-kirmancki/item/148-k-rmancca-da-yap-m-ekleri-gertafen-virastene>

²⁸ [https://ku.wikibooks.org/wiki/P%C3%AA%C5%9Fk%C3%AEt_%C3%BB_Park%C3%AEt:_2._Park%C3%AEt_\(nuqtewa_110\)](https://ku.wikibooks.org/wiki/P%C3%AA%C5%9Fk%C3%AEt_%C3%BB_Park%C3%AEt:_2._Park%C3%AEt_(nuqtewa_110)).

Lê nûpeyva *bûyer* (rûdan, rûdaw, miqeder, qewimîn) de –er- li gel rehê dema borî yê lêkera “bûn” hatiye xebitandin: *bû-y-er* (Y herfa kelijandinê ye, tenê bo rêgirtina li ber hevghiştina du vokalan hatiye bikaranîn).

Peyva “bûyer” bi çend awayan ji peyvên bi rehê dema niha + -er cuda ye:

- ew ji rehê demên borî hatiye çêkirin (peyvên din ji rehê dema niha)
- ew ji lêkereke gerneguhêz hatiye dariştin (peyvên din ji lêkerên gerguhêz)
- ew maneya “ya/yê ku tiştêkî dike” nade anku ne navdêrek biker e (peyvên din navdêrên biker in anku tiştêkî dikin)

PAŞPIRTIKA –VAN

Li jortir me behs kiriye ku paşpirtika –van hin peyvan ji rehê dema niha çêdike. Lê di peyva *xwand-e-van / xwend-e-van* de ew vê peyvê ji rehê demên borî yê lêkera “xwandin / xwendin” çêkiriye. Navpirtika –e- bo sivikkirina xwandinê ye daku sê konsonant ND+V nekevin pey hev.

Peyva *xwandevan / xwendevan* di kurmancî de berbelav e lê wek din dijwar e ku mirov peyvên ji rehê demên borî û paşpirtika –van çêkirî peyda bike. Hin caran peyva *ajotvan*²⁹ (şofêr, ajokar) dibîne ku ji rehê demên borî yê lêkera “ajot-in” + “-van” hatiye çêkirin. Lê wek ku li jor hatiye diyarkirin, peyva “ajovan” jî heye ku ji rehê dema niha ye.

PAŞPIRTIKA –WAR

Di peyva *xwandewar / xwendewar* (kesa/ê ku dizane bixwîne) de navdêrê biker ji rehê demên borî –xwand- / -xwend- yê lêkera xwandin / xwendin + paşpirtika –war hatiye çêkirin. Navpirtika –e- bo sivikkirina xwandinê ye daku sê konsonant ND+V nekevin pey hev.

²⁹ Bo nimûne li vê derê: <http://www.trtnuce.com/haber/turkiye/ajotvan-di-bin-tirimbela-xwe-de-ma-7202.html>

2.3.2. Ji forma ferhengî

Lêkerên bi forma ferhengî (rader, mesder, infinitîv) dikarin bi paşpirtika –î bibin navdêr:

- çandin (*to cultivate*) → çandinî (*ziraet, agriculture*)

Lê gelek caran lêker bêyî zêdekirina paşpirtikan bi guhastinê (*li beşa yekem ya vê vekolînê binêrin*) dibin navdêr jî:

- çandin (*to cultivate*) → çandin (*ziraet, agriculture*)

Li aliyekî din, formên bi –î dikarin wek rengdêr jî bînin bikaranîn:

- çandin (*to cultivate; agriculture*) → çandinî (*agricultural*)

2.4. ÇÊKIRINA NAVDÊRAN JI HEJMARAN

Çend hejmar dikarin bi çend paşpirtikên ji hev cuda bibin navdêr. Ev paşpirtik di çêkirina navdêran ji hejmaran de li kar in lê ti ji wan ne pir biber in: *-e, -ik, -îtî, -yîtî*

Paşpirtika –e maneyan deman (rojan yan salan) dide hejmaran:

- hefte (heft roj)
- çile (40 roj)

Ji bilî van herdu nimûneyên kevnar, paşpirtika ”-e” di hin peyvên nûçêkirî yan ji farisî wergirtî de paşpirtika –e ne maneya ”roj”ê lê wateya ”sal”ê dide:

- dehe (dehsal, *decade*)
- sede (sedsal, *century*)
- hezare (hezarsal, *millenium*)

Ev peyvên bi maneya "sal" di kurmançî de kêmtên bikaranîn, li cihê wan peyvên pêkhatî (hejmarek + sal) di zimanê nivîskî de li kar in: *dehsal, sedsal, hezarsal* lê formên *dehe, sede, hezare* jî carinan têt dîtin, bi taybetî di bin tesîra soranî yan farisî de.

Di peyva *yeke (unit)* de paşpirtika *-e* maneya demê nade lê wateya komekê dide. Ev peyv jî zêdetir di soraniya nivîskî de li kar e. Di kurmançî de li cihê wê di zimanê nivîskî de peyda *yekîne* anku **paşpirtika *-îne*** serdest e, wek nimûne di navê hêzên çekdarî yê Rojavayê Kurdistanê *Yekîneyên Parastin Gel (YPG)* de.

Paşpirtika *-î* di kurmançiya rojhilatî de peyva *heftî* çê dike ku hevwatera peyva *hefte* ya devok û zaravayên din e. Heman paşpirtika peyva *çilî / çelî* de heye ku maneya "rewşa dayikê û/yan zarokê di 40 rojên pêşîn yê welidînê / welidandinê de".

Paşpirtika *-ik* çendîn peyvên bi maneya "ewqas roj" çêdike. Yek ji van peyvan *çilik / çelik* e ku hevwatera peyva *çilî / çelî* ya li jortir behskirî ye. Heman paşpirtik çend peyvên din jî çêdike:

- şeşik (şeş roj, bi taybetî 6 rojên rojîgirtina dilxwazî di meha şewalê ya salnameya îslamî de)
- nehik / dehk (9/10 roj, xaseten rojên rojîgirtina dilxwazî di meha zulhecê ya salnameya îslamî de)

Di lîstika bi navê *pêncokanê* de navdêr ji **paşpirtika *-ok*** ji hejmarê hatiye avakirin. Lê peyva **pêncok* tenê peyda nabe. Herwiha paşpirtika *-anê* ya bi maneya "yarî, lîstik, -bazî" heye (bidin ber *goganê, holanê, topanê, şûranê, gilçanê* û hwd.)

2.5. ÇÊKIRINA NAVDÊRAN JI NAVDÊRAN

Di çêkirina navdêran ji navdêran de bi alîkariya paşpirtikan, mirov dikare bibîne ku navên hin tiştan dikarin bibin navên hin bikeran (kesên ku wan tiştan dikin). Herwiha mirov dikare ji navê bikeran jî karên wan bikeran çêke. Li aliyekî din, navê tişt û kirinan jî ji bikerên wan mimkin e.

2.5.1. ÇÊKIRINA BIKERAN JI TIŞTAN

Piraniya navdêrên biker (agent nouns) anku navên bikeran (kesên ku tiştêkî dikan yan xwedî tiştêkî ne) bi alîkariya paşpirtikan di kurdî de ji navên wan tiştan tên çêkirin:

- ga → gavan
- hiş → hişyar
- asin / hesin → asinger / hesinger
- nal → nalbend
- huner → hunermend
- çay → çayçî
- dikan → dikandar
- hîle → hîlebaz
- siyaset → siyasetmedar
- komun → komunîst
- çav → çavdêr

Wek ku ji paşpirtikên van peyvan diyar e, ne paşpirtikek lê çendîn paşpirtik di çêkirina bikeran ji tiştan de hene. Ev tenê hin nimûne ne, lîste bi ti awayî ne temam e.

Hin ji wan pir nadir in, bo nimûne “-medar” di peyva “siyasetmedar” de ku tenê formek e ji peyva “siyasetvan” ya giştîtir. Lê paşpirtikên din bi piranî hemû çalak û biber in, bo nimûne “-van, -mend, -dar, -baz, -îst”. Hin ji van bi zelalî biyanî ne, bo nimûne “-îst” ji zimanên ewropî ye, “-çî” ji tirkî ye û “-mend” jî ji farisî ye û tenê vê dawiyê bi rêya soranî ketiye kurmancî. Di rastiyê de “-dar” jî ji farisî ye û rehê dema niha ji lêkera “daştên” (hebûn, xwedî bûn) e anku “dikandar = ya/yê ku dikan heye” lê ji mêj ve ketiye kurdî.

Ji bilî paşpirtikan, herwiha navdêrên biker gelek caran ji navdêr + rehê dema niha yê hin lêkeran tên çêkirin:

- stran-bêj
- kar-ker
- peyam-ber
- şîr-mêj

Lê “paşpirtikên” wiha di rastiyê de ne paşpirtik in, ew rehên lêkeran in (carinan + -er) loma em wan li vê derê wek paşpirtikên çêkirina navdêran ji navdêran nahesibînin. Di mijara peyvên pêkhatî de me behsa wan kiriye.

PAŞPIRTIKA -Î

Ev paşpirtik navê xelk û miletan ji navên welatan û herwiha jî navê rûniştvanên deran ji navên wan deran çêdike:

- Kurdistan → kurdistanî
- Dihok → dihokî
- bajar → bajarî
- gund → gundî
- welat → welatî

Eger navê welatî yan bajarî bi vokala –a bi dawî bibe, adeten paşpirtik dikare –yî be yan jî –a dikare bikeve û cih bide –î:

- Ewropa → ewropayî / ewropî
- Amerîka → amerîkayî / amerîkî

Eger nav bi xwe bi –î bi dawî were, hingê –î dubare nabe û –iyî jî

- Silêmanî (bajar) → silêmanî (xelk)
- Amêdî (bajar) → amêdî (xelk)

Peyvên wiha çêkirî bi eslê xwe rengdêr in û maneya "ji / têkilî filan cihî" didin lê bi berfirehî bi maneya "rûniştvana/ê filan cihî" yan "kesa/ê ji filan derê" jî didin.

PAŞPIRTIKA -VAN

Hevrehên paşpirtika –van di zaravayên kurdî û zimanên din jî yên îranî de peyda dibe: soranî û kurdiya başûrî –(e)wan, farisî –ban, pehlewî –pan, avestayî û hexamenişî –pane, hemû ji proto-hindûewropî *peh- (parastin) ku herwiha serekaniya lêkeran *payîn / pan* (li bendê bûn, li hêviyê bûn) ya kurmancî, *payîden* ya farisî û *pawtene* ya zazakî ye jî.

Maneya eslî ya vê peyvê paşpirtikê "çavdêr, nobedar, parêzvan" e, wek di gotinên *şivan, gavan* de. Lê êdî maneya vê paşpirtikê berfireh bûye û ne tenê bi çavdêriya pasîv ve maye lê herwiha li şûna bikerên aktîv jî tê xebitandin:

- nêçîrvan (kesa/ê ku nêçîrê dike, heywanan dikuje)
- helbestvan (kesa/ê ku helbestan dinivîse)³⁰

Hin kes berfirehbûna paşpirtika –van rexne dikin û dibêjin ku bo nimûne peyvên wek *helbestvan* şaş in. Ew li cihê vê peyvê bo nimûne peyva *helbestkar* pêşniyaz dikin. Lê berfirehbûna mane û bikaranîna hin paşpirtikan diyardeyeke zimannasî ya giştî ye loma peyvên heyî û berbelav di cihê xwe de ne. Herwiha peyvên çêkirî yê wek *helbestkar* xelet in ji ber ku mirov dikare helbestvan be anku helbestan binivîse bêyî ku ew "karê" mirovî bin – mirov belkî di jiyana rojane de karekî qet ne têkilî helbestvaniyê bike lê dîsa jî di nivîsîna helbestan de biserketî be.

Paşpirtika –van di hin peyvan de bi hin varyantên ji vê forma serekî cuda ye. Di soranî de ew adeten ne "-wan" lê "-ewan" e: *şax-ewan* (çiyavan). Tesîra vê formê li hin peyvên kurmancî, xaseten behdînî jî heye:

- pişt-ewan (piştgir, alîgir)
- nivîs-ewan (nivîskar, nivîser, edîb, katib)
- zêr-ewan (çavdêr, ji *zêr = seyr anku temaşe [kirin])

Ji bilî forma *kevanî* (bermalî, jin, pîrek, kulfet), herwiha varyantên *kabanî*, *kebanî* jî di kurmancî de peyda dibin. Di wan de tesîra forma –*ban* ya farisî heye tevî ku *kabanî*, *kebanî* li derveyî Rojhilata Kurdistanê jî di kurdî de peyda dibin. Heman form di peyva *şabanî* / *şabanû* (melike, kralîçe) de jî peyda dibe lê ji xwe ev peyvê dawiyê ji farisî hatiye wergirtin. Paşpirtika –î ya li pey van peyvên *kebanî* / *şabanî* baş nayê nasîn. Mimkin e ku ew nîşana mêyîtiyê be ji ber ku heman paşpirtik di peyvên din jî yê bi heman maneyê de heye: *bermalî*, *berdilî*, *delalî* yê bi maneya "jin, yar".

PAŞPIRTIKÊN –DAR, –DÊR, –DE

Gava ku paşpirtika –*dar* rengdêran çêdike, ew bi bi zelalî van maneyan dide: "xwedîya/ê tiştêkî", "bi tiştêkî", "kesa/ê yan tiştê/ê ku tiştêkî heye". Lê gava ku ew navdêran ji navdêran çêdike, maneya wê berfirehtir e:

- dikandar (xwedîya/ê dikanekê → birêvebera/ê dikanekê, *shopkeeper*)

³⁰ Xaseten li Behdînan mirov peyva *hozanvan* jî dibihîze ku ji encama şaşfêhmkirina peyva *hozan* bi maneya *şîir*, *helbest* hatiye çêkirin. Di rastiyê de *hozan* bi xwe *helbestvan*, *şair* e loma *hozanvan* totolojî ye anku paşpirtika –*van* dubare û zêde ye.

- birîndar (kesa/ê ku birîn hen → kesa/ ku birîn lê bûne, *wounded*)
- guhdar (kesa/ê ku guhê xwe dide gotinên kesên din, *obedient*)
- fermanदार (kesa/ê ku xwedî ferman e yan fermanan dide, *commander*)

Ji van nimûneyan herduyên dawiyê (guhदार, fermanदार) dikarin bi şaşî li cihê “guhder, fermanदार” hatibin çêkirin jî lê guman jê nîne ku ew bi şiklê xwe yê “guhदार, fermanदार” serdest in.

Heman paşpirtika –dar di soranî û farisî de jî heye. Di rastiye de di farisî de ew rehê dema niha ji lêkera *daşten* (hebûn, xwedî bûn) û maneya “heye” dide. Di kurdî de bi vê maneyê ew wek peyveke serbiwe peyda nabe³¹ û –dar bi zelalî paşpirtik e. Lê di farisî de ew rehê lêkerekî ye û di farisî de peyvên “–dar”ê çêkirî dikarin wek peyvên pêkhatî bên hejmartin. Di zimanên îraniya navîn (pehlewî, partî) û îraniya kevn (avestayî û hexamenişî) de jî “dar-“ wateya “hebûn”ê dida.

Di kurdî de di peyva *çavdêr* (lênêr, kontrolker, *observer*) de paşpirtik ne –dar lê –*dêr* e lê bi mantiqa xwe ew jî her wek *guhदार* e. Di kurmanciya nivîskî de, xaseten di rêzimanê de çend peyvên din jî bi paşpirtika –dêr hatine çêkirin lê di rastiye de maneya wan ji “-dêr /-dar” ya bingehîn gelek dûr e yan qet tine ye:

- deng (*voice, sound, phoneme*) → dengdêr (*consonant*)
- nav (*name*) → navdêr (*noun*)
- reng (*colour*) → rengdêr (*adjective*)

Di van peyvên de, bi taybetî di *navdêr* û *rengdêr* de –dêr ji –dar zêdetir dişibe –*der* anku dide. Bo nimûne “*rengdêr*: peyvên ku rengan / awayan didin peyvên din”. Lê peyva *dengdêr* nayê zanîn ne ewqas jî biserketî ye ji ber ku consonant adeten wek herfên “bêdeng” tên hesabandin, ne wek yê “bideng”. Helbet her herf “bideng” e anku dengê heye lê eger em “dengdêr” bi maneya “herfên ku deng hene” qebûl bikin jî, ma çawa vokalan deng nînin heta ku em ji dijberên wan re bibêjin “dengdêr”?!

Paşpirtika –*de* bo nimûne di peyvên *fermande* û *qûnde* de heye. Ew di rastiye de ne paşpirtikek e lê formeke rehê dema niha ji lêkera “dan, dayîn” e ku formên din –d- (bi-d-in, ne-d-î) û –*der*- (forma kevn ya paşgir) in.

³¹ Ji aliyê etîmolojî ve ti tîkiliya paşpirtika –dar bi peyva “dar” (qurmê ku çeq û çilû pê ve şên dibin) ve nîne û ew ne eynî peyv in.

PAŞPIRTIK -YAR

Paşpirtika –yar bo nimûne di peyvên wek *hiş-yar* û *bext-i-yar* de heye.

Berevajî ku hin caran tê idiakirin, ew ne ji peyva “yar” ya bi maneya “dost, evîndar, aşiq, maşûq” e. –yar formeke “nermbûyî” ji paşpirtika –dar e. Bo nimûne *hişyar* anku kesa/ê hiş û aqil heyî, wek *aqildar* ya hevwatera wê. Bo guherîna D bi Y, bidin ber kurmancî *sed* û zazakî *sey*.

Peyva *cotkar* xaseten di kurmanciya rojhilatî de bi awayê *cotyar* e, bi soranî *cutyar*. Mimkin e ku ev –yar jî ji –dar be lê herwiha dibe ew ji –kar jî be û pêşî bûbe –gar û taliyê jî bûbe –yar.

PAŞPIRTIKA –GER

Paşpirtika –ger ji mêj ve di kurdî de di peyvên wek *asin-ger* / *hesin-ger* û *zêr-in-ger* de heye. Vê dawiyê hin nûpeyv jî pê hatine çêkirin, wek “rojnameger, weşanger, dozger, mêtînger (kolonyalîst)”. Lê dîsa jî bikaranîna vê paşpirtikê bisinor e û wisa dixuye ku dê bisinor bimîner.

Heman paşpirtik di soranî û farisî de jî li kar e, di farisî de piçekê ji kurdî çalaktir e. Ev paşpirtik bi eslê xwe ji paşpirtika –ker e lê bi nermkirinê K bûye G.

Hêjayî bibîranînê ye ku ev paşpirtik li gel rehên lêkeran –gerr (ji “gerrîn”) û “-gêrr” (ji “gêrran” anku “gerrandin”) neyê tevlihevkin:

- esmangerr (astronot, kesa/ê ku li esmanan / fezayê digere)
- aştgêrr (kesa/ê ku aşt digerrîne, dilivîne, diçerixîne)

Bo guherîna –ger û –gêrr van peyvên bidin ber hev:

- rojnameger (rojnamevan, rojnamenivîs, jornameger)
- rojnamegêrr (kesa/ê ku rojnameyan digerrîne daku bifiroşe yan bigihîne mala xelkê)

PAŞPIRTIKA –MEND

Ev paşpirtik bo nimûne peyvên wek *hunermend*, *karmend*, *şêwirmend* yên navdêrên biker ji navdêran çêdike. Maneya bingehîn ya paşpirtik –mend jî wek ya –dar e anku “kesa/ê ku tiştek heye”.

Ew mane baş di rengdêrên wek “dewlemend, behremend” de diyar dibe. Di navdêrên bi vê paşpirtikê de wateya paşpirtikê êdî ne zelal e lê erka wê berçav e: navdêrên ku ew çêdike biker in: “kesa/ê ku tiştêkî dike yan mijûlî tiştêkî ye”.

Ev paşpirtik vê dawiyê bi rêya soranî ji farisî ketiye kurmancî. Ew di peyvên nav gel de belav di kurmancî de peyda nabe. Heman paşpirtik di pehlewî de wek *-(o)mend* û di avestayî û hexamenişî de jî wek *-ment* hebû. Di soranî de û xaseten jî di kurdiya başûrî de D-ya dawiya peyvê dikeve û paşpirtik dibe *-men*.

PAŞPIRTIKA –ÇÎ / -CÎ

Ev paşpirtik bi eslê xwe ji tirkî ye. Di tirkî de ew li gor peyva bingehîn çendîn formên ji hev cuda werdigire: konsont dikare Ç yan jî C be, vokal jî dibe ku I, İ, U, Ü. Di kurdî de ev hemû varyantên tirkî adeten dibin –çî:

- tirkî: bekçi → kurdî: bekçî (nobedar, zêrevan, çavdêr)
- T: çaycı → K: çayçî (çaygêrr)
- T: topcu → K: topçî (topavêj, bombeavêj)
- T: Apocu (PKKyî) → K: apoçî

Ji vê nimûneya dawiyê mirov roj bi roj zêdetir herwiha forma “apocî” jî dibîne anku C-ya peyva tirkî di kurdî de wek C tê parastin.

Dijberên apociyan bi tirkî bi bernavê “korucu” (parêzvan) tên nasîn ku kurtkirina “köy korucu” (gundparêz, parêzvanên gunda) e. Ev peyv di kurdî de bi piranî bi forma “qoricî” li Bakurê Kurdistanê li kar e û beramberî “cehş, caş” (kurdên alîkarên hikûmetê) berê li Başûrê Kurdistanê ye. “Qoricî” yek ji wan kêm peyvan e ku tê de di kurdî de C-ya paşpirtika –CU ya tirkî wek C hatiye parastin û nebûye Ç.

Bikaranîna paşpirtika –çî ne tenê ketiye kurmanciya li ber tesîra tirkî. Ew herwiha di soranî, farisî û erebiya devkî de jî cih digire. Bikaranîna vê paşpirtikê di kurmanciya nivîskî de heta ji farisî û soranî jî zêdetir bisinor e – ihtimalen ji ber ku piraniya kurmancînivîsan dizanin ku ew ji tirkî ye û loma naxwazin wê bi kar bînin.

PAŞPIRTIKA -BAZ

Ev paşpirtik bo nimûne di peyvên wek *hîlebaz*, *fêlbaz*, *sihirbaz*, *cambaz* / *canbaz* de heye. Ew bi eslê xwe ji farisî ketiye kurdî û di farisî de rehê dema niha ji lêkera *baxten* (lîstin, yarî kirin) e.

Bikaranîna vê paşpirtikê di kurdî de bi piranî bi meremeke neyînî û negatîv tê bikaranîn, wek ku ji peyvên *fêlbaz* û *hîlebaz* diyar e. Ev peyv di heman demê de navdêr û rengdêr in jî, navdêrî yan rengdêriya wan ji hevokê diyar e.

PAŞPIRTIKA –ÎST / -IST

Ev paşpirtik di sedsala 20em de ji zimanên ewropî ketiye kurdî. Ew bi piranî navdêrên biker yên bi maneya biker û aktorên siyasî û civakî li kar e, bo nimûne:

- komun-îst
- sosyal-îst
- radîkal-îst
- faşîst
- rasîst

Lê carinan peyvên nesiyasî jî wê paşpirtikê werdigirin:

- piyanîst (piyanolêder)
- kolumnîst
- panelist

Adeten bikaranîna vê paşpirtikê tenê li gel peyvên ji zimanên ewropî mimkin e, ew bi hêsanî nakeve gel peyvên xwemalî yan wek din rojhilatî.

PAŞPIRTIKA –BEND

Paşpirtika *-bend* ji mêj ve di peyva *nalbend* de di kurdî de cih girtiye. Vê dawiyê ew di peyvên wek *pêbend* / *pabend* (dilsoz, wefadar, sadiq, *loyal*) û *sazbend* (hunermenê sazê, muzîkvan) de jî tê dîtin. Wek di rola vê paşpirtikê di çêkirina navdêrên biker ji navdêrên din de kêma e.

Ev paşpirtik yekser yan bi rêya soranî ketiye kurmancî. Di farisî de ew rehê dema niha yê lêkera “bestin” (girê dan) e (bidin ber kurdî *ben, benik*). Ew herwiha navê tiştan jî ji tiştên din çêdike wek “gulbend, şûşebend”.

Varyanta din ya vê peyvê “-wend” e ku di peyvên wek *zema-wend* û *pê-wend-î / pey-wend-î* de heye.

PAŞPIRTIKA -MEDAR

Ev paşpirtik tenê di peyva *siyasetmedar* (siyasetvan, polîtisyen) de navdêrek biker ji navê tiştê çêdike. Ev peyv vê dawiyê ji farisî hatiye wergirtin. Bi eslê xwe ji du peyvên erebî yên serbixwe *siyaset + medar* pêk hatiye.

2.3.2. ÇÊKIRINA NAVÊN KARAN JI BIKERÊN WAN

Bi alîkariya çendîn paşpirtikên ji hev cuda mirov dikare ji navdêrên biker (agent nouns) anku navên kesên ku tiştê dîkin yan tiştê in, karê wan kesan çêke:

- diz → dizî (karê dizan)
- serok → serokatî (karê serokan)
- pêşmerge → pêşmergetî (karê pêşmergeyan)

Mimkin e ku navdêrên biker ji xwe jî paşpirtikeke peyvsaz hebûbe û paşî ev paşpirtika çêkirina nave karan ji bikeran jî wergire:

PAŞPIRTIKA -Î

Piraniya navên karan dikarin bi paşpirtika -î ji navên bikeran anku kesên ku wan karan dîkin bîn çêkirin:

- doktor → doktorî
- diz → dizî
- hunermend → hunermendî

Wek ku diyar e, paşpirtika –î dikare bikeve hem gel peyvên xwemalî (li vir “diz”) û hem jî yên bi eslê xwe biyanî (di nimûneyên me de “doktor”). Ew herwiha dikare bikeve gel peyvekê ku ji xwe paşpirtikeke din heye:

- huner → huner-mend → huner-mend-î

PAŞPIRTIKÊN DIN

Eger navdêrê biker bi vokalekê bi dawî bibe, hingê li cihê –î paşpirtika –tî, -yî yan –hî heye:

- hosta / hoste → hostatî / hostahî / hostayî, hostetî / hostehî / hosteyî
- pale → paletî / palehî / paleyî

Bi taybetî di kurmanciya navendî de, paşpirtika –tî yan –îtî dikare herwiha bikeve gel navdêrên biker yê konsonant li dawîya wan jî:

- doktor → doktorîtî / dokortî

Di hin peyvan de çend paşpirtikên ji van jî cuda karan ji bikeran çêdikin:

- serok → serok-atî / serok-ayetî
- endam → endam-etî
- dost → dost-anî
- heval → heval-înî

Paşpirtika –î ya “karsaz” bi eslê xwe îranî ye, di soranî û farisî de her –î ye, di pehlewî û partî de –îh bû, di hexamenişî û avestayî de –ye-vehye bû. Paşpirtika –(a)yetî encameke têkilkirina –î ya îranî û paşpirtika –yet ya ji erebî ye. Paşpirtikên –atî, –etî-, –îtî-, –itî, –tî jî kurtkirinên –(a)yetî ne.

Ev vekolîn dê bidome

“Peyvsazî bi dariştinê” dê di hejmara bê de bidome. Hin beşên navdêrsaziyê mane û herwiha lêkersazî û hokersazî jî hê nehatine behskirin. / Kovara Kanîzar

Gerdnîş³² le Kurdî Kirmaşanî

Řizgar Behadur



Gerdnîş wite³³yg e nîşî e lay yey temamker nawî³⁴. Gerdnîş tüenî werce temamkerege bay ya le düay temamkerege bay, herleywa gerdnîş tüenî bû e du beş û binîşî e dewr temamkerege. Eger gerdnîş

³² adposition

³³ word

³⁴ nominal complement

werce temamker bay we pî ûşin wernîş³⁵, eger le düay temaker bay we pî ûşin piştîş³⁶, befam eger le her du lay temamkerege cî bigrî we pî ûşin dewrnîş³⁷.

Deseş gerdnîş³⁸ her ew cûre ki le nawegeyew dyar e, deseş e ser³⁹ gerdnîşîg e. deseş gerdnîş le gerdnîş û deseş nawîg⁴⁰ duris bû. Le řü ředenasî⁴¹ le gişt zwaneyl bineway deseş gerdnîş cûr yek nîe û le her zwanîg řiz⁴² gerdnîş û deseş naw güřyey. Le biřîg le zwaneyl cay gerdnîş ha werce deseş naw û le biřîg tir deseş gerdnîş kefi e düay deseş naw.

Le Kurdî Kirmaşanî î gerdnîşeyle dîrîm:

Eřa

Le

Lebarey

Ta

We

Wegerd

E (kuř kiray le, eřa, we)

Eřa ewey bizanîm gerdnîş le naw cumle kefi e kûre, bayed biûřîm e peykerey zwanî⁴³ Kurdî Kirmaşanî ta bûnîm herkam le î gerdnîşeyle kefin e kam lay desy naw.

Eřa:

³⁵ preposition

³⁶ postposition

³⁷ circumposition

³⁸ Adpositional phrase

³⁹ head

⁴⁰ Noun phrase

⁴¹ typology

⁴² order

⁴³ linguistic corpus

- 1) Îre cay xasîg eřa wisan nê.
- 2) Tereylîegan eřa kûre çin?
- 3) Řixî řî çya biçû eřa mař.
- 4) Çîn eřa cayg ne serma bî, ne wirsyerî û ne jan.
- 5) Ew îř nîřt û weserhat xuey eřa bawejinegey wit.
- 6) Tun îř meteř xued eřa î wîlkane büř.
- 7) Carî zü e eřa qise kirdin.
- 8) Bün î biřfincige tway biçû eřa kû!

Le:

- 1) Le her zwanîg du cûr deň dîrîm.
- 2) Imřew dî bayed le îre biçîm e řîew.
- 3) Kule le sayeřîg heřajyaü.
- 4) Agir le řeweyl serd Xirs û merdimegey germew kirdya.
- 5) Düetege kemřü bî û heyway, beřam yey liň le kewřeganî men e cî.
- 6) Fere le gyanewereyl ew dewrgird îře hatin.
- 7) Le kû zanîd dinya ha des kî?

Lebarey:

- 1) Herkes tüenî lebarey kar xuey çîřt binüsî.
- 2) Lebarey ewe, ki mirdin çe s, duktur Lanza üřî wextîg mirîm ducare heřewgerdîme ser binçîney xueman.
- 3) Bizgîr tüenî lebarey nîrx kawîř û mîe qise bikey.
- 4) Deňnasî liqîg e le zwannasî giřtî ki lebarey deňeyl zwan qise key.
- 5) Dîdgay durisîg lebarey elifba le wer des neü.
- 6) Xerûřk le nway gyanewereyl tirek dařt lebarey suretî gezaf diya.

Ta:

- 1) Düet biçare bedbextî le ser ta pay warya.
- 2) Min ta î qeřbezene nekuřim, nîetyem e deyřt.
- 3) Îme her le řewekî ta îware dinya neym e jîr pa.
- 4) Bawejinegem her le řewekî ta îware kar we kûřim kîřya.

- 5) Nîşt wesehat xuey le ser ta bin e'ra wîlkanegê bas kird.
- 6) Twasya wegerd ew xurd û xurake ta axir zimsan bijyey.
- 7) Her le şewekî şefeq ta dukut şewar teqey desî tyey.

We:

- 1) Twasyam bizanim çenîg we pî çû ta dûşmen bünîm.
- 2) Min we serey kes nîm.
- 3) We des xuey şî luqme na demî.
- 4) Kes dî pete'nege we çew ney.
- 5) Zûrdan îş xû we min nîre'sî.
- 6) Her le î'şûjeyle we arezûd řesîd.
- 7) Biraî we xûn e.
- 8) Ew ma'le we di'îm nenîşt.
- 9) We dergay Xuda na'îm hemîşe.

Wegerd:

- 1) Le ser çe wegerd minaleged ce'rbas keyd?
- 2) Tûenîd wegerd terevlîegan biçîd.
- 3) Kuna qe'üeganî wegerd gunî û pe'û kipew kiryaü.
- 4) Hergiz wegerd ayimeyl gewc bas neke.
- 5) Şay Kûsegan le lay tafîg we xueşîew wegerd jinegey jya.
- 6) Inca pyage wegerd ew çuku'eyle ser teweregey siftew kird.
- 7) Inca fikir kird xas e çen kelîme îş wegerd datigyan qise bikey.
- 8) Hemîşe û le gi cayg wegerd minalegandan we Kurdî qise biken.

E (ku' kiray le, e'ra, we):

- 1) He'bet hîç e pişîege nîetyey. (we)
- 2) Min bayed biçyam e ew des pîtege. (e'ra)
- 3) Min qeyrîg wisim û inca kefim e řî. (we)

- 4) Min nûrîm e ew des awege. (we)
- 5) Ne kes çîştîg e î sen û ne kes îş qurûşîg na desî. (le)
- 6) Min zelem e lîd çû. (le)

Ta îse her ew cûre ki le ew nimûneyl bane dyare, le Kurdî Kirmaşanî gerdnîş hemîşe nîşî e werce desey naw. Inca tüenîm büşîm, le bawet gerdnîşew, Kurdî Kirmaşanî wernîş⁴⁴ e û tenya wernîş⁴⁵ dîrî.

Beîam î base her le îre düay nîetyey, çün le peykerey zwanîman nimûneylîg peya bûn ki hewece dîrin we şîweyg tir şîew bikiryen.

- 1) Wegerd xueyew witya, "Merg îse xeylî asan tüenî bay e gyanim".
- 2) Gerdelegüçanege ducare hat û petege wegerd xueyew bird.
- 3) Le wext qise kirdin eger hewa le demew der biçû deñ demî duris key.
- 4) Zeü wişkîg le düew dyar bî.
- 5) Le Qesew tyem, lîmû barim e.
- 6) Yane le esasew îştiba n.
- 7) Le maew zeñ dem e pîd.
- 8) Banaşew beçke qazîaxegan le tirew lerz keftü e gyanyan.
- 9) Inca we şûxî wit e jinegey hetmen pyay qeşeñîg le řew dîe û gûştegan da se ew.
- 10) Dîn awege dar mewzîg wegerd xueyew hawirdiye.

Wextîg nûrîm e î nimûneyle, dünîm le düay desey naw nîşaney **-ew** we dî kiryey. Yanî le î nimûneyle, gerdnîş îme du beş dîrî, beşîgî nîşî e wer desey naw û beşegey tirî we şîwey piştlik⁴⁶ ya piştçem⁴⁷ likî e pişt desey naw. We zwan sadetir tüenîm büşîm le Kurdî kirmaşanî gerdnîşîg tir dîrîm ki nîşî e dewr desey naw. Her ew cure le ewel basege witîm, le zwannasî eîra î gerdnîşe naw dewrnîş hetwîjardine.

⁴⁴ prepositional

⁴⁵ preposition

⁴⁶ suffix

⁴⁷ enclitic

Inca le axir î base tûnîm büşîm Kurdî Kirmaşanî le bawet gerdnîşew herçend zûrim şîwey wernîşî dîrî, befam nimûneyl fereyg îş hen eřaman bas le şîwey dewrnîşî ken. We î xatire tûenîm büşîm, Kurdî Kirmaşanî le bawet gerdnîş, hem wernîşî e û hem îş dewrnîşî.

Peyva vê carê

ZANÎN

lêker, gerquhêz

navdêr, mê

Wate

1. hay jê hebûn, aga jê hebûn, agadar bûn, haydar bûn (ji tiştekê);
Ez dizanim ew li kû ye. (Min agadarî heye ka ew li kû ye. Min hay jê heye ew li kû derê ye.)
2. karîn tiştekî bike:
Ez dirûnê nizamim
3. karîn bi zimanekî biaxive û fam bike:
Ew baş bi kurdî dizane.
4. piştrast bûn:
Ez dizanim ew dîsan jî nayê.

5. [zanist](#), [zanyarî](#), [ilm](#):

Em tenê dikarin bi zanîne civaka xwe pêş ve bibin.

Bi alfabe yên din[\[biguherîne\]](#)

- kurdî-erebî: [زانين](#) / [ظانين](#)
- kurdî-krîlî: [занин](#)

Tewîn[\[biguherîne\]](#)

-zan-

Neyînî

- *dema niha ya giştî û dema bêt*: **nizan-**
- *dema niha ya berdewam*: **nedizan-**
- *demên borî*: **ne(-)zan-**

Bide ber

- [aga](#) jê hebûn
- [aşna](#) bûn
- [hay](#) jê hebûn
- [nasîn](#)
- [nas](#) kirin
- [sareza](#) bûn

Agadarî

Lêkerên "karîn/kanîn" (anku "şiyar", "hêz hebûn") û "zanîn" bi hin awayan ji lêkerên din yê kurmancî cuda ditewin. Bo nimûne di dema niha de di hin devokan de pêşqertafa "di-" nakeve pêşiya wan. Loma "ez di-kim, tu di-bêjî, ew di-xwe" lê "ez karim, tu zanî, ew kane" (li cihê "ez dikarim, tu dizanî, ew dikane").

Herwiha neyînîkirina wan ne bi "na-" ya giştî lê bi "ni-" ye: Loma "ez na-kim, tu na-çî, ew na-bêje" lê "ez ni-zanim, tu ni-karî, ew nikane".

Herwiha di rewşên din de jî hin cudahî hene. Ji hemû lêkerên din re di raweya şertî de (kondîsyonal yan subjunktîv) bi giştî lêker bi formûlaya "bi- + rehê dema niha + qertafa kesandinê ne": "ez bi-ç-im, tu bi-k-î, ew bi-bêj-e". Ev qaydeya giştî di hin devokan de dîsa li gel

lêkerên "karîn/kanîn" û "zanîn" jî li kar e: "ez bi-zan-im, tu bi-kar-î, ew bi-kan-e". Lê di hin devokan de jî ew bi formûlaya "rehê dema niha + -i- + -b- + qertafa kesandinê" tê çêkirin: "ez kar-i-b-im, tu zan-i-bî, ew kan-i-b-e". Di hin devokan de jî îcar ev herdu qayde di heman demê de tên bikaranîn: "ez bi-zan-i-b-im, tu bi-kar-i-bî".

Lê ji van awarteyîyan tenê "ni-" ya neyînîkirinê di kurmançî de di hemû devokan de awarte ye. Lê awarteyîyên din tenê di hin devokan de hene. Devokên din qeydeyên giştî bi kar tînin. Loma divê em di mesela "di-" de li gor qaydeya giştî biçin: "ez dikarim" ne "ez karim". Herwiha ji ber ku "ez bi-zan-im, tu bi-kar-î, ew bi-kan-e" li gor qaydeya giştî ne û formên wek "ez zan-i-bim, tu kar-i-bî, ew kan-i-be" yan jî "ez bi-zan-i-bim, tu bi-kar-i-bî, ew bi-kar-i-be" awarte ne, divê em wek "bizanim, bikarî, bikane" tercih bikin.

Ji

Ji [proto-hindûewropî](#) *[ǵenh₃-](#) / *[ǵenə-](#) / *[ǵnō-](#), têkildarî *zan-* ya avestayî, pehlewî *dan-*, farisî *dan-*, zazakî [zanayen](#), sanskrîtî *jānāmi*, rusî [знать](#) (znat'), elmanî [kann](#), swêdî [kan](#) ([dikare](#)) û [känna](#) ([nasîn](#)), inglîzî [can](#) (bixwîne: *ken*, "karîn") û [know](#) (bixwîne: *niw* "zanîn" ji inglîziyan kevn [cunnan](#), bixwîne: *kunnan* "zanîn").

- [proto-hindûewropî](#): *[gne-](#) ("zanîn")
 - [proto-aryayî](#): *[zan-](#) ("zanîn")
 - [avestayî](#): [zān-](#) ("zanîn")
 - [parsî](#): [z'n-](#) ("zanîn")
 - [pehlewî](#): [d'n-](#) ("zanîn")
 - [sogdî](#): [z'n-](#) ("zanîn")
 - [farisî](#): [dān-](#) ("zanîn")
 - [osetî](#): [zynd-](#) ("zanîn")
 - [belûçî](#): [zan-](#) ("zanîn")
 - semnanî: [zūn-](#) ("zanîn")
 - sengîserî: [zun-](#) ("zanîn") ... [alfabeya arî](#)
 - [kurmançî](#): [zanîn-](#) ("zanîn")
 - [soranî](#): [zanîn-](#) ("zanîn")

hewramî: **zanay** ("zanîn")

zazakî: **zanayen**

sanskritî: **jna-** ("zanîn")

latînî: **gno-** ("zanîn")

yewnanî: **gno-** ("zanîn")

inglîzî: **know** ("zanîn") ...

elmanî: **kann** (dikare)

swêdî: **kan** (dikare), **känna** (nasîn)

Çavkanî: [Cheung p.467](#), [Watkins p.33](#), [Etymonline](#)

Binêre herwiha: [nasîn](#)

Dengnasî: dirûvên dengan di zimanî de

George Yule

ji inglîzî: Dilyar Amûdî



wêne: wergêr Dilyar Amûdî

Uans appona taim uas tri berres; mamma berre, pappa berre, e beibi berre. Live inne

contri nire foresta. NAISE AUS. No mugheggia. Uanna dei pappa, mamma, e beibi go bice, orie e furghetta locche di dorra.

Bai ene bai commese Goldilocchese. Sci garra natingha tu du batte meiche troble. Sci puscia olle fudde daon di maute; no live cromma. Den sci gos appesterrese enne slipse in olle beddse.

Bob Belviso, quoted in Espy (1975)

Di beşa pêş de⁴⁸, Me, li ser asta mekanîzma dengjenînê⁴⁹ ya buhirka dengî ya mirovî, li awayê fîzîkî yê derxistina dengên axiftinê vekola. Ew tûjandin bi xêra rastiyên seyr yên taybetmendiyên zimanî pêkan bû. Gava ku me behsa buhurka dengî dikir, me hesab nedikir, gelo ew kesê ku em qala wî dikin, ka mirovekî ji rêjeyê ye ku wezna wî 90 kîlo ye û 180 santîm e, yan jî mirovekî hinekî hûriktir e ku 150 santîm e û wezna wî jî 45 kîlo ye. Tevî ku em dizanin ku buhurka dengî ya van herdû şexsan dê ji hev cuda bin, anku ji aliyê hecim û teşeyî ve. Wek encam buhurka dengî ya herkesî cuda ye û eger em bi awayekî fîzîkî meseleyê binirxînin, her mirovek dangan bi awayekî cuda bi lêv dike. Ev jî tê wê wateyê ku milyon awayên fîzîkî yên cuda hene ji bo bilêvkirina peyveke besît wek *me*.⁵⁰

Dengnasi⁵¹

Li gel van milyon cudahiyên buhurka dengî jî, mirov bi xwe jî dê peyva **me** herdem û di her rewşê de bi heman awayî bi lêv neke. Cudahiyeyeke berbiçav diyar dibe gava ew miorv diqîre yan jî gava ku hîn nû ji xew şiyar bûbe yan jî bi bapêşê ketibe an herwiha serxweş ketbe û hewl bide ku qedeha şeşan ya martînî bixwaze yan jî çend rewş ji van bi hev re pêk werin. Piştî evqas cudahiyên muhtemel, gelo em çawa dikarin van rengên cuda yên peyva *me* wek forma [mi]⁵² fêm bikin lê ne wek forma [ni],

⁴⁸ Beşa berî vê ku li ser denganiyê bû û min wergera wê kiriye, eger tu bixwazî bixwînî, dikarîji vê girêdanê <http://dilyaramudi.blogspot.com.tr/2015/06/dengdani-di-zimane-ingilizi-de.html> bixwînî.

⁴⁹ Articulation (dengjenîn têgiheke ku ji nivîsa Newzad Hirorî ya bi lêkolînek li ser dengsaziya kurmanciyê: Nihênîyên befrê/berfê

⁵⁰ me: ez, min

⁵¹ Phonology

⁵² Ew peyvên di navbera [] de awayê bilêvkirinê diyar dikin ku di nivîsa danganî ya di girêdana jorê de bi berfirehî hatine ravekirin.

[si], [ma] yan [mo] yan jî, heta tiştêkî ji wan gişan bi temamî cudatir? Bersiva vê bi awayekî berfireh di lêkolîna dengnasyê de tê pey dakirin.

Dengnasî di bingehê xwe şayesandina pergala û şeweyên dengên axiftinê yê zimanî ye. Di rastiyê de, ew li ser wê ramanê disekine ya ku vedikole bê ka axiverên balix, bê ku hayên wan jê hebe, çî derbarê dirûvên dengên wî zimanî de dizanin. Ji ber vê rewşa teorîk jî, dengnasî bêtir ji awayê fîzîkî yê derxistina dengan, li ser dirûvê razber û hişmendî yê dengên zimanî disekine. Eger em bikarin mentiqekî ji çîroka Bob Belviso⁵³ ya komîk, li destpêkê, peyda bikin, teqez e bê ku hayê me jê hebe, em zanîna xwe ya dengnasyê bi kar tînin bê çawa zimanê ingilîzî vê şeweya nivîsînê ya nejrêzê bi kar tîne.

Dengnasî dîzayineke bingehîn û pêşnûmaya her şeweya dengêkî ye ku bi awayekî sabit tevahiya cudahiyan dengjenînê yê dengan di naverokên cuda de dinimîne. Gava em li ser dengê [t] di peyvên *tar, star, writer, butter* û *eighth* difikirin, em wan wek “yek tişt”î dihesibînin anku di rastiyê de em dibêjin ku di zimanê ingilîzî de ew dê bi heman awayî bê raberkirin. Lê di axiftina rast de, ev dengê [t] di bingehê de gelekî cuda ye, ji ber ku dibe ku her yek ji wan li gorî dengên di bi awayekî cuda bê bilêvkin. Lê dîsa jî ev dengjenînê cuda yê dengê [t] ji me re bi qasî cudahiya giştî ya di navbera dengê [t] û [k] yan [b] de ne girîng e, ji ber ku encamin watedar derdikevin gava em yekê ji wan di şûna ya di de bi kar bînin. Ev deng, bê ku mirov guh bidê bê ka kîjan buhurka dengî û ya kê hatiye bikaranîn bo gotina wan, dengên cuda û watedar in, ji ber ku ew in yê ku wateyên cuda didin peyvên *tar, car, far* û *bar*. Li gorî vê nerînê, em dikarin bibînin ku dengnasî bi pêşkêşkirina aqilî ya razber ya dengan ve têkilîdar e ta ku bikare wateya peyvên li ser bingehên dengên fîzîkî yê berra yê em dibêjin û dibihîzin, binase û têbigihê.

Fonem⁵⁴

Her yek ji van dengên zimanî yê watedar-cuda wek **Fonem** tên şayesandin. Gava em hînî bikaranîna nivîsînê elifbêyî dibin, ew bi xwe, em konseptê foneman bi kar tînin wek şeweya dengêkî sabit û tekane ku bi semboleke nivîsî tekane tê raberkirin. Di vê rewşê de, fonema /t/ wek dirûveke dengî ji

⁵³ Ew çîrok ku di destpêkê de hatiye nivîsîn

⁵⁴ Phoneme(ingilîzî)

bo hemû şêweyên cuda yên dengê [t] tê saloxandin. Bala xwe bidê ku xêza xwar⁵⁵ tê dayîn ji bo şayesandina fonema /t/ û kevanekên çarnîçikî wek di [t] tîn bikaranîn bo şayesandina her fonetîkekê.

Saloxetêke bingehîn ya foneman ew e ku peywirên wan dijber in. Em dizanin ku du fonem /f/ û /v/ di inglîzî de hene ji ber ew tekane bingehê dijber di navbera peyvên *fat* û *vat* yan *fine* û *vine* ⁵⁶de ne. Ev saloxeta dijber bingehê ceribandina kiryarî ye bo diyarkirina fonema heyî di inglîzî de. Eger em dengêkî bi dengêkî dî biguherînin û wate bê guhertin, naxwe herdû deng du fonemên cuda ne. Gava em li nivîsa berê binerin⁵⁷ û koma şêweyên dangan di inglîzî de binerin, em dê bigihên lîsteyêke bingehîn ya fonemên inglîzî yên dengdar, dengdêr û yên dudengî ku li wir hatine diyarkirin.

Polên surîştî⁵⁸

Têgehên teknîkî yên ku tîn bikaranîn di çêkirina van tabloyan de dikarin wek saloxetên foneman bîn hesabandin ku her fonemekê ji ya dî vavêr dike. Eger ew saloxet hebe, em nîşana (+) li kêleka wê dadihînin, ger tune be em (-) dadihînin. Lew /p/ dikare wisa bê şayesandin (-lerz, dulêvî+, sekinî+)⁵⁹ û /k/ jî (-lerz, +paşpidûyî, + sekinî)⁶⁰. Ji ber ku ev herdû deng hin taybetmendiyên hevpar dihewînin (herdû sekinî û bêlerz in) hin çar wek endamên **polâ surîştî** ya foneman tîn şayesandin. Dengên ku hin taybetmendiyên wan yên hevpar hene, bi giştî meyla wan heye ku ji aliyê dengnasî ve bi hin awayan wek hev tevbigerin. Fonemên ku taybetmendiyên wan yên hevpar tune ne, meyla wan heye ku bi awayekî cuda tevbigerin.

⁵⁵ slash

⁵⁶ fat: qelew,vat, den, fine: rind, vine: dêlî

⁵⁷ nivîsa denganiyê <http://dilyaramudi.blogspot.com.tr/2015/06/dengdani-di-zimane-ingilizi-de.html>

⁵⁸ Natural classes

⁵⁹ "seknî"ê ew²ku di derxistina wê de lêv pêçî bi temamî girtî ne û dûre tîn vekirin. Dulêvî, anku ev deng bi herdû lêvan tê derxistin, Lerz: anku lerizîn an nelerizîna perdeyên dengî ye

⁶⁰ paşpidûyî: anku bi gihandina zimanî bo paşiya pidûyan ev deng derdikeve.

Wek mînak /v/ xwedan taybetmendiyan (+lerz, +lêv-didanî, +xişok) lew nikare têkeve pola surîştî ya /p/ û /k/. Li gel ku hin sedemin din jî hene lê ev analîza taybetmendiyan dê bihêle ku em ji xwe bipirsin gelo çima peyvên bi /pl-/ û /kl-/ dest pê dikin, di inglîzî de mişe ne lê yên bi /vl-/ kêmpayda ne. Gelo dibe ku sedem ew be ku hin taybetmendî pêwîst in ta ku deng di destpêkê de berî /l/ peyda bibe? Eger em di nasîna û zanîna van taybetmendiyan bingehîn yên van kombînasyonan de bi ser kevin, wê çaxê em ê, ne tenê, bikarin pênasîneke dengnasî ya foneman çêkin lê em bikarin jî rêza pêkan ya foneman di zimanî de jî hîn bibin.

Fon û alofon⁶¹

Wek me got û ji ber ku fonem yekîneya razber yan jî dirûvê dengî ye (di mêjî de), gelek versyonên cuda yên dirûvên dengî hene ku bi awayekî nîzamî di axiftinê de tên hilberandin (di devî de). Em dikarin van versyonên cuda wek **fon** bi nav bikin. Fon yekeyên danganî ne ku di kevanekên çarnîçikî de tên nîşandan. Gava komeke fonan di destê me de be, ew bi xwe yek ji wan versyoneke fonemê ne. Em pêşgira “allo” dadihînin pêşiya “fon”ê ta ku wan wek alofonên heman fonemê destnîşan bikin.

Tablo 4.1

⁶¹ phone û allophone

Fonem	alofon	
	[t ^h]	(<i>tar</i>)
/t/	[r]	(<i>wri<u>t</u>er</i>)
	[ʔ]	(<i>bu<u>t</u>ter</i>)

Wek mînak, fonema /t/ dikare bi gelek awayên fîzîkî yê cuda bê bilêvkerin ku ew jî fon in. Dengê [t] di peyva *tar*⁶² de bi giştî, bi pifîneke xurttir ji ya di peyva *star* de tê bilêvkerin. Eger tu pişta destê xwe bidî pêşiya devê xwe gava tu peyva *tar* dibêjî û dûre ji bo peyva *star*⁶³ jî heman tiştî bikî, muhtemelen tu yê bi hin berjengên fîzîkî yê pifînê bihesî ku di dengê [t] yê li destpêka peyva *tar* cih digire lê li pêşiya peyva *star*ê nagire. Ev versyona pifdar⁶⁴ ji bo zelaliyê wek [t^h] tê nîşandan ku ew jî fonek e.

Di nivîsa berî vê de, me diyar kiribû ku dengê [t] di navbera dengdêran de, wek di peyva *writer*, dibe dengê tepok⁶⁵ ku em dikarin bi vê [r] wî desnîşan bikin û ew jî foneke din e.

Herwiha em peyva *butter*⁶⁶ dibînin, dengê sekinî qirikî peda dibe di bilêvkerina dengdarê navîn de, ku em dikarin bi [ʔ] binimînin, ku ew jî foneke dî ye. di bilêvkerina peyvek wek *eighth* (/eɪtθ/) bandora didanî ya dengê [θ] dibe sedema dengjenîna didanî ji dengê [t] yê re. Lê em dikarin bi awayekî deqîqtir bi vî awayî [t̚] desnîşan bikin. û ew jî bi xwe foneke dî ye. hîn gelek versyonên din jî yê vî dengî hene eger em bêtir lê hûr bibin. Ji ber ku em şêweyên cuda giştik endamê komekê ne wek di tabloya (tablo 4-1)ê de hatiye ravekirin.

⁶² tar: qetran,

⁶³ star: stêr, stêrk

⁶⁴ aspirated: aspiration

⁶⁵ ar: زنجري, en: falp, fa: زنجری

⁶⁶ nîvişk

Cudahiya giring ya di navbera fonem û alofonan de, ew e ku guhertina yekê bi ya dî dê bibe sedem ku wateyeke cuda derkeve (herwiha bilêvkirineke cuda jî) lê veguheztina alofonan dê tenê bibe sedem ji cudahiya bilêvkinê re(ku muhtemelen dê ew bilêvkin jî ne asayî be)

Cot û komikên mînîmal⁶⁷

Cudahiya fonemîk bi rêya cot an komikên peyvan di zimanekî de dikarin werin testkirin. Wek mînak herdû peyvên wek *pat* û *bat* ku di şêweyê de wek hev in û tenê cudahiya wan di yek fonemê de ye ku ew jî di heman cihê de ye, ev herdû peyv wek cotê mînîmal şayesandin. Eger em bi awayekî zelaltir bişayêsin ev cotekî mînîmal yê dengnasiya inglîzî ye, (ji ber wek mînak di zimanê erebî de, herdû dengên /p/ û /b/ di erebî de tune ne.) Çend mînakên dî ji bo cotên mînîmal yên zimanê inglîzî *fan-van*, *bet-bat*, *site,side* in. Ev mînakên wisa hatin bikaranîn ji fêrkirin û testkirina inglîzî ji mirovên ku dixwazin fêrî inglîzî wek zimanê duyem bibin, ta ku bikarin dijberî û cudahiya van cotên mînîmal fêr bikin.

Gava ku komikek ji peyvan bi rêya guhertina yek fonemê ji hev cuda bibin (bi pirranî di heman cihê de) wê çaxê em komika mînîmal bi dest dixin. Wek mînak ji komikeke mînîmal ya zimanê inglîzî ku li ser dengdêran hatiye avakirin *feat*, *fit*, *fat*, *fate*, *fought*, *foot*,⁶⁸ û herwiha komikeke dî ku li ser cudahiya fonemeke dengdar hatibe avakirin wek *big*, *pig*, *rig*, *fig*, *dig*, *wig*.⁶⁹

Fonotaktîk⁷⁰

Ev şêweyên rahênanan ku komikên mînîmal dihewînin, rê dide me ku em bibînin ku di zimanekî de dirûveke diyar ya kombînasyonên dangan heye û ziman encex bi wê şêweyê rê bide kombînasyonan. Ew lîsteya ku berî niha me nivîs, peyvên *lig* û *vig* nahewîne. Li gorî ferhena min jî, ev herdû peyv ne

⁶⁷ en: minimal pair and sets, ar: ازدواج لفظي

⁶⁸ wate bi rêzê: serkeftin, guncav, duhn, şer, pê

⁶⁹ wate bi rêzê: mezin, beraz, techîzat, hejîr, koncal, perûk

⁷⁰ phonotactics

ingilîzî ne, lê dibe ku wek peyvî muhtemel yê ingilîzî bê dîtin. Zanîna me ya dengnasî dê bihêle ku em van herdû peyvî wek şeweyên qebûlbar bihesibînin û dibe ku rojekê ji rojan bihênn bikaranîn. Dibe, wek nimûne, wek kurtepeyv ⁷¹dest pê bike, wek (*I think Bubba is one very ignorant guy*⁷². *Yeah, he's a big vig!*). Heta wê çaxê dê wek valahiyê ferhengî⁷³ di nav peyvên ingilîzî de bimîne.

Lê dîsa jî ne tesaduf e ku peyvî wek [fsɪg] an [rɪŋ] di ingilîzî tune ne û ihtimal tune jî ku çêbibin. Ji ber ku bê ku bi hinek rêz an jî bendên fonemên ingilîzî ve girêdayî bimînin hatine sazîkirin. Ev rê û best wek fonotaktîk tînin binavkirin (anku rêzsazîya qebûlbar ya dengî) û wisa diyar e ku beşekî zanîna dengnasî ya herkesî ye. Ji ber ku ev bend li ser asteke ji yek dengî an jî yek fonemê firehtir dixebite lew divê divê em biçin ser pêkhatiyên yekeyên zimannasîyê yê hinekî mezintir in û jê re kite tê gotin.

Kite⁷⁴

Kiteyêk divê dengdêrekî an jî wekdengdêr ⁷⁵*bihewîne, dudeng⁷⁶. Belavtirîn şeweyê kiteyan, ew kite ne yê ku berî dengdêrî (V⁷⁷) dengdarekî (C⁷⁸) bihewîne û bi giştî wek CV tê diyarkirin. Pirtikên bingehîn yê kiteyê **serik** ⁷⁹e (dengdarek an jî ji yekî zêdetir) ku li dû wê **serwa**⁸⁰ tê. Serwa ji

⁷¹ abbreviation

⁷² Ez dibêjim qey Bubba zilamekî gelekî cahil e,

⁷³ lexical gap

⁷⁴ Syllable

⁷⁵ vowel-like: anku ew dengdarê ku hin saloxetên dengdêran dihewîne

⁷⁶ diphtong

⁷⁷ V tîpa destpêka peyva “vowel” ya ingilîzî tê ku wateya “dengdêr” dide

⁷⁸ C tîpa destpêka peyva “consonant” ya ingilîzî ye ku wateya wê dengdar e.


⁷⁹ Onset

⁸⁰ rhyme: peyva serwa, min ji soranî girîye û bi giştî peyva rhyme wateya qafiyê dide ku di soranî de jî serwa ye.

dengdêrekî pêk tê ku wek **dendik**⁸¹ê dihesibe û li dû dendikê **dûvik**⁸²tê û ew jî ji dengdarê(n) ku li dû dendikê tê(n) re tê gotin.

Kiteyên wek *me, to* yan *no* ku ji serik û dendikê pêk tê lê dûvikya wê tune. Ev cûre jî wek **kîteya vekirî**⁸³ tê binavkirin lê gava ku dûvik hebe wek di peyvên *up, cup, at* yan *hat* **kîteya girtî** tê gotin. pêkhatayên bingehîn yên cûreyên kîteyên peyvên inglîzî yên wek *green* (CCVC), *eggs* (VCC), *and* (VCC), *ham* (CVC), *I* (V), *do* (CV), *not* (CVC), *like* (CVC), *them* (CVC), *Sam* (CVC), *am* (VC) wek di şekilê

4.1ê de
hatiye
diyarkirin
şekil: 4.1⁸⁴



Kombûna dengdaran⁸⁵

⁸¹ Nucleus: ku wateya dendikê dide.

⁸² coda

⁸³ open syllable

⁸⁴ (+1) anku dibe ku ew dengdar jî yekî zêdetir bin.

⁸⁵ Consonants cluster

Dibe ku him serik û him jî dûvik ji dengdarekî zêdetir pêk werin ku wek **kombûna dengdaran** tê nasîn. Kombînasyona /st/ kombûneke dengdaran e ku wek serika peyva *stop* û dûvika peyva *post* tê bikaranîn. Gelek serikên CC hene ku fonotaktîka zimanê inglîzî rê dide hebûna wan wek di peyvên *black, bread, trick, twin, flat* û *throw*. Bala xwe bidê ku dengên jenok⁸⁶ yên (/l/, /r/) û yê bandevî⁸⁷ di cihê duyem de likar e.

Ya rast ew e ku kombûnin dengdaran yê firehtir jî di inglîzî de hene wek *stress* û *splat* ku ji sê dengdaran li serikê pêk tê (CCC). Ew bi xwe ne gelekî zehmet e ku fonotaktîka van detpêkan bê şayesandin. Dengdarê pêşî divê herdem /s/ be û divê yek ji van dengên bêlerz⁸⁸ yê sekinî⁸⁹ (/p/, /t/, /k/) û dûre yek ji van dengên jenok û bandevî (/l/, /r/, /w/) were. Tu dikarî binerî bê bi kombînasyonê peyvên *splash, spring, strong, scream and square* digunce yan na. Gelo ev şayesandin li kîteya duduyan ya bilêvkirina *exclaim* jî digunce? gelo ev /ek-skleɪm/ çawa ye? Ji bîr neke ku me qala serikên kîteyan kir, ne qala destpêka peyvê kiribû.

Bandorên lihevanî⁹⁰

Tiştêkî gelekî kêmpayda ye ku di zimanekî de kombûnên dengdaran ewqasî mezin bibin. Ya rast di piraniya zimanan de (mînak: japonî) bi piranî wek kîteya CVê peyda dibin. Herwiha belkî bal kişandibe ku di inglîzî de jî ku kombûnên dengdaran yê mezin bi awayekî jixweber tînen kêmkirin an biçûkkirin bi taybetî eger di nava peyvê de be. Ev jî diyardeyeke ku di bin navê **bandorên lihevanî** tînen nîqaşkirin.

Me heta niha kîte û peyv wisa şayesandin wek ku di axiftinê de bi giştî bi baldarî û bi haydarî tînen bilêvkirin anku wek ku her yek ji me hêdî hêdî her peyvê bi lêv dike. Axiftin bi giştî ne tiştêkî wisa

⁸⁶ liquid

⁸⁷ glide

⁸⁸ voiced

⁸⁹ stop

⁹⁰ Coarticulation effects

ye. Bi piranî axiftinên me ji xwe ber û zû ne û pêwîst e ku em ji dengê bi awayekî lezgîn biçin dengên din, ew pêvajoya ku dengê di heman demê de dike wek dengê din, wek lihevanîne tê binavkirin. Herwiha du bandorên lihevanîne hene ku wek **bişaftin** û **elision** tên binavkirin.

Bişaftin⁹¹

Bişaftin ew rewş e ya ku du birên dengî dikevin rêzekê û hinek saloxet yan dirûvê dengê ji aliyê dengê din tên birin an “kopîkirin”. Gava em di derbarê awayê fîzîkî yê derxistina dangan de bifikirin, em tê digihên ku ew pêvajoya asayî bi awayekî besît pêk tê ji ber ku lezgîn, çisttir û hêsantir e. Li ser peyva *have* /hæv/ bi xwe bifikire bê tu çawa wê bi tena serê wê bi lêv dikî û bifikire bê tu wê çawa her rojê hevoka *I have to go*⁹² bi lêv dikî. Di vê hevokê de, mirov bêtir dixwaze berî /t/ya *toyê* ku versyoneke bêlerz ji dengê berî wê re bi lêv bike û ew jî dihêle ku ew deng ji /v/yê zêdetir wek /f/yê derkeve. Anku em di vê hevokê de [hæftə]ê dibêjin û heta dibe ku tu bi awayekî ne fermî wek “hafta,” di zimanê nivîskî de jî bibînî ta ku destnîşan bike bê bişafin ji dengê bilerz bo bêlerz çawa tê kirin.

Bêvilandin⁹³

Carinan dengdêr jî tên bişaftin. Li aliyekî din, em dengên [ɪ] û [æ] bi lêv dikin bê ti bandoreke bêvilî. Lê dîsa jî gava ku em peyvên *pin* û *pan* di axiftina rojane de bi lêv dikin dê hêsantir be ku mirov ji pêşî de wî dengdarî bike bêvilî*. Ev pêvajo wek **bêvilandin (nasalization)***ê tê binavkirin û bi vê nîşanê (~) tê nimandin û jê re (tilde*) tê gotin û li ser dengdêrî tê nivîsîn. Dengdêr di van peyvan de eger bi awayekî deqîqtir werin nivîsîn dê [ɪ] û [æ]* bin . Ev pêvajoya dengnasî taybetmendiyeke asayî ya bilêvkirina inglîzî e. Tiştekî gelekî belav e ku ji aliyê dengnasiyê ve rêbaz wisa dikare bê nivîsîn; “ çî dengdêrê ku berî dengdarekî bêvilî* were, dikeve vê rewşê”

⁹¹ assimilation:*

⁹² Divê ez biçim

⁹³ Nasalization

Ev şeweya bişaftinê bi awayekî cuda li gorî naverokên cuda diguhere. Peyva *can* bi serê xwe wek [kæn] tê bilêvkirin lê belê gava di kompeyva *I can go*⁹⁴ de bandora dengê pidûyî* [g] yê peyva *go* dê bihêle dengê pêşiyê yê pidûyî wek ji dengê [n] yê (paşpidûyî bêvilî*) bêtir wek [ŋ] (pidûyî bêvilî*) derkeve. Anku şeweya herî belav ji bilêvkirina komepeyvê [aɪkəŋɡoʊ] e. Bala xwe bidê ku peyva dipeyva *can* de jî [æ] dibe Schwa *[ə] di komepeyvê de. Gava ku peyv bi baldarî tên bilêvkirin dengdêr tê şidandin* lê di axiftina rojane û ya asayî, dibe ku dengdêr nema bişide û bi awayekî suriştî bibe schwa. Wek mînak, em peyva *and* bi tenê wek [ænd] bi lêv dikin lê gava di komepeyvekê wek *you and me* de were em bi giştî wê wek [ən] bi lêv dikin û komepeyv giş wek [ju ənmi] tê bilêvkirin.

Jêxistin⁹⁵

di mînaka dawî de, ku em tê de bilêvkirina asayî ya *you and me* rave dikin, em dibînin ku dengê [d] yê peyva *and* nehatiye nivîsîn. Ew jî ji ber wê ye ku ew deng di vê komepeyvê de nayê bilêvkirin. Di wê rewşa ku [n]ya bêvilî* berî wê tê û [m]ya bêvilî jî li dû wê tê, em bi awayekî asayî enerjîya xwe li ser dengê [d] xerç nakin. Ev ne tembelî ye lê çîstî ye. Herwiha dengê [d] di axiftina rojane ya peyva *friendship* [frɛnʃɪp]ê de peyda nabe. Ev rewşa ku tê de dengê [d] ku di axiftina bi baldarî û serbixwe de heye lê di axiftina rojane û lezgîn de wenda dibe, wek **xistinê*** tê binavkirin. Di komkirinê dengdaran de, bi taybetî di /t/ya ku di rewşa dûvik de ye, ev rewş gelekî diqewime wek bilêvkirina [æspɛks] ji bp peyva *aspects* an jî bilêvkirina [himəsbi] di kompeyva *he must be*. Helbet bi baldarî û bilêvkirina hêdî em dikarin em dikarin hemû beşên komepeyva *we asked him* lê di pêvajoya xisitîn*ê ya /k/yê de, gava axiftin bi awayekî jixweber û lezgîn de be, dê wek e [wiæstəm]. Dengdêr jî wenda dibin wek di [ɛvri];*every*, [ɪntrɪst] ; *interest*, [kæbnət] ;*cabinet*, [kæmrə] ;*camera*, [prɪznər] ;*prisoner* û [spəʊz] ; *suppose*.

Axiftina asayî⁹⁶

⁹⁴ Dikarim biçim


⁹⁵ Elision

⁹⁶ Normal speech

Herdu pêvajoyên bişaftin û xistinê di axiftina herkesî ya asayî de çêdibe û nabe wek bêbaldarî an jî tembeliyê bîn hesabandin. Ya rastî hewldana xwedûrxistina ji bişaftin û xistinê dê bibe sedem ku axiftineke gelekî çêkirî û nejidil derkeve holê. Ev xala tûjandinê ya pêvajoya dengnasî ne tiştekî wisa ye ku em rêbazên rast-bilêvkirinê deynin lê hewldan e ta ku em bikarin şêwe û asayitiya bilêvkirina zimanî nîşan bidin.

Nasandina kitêbekê

RÊZIMANA KURDIYA BAŞÛRÎ



Kitêba Ismail Kemendar Fettah *Les Dialectes Kurdes Méridionaux* (devokên kurdiya başûrî) bi zêdeyî 800 rûpelên bi fontên hûrik û himbiz rêzimana van devokan bi zimanê fransî dide nasîn. Mebest ji kurdiya başûrî devokên feylî, kelhurî û kirmaşanî û yê wê wan in.

Ev kitêb berfirehtirîn rêzimana kurdî ye ku bi zimanekî biyanî hatiye nivîsîn. Nivîser hewl dide di vê kitêbê de bi awayekî sîstematîk dengnasî (fonolojî), teşenasî (morfolojî), hevoknasî (sintaks), û peyvsaziya (word

formation) van devokan pêşkêş bike. Bi dirêjahiya xwe û di piralîtiya xwe ya pêşkêşkirina nimûneyan ji devokên cuda û berhevdan û miqayesekirina wan de ev kitêb di zimannasiya kurdî de bêmimûne û bêhevta

ye. Nivîser herwiha nimûneyan ji devokên cuda li ser bingehêkî wekhevîyê dide; nabêje ku ev rast e û ev ne rast e lê devokan wisa diyar dike wek ku hene.

Kitêb bi nasandina devokên kurdiya başûrî û navên wê dest pê dike û hewl dide ku gelek şaşiyên serdest rast bike. Bo nimûne, gelek kes texmîn dikin ku ev devok jî soranî, goranî yan jî lorî ne lê ne rast e. Di heman demê de hewl dide bi çend rûpelan isbat bike ku lorî, zazakî û goranî jî kurdî ne lê ti tiştêkî berê negotî di vê mijarê de pêşkêş nake. Madem ku mijar ne zimanê kurdî ye (di pratîkê de hîç behsa herdu zaravayên serekî anku kurmançî û soranî nake), di meseleya goranî-zazakî de ji babetê kitêbê dûr dikeve.

Di meseleya alfabeyê de wî jî wek hinên din bi ya xwe kiriye. Dibêje ku ne alîgirê vê yan wê alfabeyê ye lê di nivîsîna xwe de alfabeyêke ji têkilkirina kurdî (latînî), tirkî (ı, ü), spanî (ñ) û hin zimanên rojhilata Ewropayê (š, č) ava kiriye. Di dengnasiyê de hin xişte û tabloyên hêja pêşkêş dike û guherîna dengên li gor devokan û di peyvan de li gor cihê wan dide. Lê gelek caran fonem û alofonan ji hev cuda nake.

Di teşenasî, hevoknasî û peyvsaziyê de biserketîtir e û di van mijaran de heta gelek tiştên kêmbehskirî jî diyar dike, xaseten di peyvsaziyê de.

Kitêb ravekirineke bi temamî hevdemî (sinkronîk) ye, ne dîrokî (diyakronîk) ye anku ew behsa cudahiyên navbera devokên başûrî dike lê behsa guherînên tarîxî di wan devokan de nake. Kitêb herwiha ti berhevdanê di navbera kurdiya başûrî û lehceyên din yê serekî yê kurdî de nake. Bo nimûne, piraniya kurdan - heta zimannasan jî - nizanin ka çi cudahî di navbera devokên başûrî û soranî de hene. Mixabin kitêb qet bersiva van pirsan nade. (Cudahiyên serekî li gel soranî: di devokên başûrî de ergatîvî peyda nabe, peyvrêzî ji hev cuda ye - xaseten cihê cînavên pêvekîrî - û hin deng ji hev cuda ne - hebûna Ü di başûrî de û herwiha W li cihê B ya soranî û kurmançî û hwd.)

Di kitêbê de herwiha ti ferhengok û indeks jî nehatine dan. Ev dikare wek kêmasiyeke mezin bê dîtin.

Li dawîya kitêbê çîrokek hatiye danîn û nivîser bi xwe yan bi alîkariya kesên din ev çîrok hevok bi hevok li devokên cuda yê başûrî wergerandiye. Bo berhevdanê ev hêsan e lê li gor şertên karê meydanî yê zimannasî ev ne berhemên eslî û heqîqî ne û mirov nikare bawer bike ku ev devok bi siriştî wiha ne.

Dawîya dawîn kêşeya serekî ya kitêbê ne naveroka wê lê zimanê wê ye. Kitêb bi fransî hatiye nivîsîn lê piraniya kurdan nikarin bi vî zimanî bixwînin. Eger ew bi kurdî, inglîzî, erebî yan farisî hatiba nivîsîn, sûdwegirtina ji wê dê pirr bûya. Xwezî nivîser vê kitêbê li yek ji van zimanan jî wergerîne.

Kovara Kanîzar

Gramerê Soranî ra Çend Xalê Muhîmî yê Bi Dimilî

Hasan Aslan

Na xebate, xebata Mamosta Husein Muhammedî ya ke bi nameyê “Kurterêzimana soranî bi kurmancî” ra xercê çend leteyan ra bi îzahatanê xo ya açarîyaye dimilî ser û seba dimilî adapte bî. Heme îzahî û nimûneyê soranî xebata Husein Muhammedî ra gêrîyayî labelê nimûneyê dimilî û îzahê seba dimilî hetê mi ra ameyî zêdekerdiş. Seba xebata Mamosta Husein Muhammedî nê lînkê ser o bitiknên: <https://zimannas.wordpress.com/2015/07/09/rezimana-sorani-bi-kurmanci/>

1. Name

Cinsîyet

Soranî de cinsîyet (nerî û makî) çinî yo. Wexto ke dimilî de nameyê yewhûmarî yê makî bi îlaweyê “-a” (îzafeya nameyan û sifetan de) û yê nerî bi “-ê” (îzafeya nameyan de) û bi “-o” (îzafeya sifetan de) bi çekuya peyên a girêdîyenê, soranî de her di bi “-î” yê.

dimilî: keynaya girde/pîle, lajê Azadî, lajo baş

soranî: kiçî gewre, kurrî Azad, kurrî baş

Dimilî de eger herfêdo vengin (a, e, ê, i, î, o, u, û) peynîya çeku de estbo, “-y”yê pagirêdayîşî îlawe beno. Soranî de o “y” cayê “î”yê îlaweyî gêno:

dimilî: bira-y-o qij, rojname-y-o rojane

soranî: bira-y biçûk, rojname-y rojane

Dimilî de eger herfa “î” peynîya çeku de bo û îlaweyê “-y” îlawe bo, wexta “î” sey xo maneno: azadî > azadîya Kurdistanî. Elîfbêya kurdî-erebî de “î” çinî yo coka yan “î” sey xo maneno û “y” îlaweyê ci beno (azadîy Kurdistan) yan zî “y” îlawe nêbeno (azadî Kurdistan). La soranîya bi elîfbêya kurdî-latînî de “î” beno “i” û “y” zî îlaweyê ci beno: “azadiy Kurdistan”

Yewhûmarîya nedîyare/neeşkera

Formo yewhûmaro nedîyar soranî de bi “-êk, -yêk” yan zî bi “-ek, -yek” tayîn beno.

dimilî: laj-ê(n)/laj-êk, bira-yê(n)/bira-yêk

soranî: kur-êk/law-ek, bira-yêk/bira-yek

O formo nedîyar bi îlaweyê “-î” şeno bi çekuya peynîya xo ya girêdîyo.

soranî: kur-êk-î baş, rojnameyêkî kurdî

dimilî: lajêdo baş/lajêko baş, rojnameyêdo kurdkî/rojnameyêko kurdkî

Formo dîyar/eşkera

Soranî de formêdo dîyarkerde zî esto ke bi hetkarîya “-eke, -ke” virazîyeno. Hemverê ci dimilî (kurmancî, farisî û tirkî) de çinî yo la tayn ziwananê binan de peyda beno: erebî “el-“, îngilizî “the”, fransî “le, la”, almanî “der, das, die”, swêdî “-en, -et”. No form wexta yeno xebitnayîş, wexto ke behsê ê kesî yan ê çiyî ameyo kerdiş yan bi pêroyî zanîyeno ka meqsed kam yan çiçi yo. O şeno bi dimilî sey “o/a, filan” açarîyo:

soranî: Piyaweke baş e. Rojnameyeke be kurdî ye.

dimilî: (O/filan) mêrdek baş o. (O/filan) rojname bi kurdî yo.

O form zî bi îlaweyê “-y” bi çekuya dimayên a girêdîyeno:

soranî: piyawekey baş, rojnamekey be kurdî

dimilî: (o/filan) mêrdeko baş, (o/filan) rojnameyo bi kurdî

Gegane zî no form şeno bi “ê/êyê/aya” bêro dimilîkerdiş:

soranî: Dû kes bûn, erebêk û kurdêk. Min kurdeke denasim.

dimilî: Di kesî bîyî, erebê û kurdê. Ez ê/êyê kurdî nas kena.

Zafhûmarîya nê formî dîyarî “-ekan, -kan” a:

soranî: jin-ekan, bira-kan

dimilî: (ê/filan) cinîyî, (ê/filan) birayî

O zî bi îlaweyê “î” bi çekuyanê dimayênan a girêdîyeno:

soranî: jin-ekan-î baş, bira-kan-î biçûk

dimilî: (ê/filan) cinîyê başî, (ê/filan) birayê qijî

Zafhûmarîya pêroyî

Formo pêroyî yo zafhûmar bi “-an, -yan”:

soranî: Ew kitêb-an dexwêne. Min rojname-yan dexwênim. (Kitabê/rojnameyê ke wanîyenê nêameyê eşkerakerdiş)

dimilî: O/A kitabên waneno/a. Ez rojnameyan wanena.

bi îlaweyê “-î” bi çekuyanê dimayênan a girêdîyeno:

soranî: kitêb-an-î xoş, rojname-yan-î kurdî

dimilî: kitabê weşî, rojnameyê kurdî

2. Sifetî

Soranî de, sey dimilî û ziwananê bînan de zî bi pêroyî, sifetî hîrê rewşanê pêveronayîşî de yê:dereceya sadî (sadeye), dereceya pêveronayîşî, dereceya serdestî.

Dereceya sadî (sadeye)

Soranî de dereceya sadî de sifet bi hîç awa ya nênamîyeno:

- jinêkî baş (cinîyêda başe), mêrdêkî baş (mêrdekêdo baş)
- jinî baş (cinîya başe), mêrdî baş (mêrdeko baş)
- jinekey baş ([filan] cinîya başe), mêrdekey baş ([filan] mêrdeko baş)
- jinekanî baş (cinîyê başî), mêrdekanî baş (mêrdekê başî)

Dereceya pêveronayîşî

Bi dereceya pêveronayîşî merdim taybetmendîyanê di yan vêşêrî kesan yan çîyan nano pêvero. Seba dereceya pêveronayîşî îlaweyê “-tir” sifet rê zêdîyeno:

- kitêbî baş-tir (kitabo başêr)
- lawî biçûk-tir (lajo qijêr)

Dimilî de pêveronayîş bi hetkarîya peydatê “ra”, soranî de bi veredatê “le” yeno kerdiş:

- Em kitêbe le ew kitêbe baştir e? (No kitab o kitab ra başêr o?)
- To le min gewretir ît? (Ti mi ra pîlêr î/a?)

Dereceya serdestî

Bi dereceya serdestî yeno eşkerakerdiş ke taybetmendîyêda kesê yan çîyê a taybetmendîya heme kesan yan çîyanê bînan ra başêr/serdestêr a. Soranî de a, bi îlaweyê “-tirîn” ê peynîya sifetî ya yena awankerdiş. Dimilî de bi no formul a virazîyena: “tewr + sifet dereceya sadî de” yan zî bi formulê “heminan ra + sifet dereceya pêveronayîşî de”.

- baştirîn kitêb (kitabo tewr baş, kitabo heminan ra başêr)

3. Edatî

Soranî de hîrê edatê serekeyî estê: be, le û bo. Nameyî bi nê edatan a nênamîyenê. La hem zemîrê bi manaya zemîranê dimilî yê sade/nenamiteyan û hem zî zemîrê pakerdeyî yê bi manaya zemîranê dimilî yê oblîk/namiteyan şenê bi edatan a bêrê xebitnayîş:

- le Kurdistan (Kurdistan de)
- bo min yan zî bo-m (seba mi, qandê mi, mi rê)

“Be” sey “bi/pê”yê dimilî yo⁹⁷: “be kurdî” (bi kurdî), “be dest” (bi dest/destan)

“Le” eke tena bo manaya “...de” yê dimilî dano: “le Kurdistan” (Kurdistan de), “le mall” (keye de). O hem zî çekuyanê sey “le ser, le jêr, le jor, le nizîkî ..., le dûrî ..., le dewrî ...” yeno xebitnayîş.

⁹⁷ Bitaybetî dimilîya Dêrsimî de formê sey “ebe, ebi, be” zî estê.

Soranî de hemverê “ra”ya dimilî xo serî çinî ya. La soranî de a bi hetkarîya edatê “le” û peydatê “-(e)we” virazîyena: “Le mallewe hatim.” (Ez keye ra ameya).

Peydatê “de” yê dimilî soranî de sey “le ...da” esto: “le kitêbêk da” (kitabê de, kitabêk de, yew kitab de)

“Bo” hem manaya “seba, qandê” yê dimilî dano hem zî manaya “ci rê, ... rê”: “Bo azadiy Kurdistan” (seba azadiya Kurdistanî). “Diyariyêk bo Jiyan bikirre!” (Dîyarîyêk Jiyan rê biherîne!)

Soranî de wexto ke edatî bi zemîran a yene xebitnayîş:

- pê (pê, bi ey/aye)
- lê (tede, piro, (a) ci)⁹⁸
- lê ... -(e)we (ci ra, ey ra, aye ra)
- bo (seba, qandê, ci rê, ey rê, aye rê)

4. Zemîrî

Zemîrê kesî

Dimilî de di tewirî zemîrê xoserî estê:

nenamite/sade: ez, ti, o/a, ma, şîma, ê

namite/oblîk: mi, to, ey/aye, ma, şîma, înan

Zemîrê kesî yê xoserî

Soranî de tena komêda zemîranê xoseran esta. Zahîren ê zaf manenê zemîranê dimilî yê namiteyan/oblîkan la hetê mana û xebitnayîşî ra ê hemverê zemîranê dimilî yê nenamiteyan/sadeyan ê:

min (ez), to (ti), ew (o/a), ême (ma), êwe (şîma), ewan (ê)

Nimûne:

- Min kurd im. (Ez kurd a.)
- To denûsît. (Ti nusenî/a)
- Ew naka. (O nêkeno/A nêkena)
- Ême dên. (Ma yenê. Yan: ma do bêrê)
- Êwe çî dellên. (Şîma se vanê.)

⁹⁸ Formê “lê” yê soranî (hem “li” yê kurmançî zî) dimilî de hemverê yewî ra vêşêrî forman o.

- Ewan kurd nîn. (Ê kurdî nîyê.)

Zemîrê kesî yê pakerdeyî

Bi erk û manaya zemîranê dimilî yê namiteyan/oblîkan, soranî de zemîrê pakerdeyî/padusnayeyî (cênawî likaw) yenê xebitnayîş:

-(i)m (mi), -(i)t (to), -î/-y (ey yan aye), -man (ma), -tan (şima), -yan (înan)

Nimûne:

- wut-im (mi va), rojname-ke-m (rojnameyê mi)
- wut-it (to va), rojname-ke-t (rojnameyê to)
- wut-î (ey/ayê va), rojname-ke-y (rojnameyê ey/ayê)
- wut-man (ma va), rojname-ke-man (rojnameyê ma)
- wut-tan (şima va), rojname-ke-tan (rojnameyê şima)
- wut-yan (înan va), rojname-ke-yan (rojnameyê înan)

- min de-t-bînim (ez to vînena), na-t-bînim (ez to nêvînena)
- de-m-bîni (ti mi vînenî/a), na-m-bîni (ti mi nêvînenî/a)
- de-y-bînim (ez ey/ayê vînena), na-y-bînim (ez ey/ayê nêvînena)
- ew de-man-bîni (o/a ma vînenî/a), ew na-man-bîni (o/a ma nêvînenî/a)
- de-tan-bînim (ez şima vînena), na-tan-bînim (ez şima nêvînenî/a)
- de-yan-bîni (ti înan vînenî/a), na-yan-bîni (ti înan nêvînenî/a)

- min-î birdim (ey/ayê ez berda), min-î nebirdim (ey/ayê ez nêberda)
- min-yan hênâm (înan ez arda), min-yan nehênâm (înan ez nêarda)

Seke nimûneyanê ma ra zî eşkera bena, nê zemîrê pakerdeyî şenê hem bi nameyan, hem bi karan û hem zî bi zemîranê xoseran a bidusîyê.

Zemîrê Nîşandayîşî

Zemîrê nîşandayîşî yê nenamiteyî/sadeyî dimilî de “o” (yewhûmar, nerî, dûrî), “a” (yewhûmar, makî, dûrî), “ê” (zafhûmar, dûrî), “no” (yewhûmar, nerî, nezdî), “na” (yewhûmar, makî, nezdî), “nê” (zafhûmar, nezdî) yê⁹⁹. Zemîrê nîşandayîşî yê namiteyî/oblîkî zî “ey” (yewhûmar, nerî, dûrî), “ayê” (yewhûmar, makî, dûrî), “înan” (zafhûmar, dûrî) û “ney” (yewhûmar, nerî, nezdî), “naye” (yewhûmar, makî, nezdî), “nînan” (zafhûmar, nezdî) ê.

Soranî de zemîrê nîşandayîşî nê yê:

- em (nezdî)

⁹⁹ Seba (no, na, nê) formê (eno, ena, enê) zî estê.

- ew (dûrî)

Soranî de zemîrê nîşandayîşî winî tesîr nameyê dimayênî rê kenê ke yewhûmarî de “-e” û zafhûmarî de zî “-ane” îlaweyê nameyi beno:

- Em kitêb-e baş e. (No kitab baş o.)
- Ew kitêb-e baş e. (O kitab baş o.)
- Em kitêb-ane baş in. (Nê kitabî baş ê.)

Sey nameyan zî, soranî de zemîrê nîşandayîşî rewşa kerdeyî/objeyi de zî nênamîyenê:

- Em kitêb-e bixwêne. (Nê kitabî biwane.)
- Ew kes-e denasît? (Ti ê kesî nas kenî/a?)
- Em kitêb-ane naxwênim. (Ez nê kitaban nêwanena.)
- Ew kes-ane nanasît? (Ti ê kesan nas nêkenî/a?)

Eger zemîrî bê nameyan bêrê xebitnayîş, wexta “-e” yan “-ane” bi zemîrî bi xo ya girêdîyenê:

- Em-e baş e. (No baş o.)
- Ew-e baştir e. (O başêr o.)
- Em-ane baş in. (Nê baş ê.)
- Ew-ane baştir in. (Ê başêr ê.)

Zemîrê persayîşî

Soranî de zemîrê persayîşî yê bingehênî nê yê:

- çî / çi (çi, çiçî, se)
- kê (kam, kamî/kê)
- çon (senî, senîn)
- çend (çend)
- key (key)
- kwa (kuwa, kotî, ka)

Nimûne:

- Çî baş e? (Çi/Çiçî baş o?)
- Çî-t kird? (To se kerd?)
- Ew kê ye? (O/A kam o/a?)
- To kê denasît? (Ti kamî/kê nas kenî/a?)
- Eme pê-t çon e? (No/Na bi to ya senîn o/a?)
- Çon hatît? (Ti senî ameyî/a?)

Zemîrê “xo”

Zemîrê “xo” dimilî de nênamîyeno. Soranî de o bi zemîranê pakerdeyan a yeno xebitnayîş:

- (min be) xo-m: (ez bi xo; mi bi xo)
- (to be) xo-t: (ti bi xo; to bi xo)
- (ew be) xo-y: (o/a bi xo; ey/ayê bi xo)
- (ême be) xo-man: (ma bi xo; ma bi xo)
- (êwe be) xo-tan: (şîma bi xo; şîma bi xo)
- (ewan be) xo-yan: (ê bi xo; înan bi xo)

Nimûne:

- Be xo-m hatim. (Ez bi xo ameya.)
- Xo-t binase! (Xo nas bike!)
- (Be) xo-y wut. (Ey/Ayê bi xo va.)
- Ba xo-man baştir binasîn. (Wa ma xo başêr nas bikerê.)
- Xo-tan zehmet meden. (Şîma xo zehmet medê. Şîma zehmetî meancê.)
- Be xo-yan baştir amade kirdûwe. (Înan xo başêr amade/hazir kerdo.)

5. Kar

DEMO NIKAYIN Û AMEYOX

Soranî de demo nikayin û ameyox eynî yê, bi vatişêko bîn demo nikayin rolê deme ameyoxî zî gêno:

Soranî: Min dêm.

Dimilî: Ez yena yan zî Ez do bêra.

Demo nikayin bi pêroyî bi no formul a virazîyeno:

de-/e- + rîçe/kokê karî yê deme nikayinî + îlaweyê kesî

Fekê Silêmanî de verîlaweyê demî “e-“ (min e-zan-im) yo la zaf fekanê bînan de “de-“ yo (min de-zan-im).

ÎLAWEYÊ KESÎ

Îlaweyê kesî bi pêroyî nê yê:

- min -(i)m (dimilî: ez -(y)a)
- to -ît/-yt (dimilî: ti -(y)î / ti -(y)a)
- ew -ê/-êt/-t/-a/-at* (dimilî: -o (nerî), -a (makî))
- ême -în/-yn (dimilî: ma -(y)ê)
- êwe -(i)n (dimilî: şîma -(y)ê)
- ewan -(i)n (dimilî: ê -(y)ê)

Nimûne:

- min de-bîn-im (ez vînena), min de-llê-m (ez vana)
- to de-bîn-î (ti vînenî/a), to de-llê-yt (ti vanî/a)
- ew de-bîn-ê/de-bîn-êt (o/a vîneno/a), ew de-llê/de-llê-t (o/a vano/a)
- ême de-bîn-în (ma vînenê), ême de-llê-yn (ma vanê)
- êwe de-bîn-in (şima vînenê), êwe de-llê-n (şima vanê)
- ewan de-bîn-in (ê vînenê), ewan de-llê-n (ê vanê)

*Bi pêroyî îlaweyê kesî yê zemîrê “ew”, “ê” yan zî - eger rîçeyê karî bi herfêda vengine peynî bêro – veng o: “ew de-zan-ê” (o/a zaneno/a) û “ew de-llê- (o/a vano/a). Yan zî tayn fekan de “-êt” yan “-t”: “ew de-zan-êt” û “ew de-llê-t”. La eger rîçeyê karî bi “-e” yan bi “-o” peynî bêro, bi zemîrê “ew” a îlaweyê “-a/-at” zêdîyeno. Eger peynîya rîçeyê çeku “-e” bo, o keweno. Eger “o” bo, beno “-w-”:

- kirdin (kerdene) > -ke- > “min de-ke-m”, “to de-ke-yt” la “ew de-k-a / de-ka-t”
- dan (dayene) > -de- > “min de-de-m”, “to de-de-yt” la “ew de-d-a / de-da-t”
- xwardin (werdene) > -xo- > “min de-xo-m”, “to de-xo-yt” la “ew de-xw-a / de-xwa-t”

FORMO MESDER

Formê zafaneyê karanê soranî yê întansîtîvan o mesder bi “-an” peynî yeno (dimilî de “-(y)ayene”): “tirsan” (tersayene). Dimilî de “-ayene” bikewo û rîçeyê demê nikayinî peyda beno “ters-”, soranî de zî her di herfê peynî ci ra bikewê rîçeyê deme nikayinî peyda beno: -tirs-:

- min de-tirs-im (ez tersena)

Formê zafaneyê karanê soranî yê transîtîvan o mesder bi “-andin” peynî yeno (dimilî de “-nayene”): “tirsandin” (tersnayene). Dimilî de “-ayene” bikewo rîçeyê demê nikayinî peyda beno “tersn-”, soranî de zî kar ra “-andin” kewena û “-ên” ci rê îlawe beno: tirsandin > -tirs- > -tirsên-:

- min de-tirsên-im (ez tersnena)

Negatîfkerdiş her wext bi verîlaweyê “na-” yo (dimilî de “nê-”):

- na-bîn-ê (o/a nêvîneno/a)
- na-zan-im (ez nêzanena)
- na-wêr-ît (ti nêwetanî/a)

Karê BÛN (Bîyayene)

Karê “bûn” demo nikayin û rewşa statîke de wina yo:

- min ... im/ ...'m (dimilî: ez ... (y)a)
- to ... ît/ ...'yt (ti ... (y)î / ti ... (y)a)
- ew ... e/ye (o ... (y)o / a ... (y)a)
- ême ...în/ ...'yn (ma -(y)ê)
- êwe ...in/ ...'n (şima -(y)ê)
- ewan ...in/ ...'n (ê -(y)ê)

Wexto ke kurdî bi kurdî-latînî nusîyena, karê “bûn (bîyayene)” demo nikayin û rewşa statîke de çekuya verêne ra cîya nusîyeno, sey “ez kurd a, ti pîl î, o qij o...” La bi elifbêya kurdî-erebî o bi çeku ya girêdîyeno, sey “ez kurda, ti pîlî, o qijo...” la demanê ravêrdeyan de yan zî rewşa dînamîke de sey bi elifbêya kurdî-latînî “bûn (bîyayene)” çekuya verêne ra cîya nusîyena. (demo ravêrde yo sade: “o kurd bi”, rewşa dînamîke: “o beno pîl.”)

Dimilî de tercîhkerdişê cîyanuştişî asan o çunke “bîyayene” heme rewşan de şena sey çekuyêda xosere bihesibîyo seba ke tewr tayn herfêda vengine tede esta: “Ti kurd î? Ti kam î?” La soranî de, eger merdim karê “bûn” çekuya verêne ra abirrno, tayn formê bê herfa vengine do tena bimanê: “Ewan kê n?” (Ê kam ê?) “To kê yt?” (Ti kam î/a?) Nê rewşan de başêr o ke ê bi çekuya verên a girêdîyê la apostrof mabênê înan de ronîyo:

- Min kurd im. (Ez kurd a.) Min le êre'm (Ez tîya de ya.)
- To baş ît? (Ti baş î/a?) To kê'yt? (Ti kam î/a?)
- Ew çak e. (O/A rind o/a.) Ew gewre ye. (O/A gird o/a.)
- Ême kurd î. (Ma kurd ê.) Ême le êre'yn. (Ma tîya de yê.)
- Êwe kurd in. (Şima kurd ê.) Êwe le êre'n. (Şima tîya de yê.)
- Ewan kurd in. (Ê kurd ê.) Ewan le êre'n. (Ê tîya de yê.)

Formo negatif wina yo:

- min ... nîm (ez ... nîya)
- to ... nît (ti ... nîyî/nîya)
- ew ... niye (o ... nîyo/a ... nîya)
- ême ... nîn (ma ... nîyê)
- êwe ... nîn (şima ... nîyê)
- ewan ... nîn (ê ... nîyê)

Nimûne:

- Min gewre nîm. (Ez gird nîya.)
- To kurd nît. (Ti kurd nîyî / Ti kurde nîya.)
- Ew le êre niye. (O/A tîya de nîyo/nîya.)
- Ême ereb nîn. (Ma erebî nîyê.)
- Êwe le mall nîn. (Şima keye de nîyê.)
- Ewan le ewê nîn. (Ê uca de nîyê.)

Karê HEBÛN (Estbîyayene)

Hem dimilî de hem zî soranî de karê “hebûn (estbîyayene)” di manayanê cîyayan dano hem zî bi di awayanê cîyayan namîyeno. Nimûne:

1. Ez esta (Ez ciwîyena)
2. Sayêda mi esta. (Ez wayîrê sayên a.)

Wexto ke “hebûn” manaya “ciwîyayene” û “peyda bîyayene” de yena xebitnayîş, zemîrê ke pa yê xoser ê:

- Min hem. (Ez esta.)
- To heyt. (Ti estî/a)
- Ew heye. (O esto / A esta.)
- Ême hen. (Ma estê.)
- Êwe hen. (Şima estê.)
- Ewan hen. (Ê estê.)

La wexto ke bi manaya “wayîr bîyayene” yena xebitnayîş, wexta bi hetkarîya zemîranê pakerdeyan a û zemîr çiyê mewcûdî gore namîyeno:

- (Min) defter-êk-im heye. (Defter-êdê mi esto.)
- (Min) dû defter-im hen. (Di defterê mi estê.)
- (To) kitêb-êk-it heye? (Kitabêdê to esto?)
- (To) çend kitêb-it hen? (Çend kitabê to estê?)
- (Ême) to-man heyt. (Tiyê ma estî. / Tiya ma esta.¹⁰⁰)
- (Êwe) kitêb-tan heye? (Kitabê şima esto?)
- (Êwe) kitêb-tan hen? (Kitabê şima estê?)
- (Ewan) şitêk-yan heye? (Çiyêdê înan esto?)

Eger cumle bê name bo, wexta zemîrê pakerdeyî bi karî ya girêdîyenê, nê formulî gore:

he- + zemîro pakerde + îlaweyê kesî bi goreyê çiyê mewcûdî

- he-m-e (ê mi esto/a) / he-m-in* (ê mi estê)
- he-t-e (ê to esto/a) / he-t-in (ê to estê)
- he-ye-tî (ê ey esto/a; ê aye esto/a) / henetî (ê ey/ayê estê)
- he-man-e (ê ma esto/a) / he-man-in (ê ma estê)
- he-tan-e (ê şima esto/a) / he-tan-in (ê şima estê)
- he-yan-e (ê înan esto/a) / he-yan-in (ê înan estê)

¹⁰⁰ Dimilî de cumleyêda winayine zaf nêvajîyena.

*Formê zafhûmarî zaf tayn yenê xebitnayîş. Herinda înan de zî formê yewhûmarî yenê tercîhkerdiş: “hemîn>heme”

Negatîfkerdişê “hebûn” a bi manaya “wayîr bîyayene” zî bi eynî formul a yo la tena cayê “he-” de “nî-” esto:

- nî-m-e (ê mi çinî yo/a) / nî-m-in* (ê mi çinî yê)
- nî-t-e (ê to çinî yo/a) / nî-t-in (ê to çinî yê)
- nî-ye-tî > ni-ye-tî (ê ey çinî yo/a; ê aye çinî yo/a) / nî-ne-tî (ê ey/ayê çinî yê)
- nî-man-e (ê ma çinî yo/a) / nî-man-in (ê ma çinî yê)
- nî-tan-e (ê şima çinî yo/a) / nî-tan-in (ê şima çinî yê)
- nî-yan-e > ni-yan-e (ê înan çinî yo/a) / nî-yan-in > ni-yan-in (ê înan çinî yê)

*Formê zafhûmarî hema vaje qet nêvajîyenê. Cayê înan de zî formê yewhûmarî yenê tercîhkerdiş: “nîmin > nîme”

RAWEYA FERMANÎ

Raweya fermanî ya yewhûmare soranî de, seke dimilî de zî, bi no formul a yena awankerdiş:

bi- + rîçeyê demê nikayinî + -(e)

Nimûne:

- bi-zan-e! (bi-zan-e!)
- bi-gir-e! (bi-gî-!)
- bi-firoş-e! (bi-roş-e!)
- bi-ke! (bi-k-e!)
- bi-llê! (vaje!)
- bi-rro! (şo!)

Raweya fermanî ya zafhûmare soranî de bi no formul a yena awankerdiş:

bi- + rîçeyê demê nikayinî + (i)n

Nimûne:

- bi-zan-in! (bi-zan-ên!¹⁰¹)
- bi-gir-in! (bi-gîr-ên!¹⁰²)
- bi-firoş-in! (bi-roş-ên!)
- bi-ke-n! (bi-ker-ê!¹⁰³)

¹⁰¹ Dimilî de raweya fermanî ya zafhûmare de formê “-ê” zî esto ke ercîyeno bivajîyo “bi-zan-ê!”

¹⁰² Dimilî de tayn karan de raweya fermanî ya zafhûmare de rîçeyê demê nikayinî de “-r-” zêdîyeno, raweya yewhûmare de çinî yo.

¹⁰³ Biewnîrê noto verên (5.) ra.

- bi-llê-n! (vaj-ên!)
- bi-rro-n! (şir-ên!)

Soranî de formê fermanî yê karê “hatin (ameyayene)”, “were!” (bê!; yewhûmar) û “werin!” (bêrên!; zafhûmar) ê. Labelê formê neîstîsnayî “bê!” (bê!) û “bên!” (bêrên) zî zêde yenê xebitnayîş.

Negatîfkerdişê raweya fermanî bi hewadayîşê “bi-“ û cayê ey de ronayîşê “me-“ virazîyeno:

- me-gir-e! (me-gî!)
- me-ke! (me-k-e!)
- me-llê! (me-vaj-e!)
- me-rro! (me-şo!)
- me-gir-in! (me-gîr-ên!)
- me-ke-n! (me-ker-ên!)
- me-llê-n! (me-vaj-ên!)
- me-rro-n! (me-şir-ên!)

DEMO RAVÊRDEYO SADE/DÎYAR

Soranî de rîçeyê demanê ravêrdeyan bi eştîşê “-(i)n” peynîya formê mesderî yê karî ra yeno peydakerdiş (dimilî de -(y)ene erzîyena):

- kirdin (kerdene) > kird-in (kerd-ene) > -kird- (-kerd-)
- zanîn (zanayene) > zanî-n (zana-yene) > -zanî- (-zana-)
- çûn (şîyayene) > çû-n (şîya-yene) > -çû- (şi, şî¹⁰⁴)

Sey dimilî, soranî de zî bi karanê întansîtîvan îlaweyê kesî kerdoxî gore yenê xebitnayîş:

- min çû-m (ez şî-ya)
- to çû-yt (ti şîyî/şîya)
- ew çû- (o şî / a şî¹⁰⁵)
- ême çû-yn (ma şî-yî)
- êwe çû-n (şîma şî-yî)
- ewan çû-n (ê şî-yî)

¹⁰⁴ Şîyayene û çend karê bînî seba formulê eştîşê “-(y)ene” îstîsna yê. No nuşte de winî hesabîyeno ke wendoxî nînan zanênê.

¹⁰⁵ Dimilîya Dêrsimî û çorşmeyê ci de formê (o şî / a şîye) estê.

Bi zemîranê transîtîvan a dimilî de zemîrê namiteyî/oblîkî yenê xebitnayîş: “mi kerd, to kerd, ey/aye kerd, ma kerd, şima kerd, înan kerd”. Îlaweyê kesî kerdoxî gore nê la kerdeyî (objeyi) gore yo.

Cayê zemîranê dimilî yê namiteyan (oblîkan), soranî de zemîrê pakerdeyî/padusnayeyî (cênawî likaw) yenê xebitnayîş:

- zanî-m (mi zana)
- kird-it (to kerd)
- wut-î (ey/aye va)
- bird-man (ma berd)
- xward-tan (şima werd)
- hêna-yan (înan ard)

Ge-gane zemîrê soranî yê xoserî zî ci rê zêdîyenê (sey “min zanî-m”, “to kird-it”) la ê hewce nêkenê heta vêşî yê zî.

Eger cumle de kerde (obje) zî bibo, zemîro pakerde bi kerde ya girêdîyeno:

- Kesêk-im bird. (Mi kesê berd.)
- Nan-it xward? (To nan werd?)
- Aw-î hêna. (Ey/Aye awe arde.)
- Kitêbêke-man xwênd. (Ma [filan] kitab wend.)
- Min-it dît/bîna. (To ez dîya/vînaya.)
- To-m wîst. (Mi ti sînayî/a.)

Negatîfkerdiş bi “ne-“ beno. La zemîro pakerde yeno mabênê ey û rîçeyê karî:

- ne-m-zanî (mi nêzana)
- ne-t-kird (to nêkerd)
- ne-y-wut (ey/aye nêva)

La eger cumle de kerde (obje) zî bibo, zemîr bi ey a girêdîyeno:

- Kesêk-im ne-dît/ne-bîna. (Mi kesê nêdî/nêvîna.)
- Nan-it ne-xward. (To nan nêwerd.)
- Min-î ne-dît/ne-bîna. (Ey/Aye ez nêdîya/nêvînaya.)
- To-man ne-wîst. (ma ti nêsinayî/a.)

DEMO RAVÊRDEYO BERDEWAM

Demo ravêrde yo berdeyam bi verîlaweyê “de-“ virazîyeno. Zemîro pakerde yeno mabênê ey û rîçeyê karî:

- de-m-kird (mi kerd-êne)

- de-t-bird (to berd-êne)
- de-y-wut (ey/aye vat-êne)
- de-man-kird (ma kerd-êne)
- de-tan-hêna (şima ard-êne)
- de-yan-dît / de-yan-bîna (înan dî-yêne / vîna-yêne)

La eger cumle de kerde (obje) zî bibo, zemîr bi ey a girêdîyeno:

- Kesêk-im de-dît / de-bîna. (Mi kesê dîyêne / vînayêne.)
- Nan-it de-xward. (To nan werdêne.)
- Min-î de-dît / de-bîna. (Ey/Aye ez dîyêne / vînayêne.)
- To-man de-wîst. (Ma ti sînayêne.)

Negatîfkerdiş bi “ne-“ beno û zemîro pakerde yeno mabênê ey û rîçeyê karî:

- ne-m-de-kird (mi nêkerdêne)
- ne-t-de-bird (to nêberdêne)
- ne-y-de-wut (ey/aye nêvatêne)
- ne-man-de-kird (ma nêkerdêne)
- ne-tan-de-hêna (şima nêardêne)
- ne-yan-de-dît / ne-yan-de-bîna (înan nêdîyêne / nêvînayêne)

La eger cumle de kerde (obje) zî bibo, zemîr bi ey a girêdîyeno:

- Kesêk-im ne-de-dît / ne-de-bîna. (Mi kesê nêdîyêne / nêvînayêne.)
- Nan-it ne-de-xward. (To nan nêwerdêne.)
- Min-î ne-de-dît / ne-de-bîna. (Ey/Aye ez nêdîyêne.)
- To-man ne-de-wîst. (Ma ti nêsinayêne.)

DEMO RAVÊRDEYO NEDÎYAR

Demo ravêrde yo nedîyar karanê întansîtîvan de bi no formul a yeno awankerdiş:

rîçeyê demê ravêrdeyî + (-û-) + îlaweyê kesî

Nimûne:

- min hat-û-m (ez ameya)
- to hat-û-yt (ti ameyî/a)
- ew hat-û-e > hatûwe yan hatuwe* (o ameyo / a ameya)
- ême hat-û-yn (ma ameyê)
- êwe hat-û-n (şima ameyê)
- ewan hat-û-n (ê ameyê)

*Elifbêya kurdî-erebî de bi di “ww/uu” nusîyeno yanî “hatwwe” yan “hatuue”. La “hatûwe” do bi elifbêya erebî bibîyayêne “hatwwwe” yan “hatuuue”. La ta ke “û” nêvurrîyo “a”, ma hîna maqûl vînenê ke sey “hat-û-w-e” bipawê.

Eger rîçeyê karî demo ravêrde de xora bi “-û” peynî bêro, wexta hinî “û”yêdo bîn nêzêdîyeno. La seba cîyakerdişê ci demo ravêrde yo sade ra “-e” şeno cayanê laziman de bizêdîyo:

- çû > min çû-m-e (ez şîya), to çû-yt (ti şîyî/a), ew çû-w-e (o şîyo/a şîya), ême çû-yn-e (ma şîyê), êwe çû-n-e (şima şîyê), ewan çû-n-e (ê şîyê)

Negatîfkerdişê înan bi verîlaweyê “ne-“ yo: ne-hat-û-m (ez nêameya), ne-hat-û-yt (ti nêameyî/a), ne-hat-û-we (o nêameyo/a nêameya), ne-hat-û-yn (ma nêameyê), ne-hat-û-n (şima/ê nêameyê).

Demo ravêrde yo nedîyar karanê transîtîvan de bi no formul a yeno awankerdiş:

rîçeyê demê ravêrdeyî + (-û-) + zemîro pakerde + -e

Nimûne:

- kirdin > kird > kird-û-m-e (mi kerdo¹⁰⁶)
- xwardin > xward > xward-û-t-e (to werdo)
- hêştin > hêşt > hêşt-û-e > hêştûwe yan hêştuwe (ey/aye verdayo)

Eger rîçeyê karî bi “-î” peynî bêro, “-û-“ ci rê nêzêdîyeno:

- zanî-man-e (ma zanayo)
- kirrî-tan-e (şima herînayoy)

Eger rîçeyê demê ravêrdeyî bi “-a” peynî bêro, “-û-“ beno “w”:

- hênan (ardene) > hêna > hêna-û-yan-e > hêna-w-yan-e (înan ardo)

La eger cumle de kerde (obje) zî bibo, zemîr bi ey a girêdîyeno:

- Kesêk-im dît-û-e / bîna-û-e. > Kesêk-im dîtû-w-e / bîna-w-e. (Mi kesê dîyo/vînayoy.)
- Nan-it xward-û-e. > Nan-it xward-û-w-e. (To nan werdo.)
- Min-î dît-û-e / bîna-û-e. > Min-î dît-û-w-e / bîna-w-e. (Ey/Aye ez dîya / vînaya.)

¹⁰⁶ Dimilî de (hem kurmancî de zî) peynîya karî kerdeyî (objeyî) gore ancîyeno, coka kerdo/a/î/ê bene, la ma tena formo nerî nuşt ke sade bo.

- To-man wîst-û-e. > To-man wîst-û-w-e. (Ma ti sînayî/a.)

Negatîfkerdişê demê ravêrdeyê nedîyarî bi verîlaweyê “ne-“ yo. Zemîro pakerde yeno mabênê ey û rîçeyê karî:

- ne-m-kird-û-e > ne-m-kird-û-w-e (mi nêkerdo)
- ne-t-bird-û-e > ne-t-bird-û-w-e (to nêberdo)
- ne-y-wut-û-e > ne-y-wut-û-w-e (ey/aye nêvato)
- ne-man-dît-û-e > ne-man-dît-û-w-e (ma nêdîyo)
- ne-tan-hêna-û-e > ne-tan-hêna-w-e (şima nêardo)
- ne-yan-xward-û-e > ne-yan-xward-û-w-e (înan nêwerdo)

Eger cumleya negatîfe de kerde (obje) zî bibo, wexta zemîr bi ey a dusîyeno:

- Kesêk-im ne-dît-û-e/ne-bîna-û-e.> Kesêk-im ne-dît-û-w-e/ne-bîna-w-e. (Mi kesê nedîyo.)
- Nan-it ne-xward-û-e. > Nan-it ne-xward-û-w-e. (To nan nêwerdo.)
- Min-î ne-dît-û-e/ne-bîna-û-e > Min-î ne-dît-û-w-e/ne-bîna-w-e (Ey/Aye ez dîya.)
- To-man ne-wîst-û-e> To-man ne-wîst-û-w-e (Ma ti nêsinayê.)

DEMO RAVÊRDEYO DÛRÎ

Demo ravêrdeyo dûrî karanê întansîtîvan de bi no formul a yeno awankerdiş:

rîçeyê demê ravêrdeyî + -bû- + îlaweyê kesî

Nimûne:

- min hat-bû-m (ez ameybîya)
- to hat-bû-yt (ti ameybîyî / ameybîya)
- ew çû-bû (o şibi / a şîbî)
- ême çû-bû-yn (ma şîbîyî)
- êwe gerra-bû-n (şima gêraybîyî)
- ewan ma-bû-n (ê mendibîyî)

Negatîfkerdişê înan bi verîlaweyê “ne-“ yo: ne-çû-bû-m (ez nêşîbîya), ne-çû-bû-yt (ti nêşîbîyî / nêşîbîya), ne-hat-bû (o nêameybi / a nêameybî), ême ne-hat-bû-yn (ma nêameybîyî), êwe ne-ma-bû-n (şima nêmendibîyî), ewan ne-gerra-bû-n (ê nêgêrabîyî).

Demo ravêrdeyo dûrî karanê transîtîvan de bi no formul a yeno awankerdiş:

rîçeyê demê ravêrdeyî + -bû- + zemîro pakerde

Nimûne:

- kirdin> kird > kird-bû-m (mi kerdibi)
- xwardin > xward > xward-bû-t (to werdibi)

- hêştin > hêşt > hêşt-bû (ey/ayê verdaybi)
- zanî-bû-man (ma zanaybi)
- kirrî-bû-tan (şima herînaybi)
- hêna-bû-yan (înan ardîbi)

La eger cumle de kerde (obje) zî bibo, zemîr bi ey a girêdîyeno:

- Kesêk-im dît-bû/bîna-bû. (Mi kesê dîbi/vînabi.)
- Nan-it xward-bû. (To nan werdîbi.)
- Min-î dît-bû/bîna-bû. (Ey/Ayê ez dîbîya/vînabîya.)
- To-man wîst-bû. (Ma ti sînaybîyî/a.)

Negatîfkerdîşê demê ravêrdeyê dûrî bi verîlaweyê “ne-” yo, zemîro pakerde yeno mabênê ey û rîçeyê karî:

- ne-m-kird-bû (mi nêkerdîbi)
- ne-t-bird-bû (to nêberdîbi)
- ne-y-wut-bû (ey/ayê nêvatîbi)
- ne-man-dît-bû (ma nêdîbi)
- ne-tan-hêna-bû (şima nêardîbi)
- ne-yan-xward-bû (înan nêwerdîbi)

Eger cumle nêgatîfe de kerde (obje) zî bibo, wexta zemîr bi ey a dusîyeno:

- Kesêk-im ne-dît-bû. (Mi kesê nêdîbi.)
- Nan-it ne-xward-bû. (To nan nêwerdîbi.)
- Min-î ne-dît-bû. (Ey/Ayê ez nêdîbîya.)
- To-man ne-wîst-bû. (Ma ti nêsinaybîyî/a.)

FERHENGOKA ZIMANNASÎ



Kêşeya termînolojiya zimannasiyê di kurdî kêşeyeke mezin e ji ber gelek sedemên cûrbicûr ku di gelek nivîsan de ji aliyê hinek nivîskaran de berê jî hatiye nivîsin û em ê dîsa

li ser wan mijaran û sedemên wan nesekinin lê belê em ê di her hejmareke kovarê de hewl bidin ku hin peyvên zimannasiyê ji inglîzî wergerînin bo kurdî. Metod û rêbaza wergerê dê ne wergereke rasterast be lê belê piştî xwendina çavkaniyên zimannasiyê yên inglîzî dê têgihên zimannasî werin berhevkerin û bi heman awayî em dê di nivîsên nivîskarên kurd de, li heman têgihan bigerin û hewl bidin ku peyda bikin û wan wek werger ji wan têgihên inglîzî re bihesibînin. Helbet car-car em dê bi pirsyaran jî bikarin ji zimannasan bersiva an wergera hin têgihan berhev bikin û li ferhengokê zêde bikin.

Di beşê vê hejmarê de, me nivîsa Newzad Hirorî ya bi navê “**lêkolînek li ser dengsaziya kurmanciyê: Nihêniyên befrê/berfê**” nivîsên Husein Muhammedî yên ku di koma zimanê kurdî de û kovarê de wek çavkanî bi kar anîne lê herwiha di wergera hin têgihan me wikiferheng jî bi kar aniye.

Li gel wergera rasterast ya têgihê me ew têgih bi kurmancî rave kiriye û me hewl daye ku em rêyekê ji xwendevanî re vekin ta ku ne tenê têgihê ji ber bike le belê herwiha tê bigihê û bikare di nivîsên de bi kar bîne.

Di dawiyê de em vê jî baş dizanin ku ihtimala kêmasî û şaşyan dê hebe lê ev şaşî dê bi beşdariya xwendevan û hişyarkirin û pêşniyazên wan dê di hejmarên pêş de werin serrastkirin û dê wergerên alternatîv jî li wergerên berên werin zêdekirin.

acoustic phonetics: denganiya veguhestinî

Beşekî teknîkî yê denganiyê ye ku li taybetmendiyan fîzîkî yên pêlên dengî bi rêya amûr û kompûteran vedikole

alveolar: pidûyî

Ew deng e yê ku bi gihandina zimanî bo pidûyan derdikeve.

articulation: dengjenîn

Awayê gotina dengekî di zimanî de.

articulatory phonetics: denganiya gotinî

Ew beşê denganiyê ye yê ku li awayê çêkirina dengan vedikole

auditory phonetics: denganiya bihîstînî

Ew beşê denganiyê ye ku li wergirtin guhî ji deng re û têgihîştinê vedikole.

bilabial: dulêvî

Ew deng e yê ku ji herdû lêvan derdikeve.

coda: dûvik

Ew beşê dawî yê kîteyê ye ku ji dengdarekî an zêdetir pêk tê.

consonant: dengdar

Ew deng e yê ku perdeyên dengî bi awayekî qisimî yan giştî tîr girtin ta ku derkevin.

dental: didanî

Ew deng e yê ku bi gihandina serê zimanî bo dawiya diranên jorîn, derdikeve.

fricative: xişok

Ew deng e yê ku bayê wî di buhurkeke teng re derbas dibe lew dibe sedem ku xişîn jî bi dengî keve.

glottal: qirikî

Ew deng e yê ku ji zengelorkê derdikeve.

interdental: nêvdidanî

Ew deng e ku di derketina wî de, ziman digihê navbera diranan.

labiodentals: lêvî-didanî

Ew deng e yê ku gava derdikeve diranên jorîn digihê lêva jêrîn.

lexical gap: valahiya ferhengî

ew peyv e ku di zimanî de tune lê ji aliyê rêbaz û fonotaktîkê ve peyveke pêkan e.

liquid: Jenok

Ew deng e yê ku bi jenîna zimanî derdikeve.

minimal pair: cotê mînimîl

Du peyvên ku tenê di yekê fonemê de ji hev cuda ne (bi piranî ew fonem jî di heman cihê de ye)

minimal set: koma mînimîl

Ew çend peyv in yê ku tenê fonemeke wan cuda ye (bi piranî ew fonema cuda di heman cihê de ye)

nasal: bêvilî

Ew deng e yê ku yê ku bi daketina zimanokî û derbasbûna hewayî bo bêvilê, pêk tê.*

onset: serik

Beşa bingehîn ya kîteyê ku bi piranî dengdarek(an zêdetir) e û li dû wî serwa tê.

palatal: paşpidûyî

Ew deng e yê ku bi gihandina zimanî bo paşiya pidûyan, derdikeve.

phonetics: danganî

Ew zanist e ya ku bi awayekî giştî li taybetmendî û cudahiyên dangan vedikole.

phonology: dengnasî

Ew zanist e ya ku di bingehê xwe de şayesandina pergala û şewêyên dengên axiftinê yên zimanî ye.

rhyme: serwa¹⁰⁷

ew dengdêr e yê ku li dû serikê di kîteyê de tê.

stop: sekinî

Ew deng e yê ku berî derxistina dengê lêv bi temamî tîr girtin û dûre vedibin.

syllable: kîte

Beşek e ku dengdêrekî an jî dudengekî dihewîne.

velar: paşdevî

Ew deng e yê gava derdikeve ziman digihê paşiya devî.

vocal folds: perdeyên dengî

Ew beşê zengelorkê ye ku ba tê re dibuhire ta ku deng derkeve.

voiced: bilerz

Ew deng e yê ku gava derdikeve, perdeyên dengî dilerizin.

voiceless: bêlerz

¹⁰⁷ serwa wateya qafiyeyê dide, ji soranî hatiye girtin.

Ew deng e yê ku gava derdikeve, perdeyên dengî nalerzin

vowel: dengdêr

Ew deng e yê ku gava derdikeve perdeyên dengî bi tamamî vedibin û deng bi hêsanî derbas dibe.

Zanistî wergêrran

Diyako Haşimî



Pêşekî

Wergêrran wate wergerrandinî deqêk yan witeyek le zimanî destpêkewe bo zimanî mebest becorê ke karîgeriy zimanî destpêk le xwêner yan bîserî zimanî destpêk bigwêzirêtewe bo xwêner yan bîserî zimanî mebest.

Le rastî da wergêrran debê bebê biçûktirîn xistineser yan labrdinêk bêt, bellam ewe tenha layenî hziriye, çunkû pêkhatay zimanekan pêkewe ciyawaziyan heye û wergêrr naçar debê destkarî bika le wergêrranekan da.

Zimanî serçawe yan zimanî mebest?

Axo wergêrran debê le zimanî destpêkewe nzîk bêt yan le zimanî mebest? aya nûser giring e yan gwêgr û xwêner? aya emîndarêti giring e yan xomallîkirdinî nûsînekan? aya çi deqêk ziyatirîn desttêwredanî tiya bikirê? û komellê prsiyarî tir...

Bo lêwirdbûnewe û tawutwêkirdinî hemû ew kêşane zanistî (wergêrranzanî tiranislatojî) bedî hatûe.

Le willate pêşkewtuwekanda zor bayex bewergêrran dedrê û sedan korr wkomell û kobûneweî leser degîrê û govar û pertûk û beriname û namîlke û witar û babetî leser billaw dekirêtewe.

Karê ke wergêrr deyka le karî nûserê kemitir niye û erkêkî zor giring berrêwe debat.

Wergêrran debête hoî aşnabûn legell cîhanî derewe û hawkat komellê wişe û zaraweî nwê dête naw zimanekeke.

wergêrran zanistêkî serbexo û xawen yasa û rêsaî taybetmendî xoyetî. le yekem hengawda detwanîn dabeşî keîne ser dû cor:

1. (wergêrranî zarî interpretation) ke dû corî serekiy heyh:

wergêrranî hawkat.

wergêrranî nahawkat.

2. (wergêrranî nûsirawî translation) ke çend corî heye:

wergêrranî wişebewişe

wergêrranî riste

wergêrranî azad

Wergêrranî zarî (interpretation)

Wek le nawekeyewe diyare wergêrranî zarî wergêrranêke ke be şêwey zîndû û be pele dekirêt. hawkat ke wter qse dekat wergêrreke debê wtekan wergêrrêtewe. bepêçewaney wergêrranî nûsirawî, le wergêrranî zarîda kat kemh, hemû şitekan bexêrayî deçne pêşewe û bekarhênanî amêre yarmetîderekan wekû ferhengname esteme.

Beste bewey ke le çî zimanêkewe wergêrran dekirêt, şêwey wergêrraneke dabeş dekirê beser:

wergêrranî hawkat

wergêrranî nahawkat

bo rûnikirdinewe seyrî pêkhatay rêzimanîy zimanî înglîzî biken:

I wrote a letter.

S V O

ke lêreda (S = biker), (V = kar) û (O = berkar)e.

debînîn ke zimanî înglîzî rîzbûnî binemayîy (SVO) y heyh, wate le pêşda biker, paşan, kar û dwayî berkar denûsirêt.

le zimanî kurdîda rîzbûnî binemayî wekû zimanî înglîzî niye û bellkû beşêwey (SOV)e wate lepêşda biker, paşan berkar û dwayî kar dêt:

Min nameyekim nûsî.

S O V

zimanî farsîş rîzbûnî binemayekey wekû zimanî kurdî wate (SOV)e.

Men nameê nivîstem

Êste eger wergêrrêk bêt û biyewê beşêwey zarî û xêra le zimanî inglîziyewe wteyêk bikate kurdî, bo ewey risteyekî tewaw bidate destewe debê bwestê ta qsebêjeke risteyê tewaw bika ke zorcar ptir le risteyêke û debê le mebesteke betewawî tê biga, încâ dest bikate wergêrran. wate ew kate beşêwey nahawkat wergêrran dekat û paş westanêkî qsebêjeke wergêrranekey tewaw dekat.

Bellam eger bêt û le zimanî farsiyewe werî bigêrrê detwanê hawkat wergêrran bikat, çunkû rîzbûnî dû zimanî farsî û kurdî leser yek şêwe rîzbûne û pêwîst nakat çawerrwan bêt ta le tewawî mebesteke tê bigat, tenha be tozê ciyawaziy kat wergêrranekey tewaw dekat.

Bem core debînîn eger pêkhatey rîzbûnî zimanî destpêk û zimanî mebest wekû yek bin, wergêrranî zariyêke beşêwey (wergêrranî hawkat) dekirêt.

Bellam eger pêkhatey rîzbûnî zimanî destpêk û zimanî mebest wekû yek nebin, wergêrranî zariyêke beşêwey (wergêrranî nahawkat) dekirêt.

şarezayî le biwareke

Wergêrranî zarî yan rastewxo yekêk le sexttirîn şewazekanî wergêrrane, çunkû wergêrr debê bê gatkirdin û westan, xêra xêra bo her dû zimaneke wergêrran bikat. bo em kare wergêrrêke pêwîste şarezayî başî le her dû zimaneke hebêt û herweha şarezayî başîşî le babeteke hebêt ke wergêrranî lê/ bo dekat. biwarekan û psporriyekan zor sinûrdarin û kesê ke le biwarêkî gşitîda wergêrran dekat rene netwanê le dadgayek yan le nexoşxaneyek wergêrran bikat, çunkû bo nimûne ew dû şwêne komellêk çemk û wişe û destewajey taybet be biwarî xoyan heye ke eger kesêk lewane şarezayî nebê, rene ew wşaney her ber gwê nekewtibêt, boye giring e le pêşda le biwarekeda şarezayî hebûbê.

carî waye le zimanêkda renga zaraweyek yan çemkêk bo mebestêkî taybetî bûnî hebêt, bellam beranberekey le zimanêkî tirda her nebêt, boye giring e wergêrr çêjî "zarawesazî û wişesazî"î hebêt ta bitwanê le katî pêwîstda wişeyek yan zaraweyek yan çemkêk beranber bewey le zimanî serçaweda heye dabinêt, ke bitwanê bo xêrayîy karekey le wergêrranekeyda bekarî bihênê û wişedahênrawekeş nabê hênde lay gwêgrî zimanî mebest namo bêt ke bîhesêt.

bo nimûne le dezgay koçberiy swîdida, komellê çemk û zarawey taybet be koçberî bekar deçn ke renga le kurdistan yan tenanet le êran û êraqîşda beranberekeyan bûniyan nebêt, wergêrr debê hênde betwana û beselîqe bêt ke çemkî prrbepêstiyen bo bidozêtewe. carî waşe le wişe dahênraweke kes tê nagat, çunkû biwareke hênde taybete renga le zimanî serçawesda kesêkî asayî ke serqallî ew biware nebêt lêy tê negat, bellkû pêwîstî be lêkdaneweyek heye, nimûney ew çemkane ew zarawanen ke bo biwarî penaberî bekar deçn ke tenanet hendê car swîdiyekî asayî le wişe swîdiyeye tê nagat, çî nexwazellla wergêrrêk biyewê xoy wişeyek beranberyan danê û çawerrê bêt penaxwazêkî kurd lewane tê bigat. nimûney ew çemkane emanen:

carrî pley penaberî / rageyandinî pley penaberî

flyktingstatusförklaring

cêgrewey carrî dallde / cêgrewey rageyandinî parastin

Alternativ skyddsstatusförklaring

Diyar e ne swîdiyek û ne kurdêkîş ke yekem car ewane bibîsin le mebestekan tê nagen, meger ewey ke karibedestekey dezgay koçberî mebesteke rûn bikatewe. çunkû ewane zarawey biwarî koçberîn le willatî swîdida û ew wşane herçendîş bedrustî be farsî yan 'erebî yan kurdî bedway yekda rîz bikirên û werbigêrrdrênewe, hêşitaş her lelay gwêgrekan namon, bellam wergêrr le katî wergêrranî rastewxoda debê beranber bewane wişey hebê ta wergêrranekey pekî nekewêt, ca eger gwêgreke tê negeyî erkî serşanî xoyetî dawa le karibedesteke bikat ke ew çemkane rûn bikatewe ta ew têyan bigat.

Bo dananî wişey beranber ew çeşne destewajane, wergêrreke debê bebaşî le yasa û rêsakanî penaberiy swîd tê geşitibê û bebaşî bzanê mebest çiyê ta bitwanê beranberî guncaw bidozêtewe û le karekeyda bekarî bihênê.

Le willate urûpayiyekan bo nimûne le swîdida, komellê binikey corbecorî wergêrran heye ke gelê wergêrr lew şwênaneda kar deken, carî waye wergêrrekan lelay bekarhêneran amaden û carî waşe le dûrewe, le rêy telefon yan vîdiyowe wergêrranî rastewxo yan zarî deken, çaw lem bestere biken ke nimûney binikeyekî wergêrrane le swîd ke wergêrrekanî lenêw nûsîngeyekî gewre danîştûn û teniya lerrêy telefon yan vîdiyowe karî wergêrran deken le nêwan zimanî swîdî û komellê zimanî tir bo wêne 'erebî, kurdî, farsî, derî, rûsî, somaliyayî û htd:

Wergêrrî rastewxo TolkDirekt

çirî hizir

le wergêrranî rastewxo yan zarîda, wergêrr debê tenanet bo çirkeyeş hzirî le babeteke danebirrê, çunkû her ke şîrazey babetekey lê bpiçirrêt karî wergêrranekey têk deçêt û bigire wergêrranêkî bepêçewane bidate destewe. carî waye wergêrreke naçare gwê le cend risteyek bigirê pêş ewey bitwanê dest bikat be wergêrran, boye debê twanay çirriy hzir û webîrhênanewey xoy geşe pê bidat, carî waşe detwanê kelli le wişey klîlî wergrê û le katî gwêgirtinda ew wişe klîliyane binûsêtewe û bo ewey ristekanî bêtewe bîr. Lem vîdiyoyeda rûnikirdinewey baş Leser ew mebeste drawe:

Xulî fêrkarî bo wergêrranî zarî, be İnglîzî

Teknîkî wergêrran

Wergêrranî rastewxo tekînkî taybetî xoy heye, bo nimûne pêş le destpêkirdinî wergêrraneke, wergêrreke debê be her dû zimanêke xoy be layenekan binasênê, basî bêlayeniy xoy le

wergêrraneke bikat û herwe basî erke giring ekey xoy bikat ke "rrazparêzî" û "nedrkandinî basekaniyan lemila û lewlaye" bo ewey her dû layeneke dîlînya bikatewe ke "bêlayanî" û "Razparêzî" lay em giring e û bayexî taybetiy pê dedrêt, kewa bêt, wergêrreke debê pêş le destpêkirdinî wergêrranekey, em xallane be her dû zimanê, dûpat bikatewe:

1. xonasandin.
2. derbirrînî "bêlayanî"î xoy.
3. agadarkirdinewe lewey ke "rrazparêz"e û "erkî nedrkandin"î leser şane.
4. destînîşanikirdinî ewey ke hemîşe le zimanî yekem kesewe qse dekat.

Herweha wergêrreke le katî wergêrranda debê corêk danîşê ke dû keseke bebaşî yektir bibînin, herweha wergêrreke nabê le wergêrranda serincî kesekan bo lay xoy rabikêşê, bellkû debê teniya dengêk bêt lewê wek kesêkî nadiyar. wate wa hellsukewt bikat ke dû layenek bes çaw le yektir biken û rû bikene yektir nek wergêrreke.

Herweha wergêrreke debê le katî wergêrranda hemîşe le zimanî yekem kesewe wergêrran bikat û bo nimûne nabê le katî wergêrranda billê: "em dellê: nawt çiyê?" bellkû le zimanî prsiyarekerekewe rastewxo prsiyar dekat û debê billê: "nawt çiyê?"

Eger wergêrreke piyaw bêt û wergêrran bokiraweke jn bêt û billê: "duktor, min dûgiyanm.", wergêrreke nabê billê: "duktor, em dellê dûgiyanm", bellkû debê rastewxo le zimanî jne skprrekewe billê: "duktor, min dûgiyanm."

Lem vîdiyoyeda bas le teknîkî wergêrran û çonêtîy danîşitin û qsekirdinî wergêrreke dekirêt le nêwan wergêrran bokirawekanda:

nimûney teknîkî wergêrran, înglîzî - spanyayî

Wergêrranî nûsrawî (translation)

Wergêrr le wergêrranî nûsirawîda katêkî zorî bedesteweye û detwanê le amêre yarîdederekanîş kellk wergrê.

Yekey wergêrran

Wergêrr le katî wergêrranda birrgeyek lew babetey deyewê werî gêrrê leberçaw degrê û be têgeyşitin lewe ke pêy dewtirê (yekey wergêrran) xêra dest dekat be wergêrran. yekeyekî wergêrran detwanê wişe, riste yan destewaje ('bare) bêt û lanîkem pêk hatûe lew sê qonaşey xwarewh:

Elf: wergêrranî wişebewişe

yekey wergêrran lem qonaşeda wişeye û bo her wişeyekî deqî zimanî destpêk, wişeyek le zimanî mebest dehênrêtewe. em qonaşe bo wergêrranî gelêk wişey lêkdraw û nîmçewişe bekar debrêt ke hawtayekî kutumtiyan le zimanî mebestda niye.

bo nimûne:

qûlle pêkhate deep structure

rûe pêkhate surface structure

Lew nimûnane debînîn ke wergêrranî wişebewişe gunçaw û lebarh, bellam le risteyekî wekû: (He gave me a book to read) eger bêt û wişebewişe werî gêrrîn debê binûsîn: (ew day be min ktêbêk bo xwêndin) ke diyare eme dasepandinî rîzbûnî wişey zimanî destpêke beser zimanî mebestda (ke lêre kurdiyih), çunkû le zimanî kurdîda ême wa wişekan rîz nakeyin bellkû dellêyin: (ew ktêbêkî da be min bo xwêndin).

Yan eger bêt wişebewişe ristey (He kicked the bucket) wergêrrîn debê billêyin: (ew leqey da le setllekh) ke bêguman em risteye risteyekî nwêy tire ke mebestî nûser niyh, nûser mebestî eme bûh: (ew mird).

Yan eger bo (aktib alrsale) binûsîn (denûsm namekh) ewe şêwey rîzbûnî zimanî 'erebîman sepandûe beser zimanî kurdîda çunkû ême dellêyin: (nameke denûsm).

Boye debê wriya bîn çî şêwe wergêrranê helldebijêrîn.

b: wergêrranî riste

Yekey wergêrran lem qonaşeda riste. Lem wergêrraneda rêziman û şêwey rîzbûnî wişey zimanî mebest (wate ew zimaney wergêrranî bo dekeyin) leberçaw degîrê. çemk (mfhum)î ristey beranber begwêrey çemkî ristey zimanî destpêk leberçaw degîrê.

Bem core ristekanî deqî zimanî destpêk be parastinî watay danebedaney wişekan werdegêrrdrêtewe ser risteyek le zimanî mebestda.

p: wergêrranî azad yan serbest

Lem qonaşeda yekey wergêrran destewaje yan paragrafe. peyamî deqî zimanî destpêk le komellê riste le zimanî mebest dexirête berdest. Lem wergêrraneda xistineser û labrdin û desttêwerdan bew perrî xoy rêpêdrawe.

Wergêrranî pêwendî û wergêrranî watayî

Le rewî wergêrranda wergêrr legell dû zimanî destpêk û mebest tûşe. hewllî eweyetî xwêner le wergêrranekey tê biga û hawkat peyamî nûserekeş destî tê werinedrê.

Wergêrr carêk be lay zimanî destpêk ba dedatewe ke pêy dewtirê (wergêrranî watayî semantic tiranisation). Lem şêwe wergêrraneda hewllî deda ta boy dekirê peyameke deskarî neka û wek xoy bîhêllêtewe, ew kate ew metirsiye heye ke zarawe û pêkhatay wa bîhêtewe naw zimanî mebestewe ke xwêner lêy tê nega û pêy namo bêt.

Carêkîş be lay zimanî mebest ba dedatewe ke pêy dewtirê (wergêrranî pêwendî communicative tiranisation). Lem şêwe wergêrraneda hewllî eweyetî ta boy dekirê deqeke bo xwênerî zimanî mebest hogr û xomallî bika, ew kate ew metirsiye heye ke deqe wergêrrdraweke betewawetî wtey nûsereke nebê.

Bo rûnkirdinewe seyrî em nimûnane biken:

(She looks like a red rose.)

wergêrranî watayî: (le gullî sûr deçê.), lêre bîr le zimanî destpêk kirawe.

wergêrranî pêwendî: (dellêy mange.), lêre bîr le zimanî mebest kirawe.

(More catholic than the pope)

Wergêrranî watayî: (katolîktir le pap). lêre bîr le zimanî destpêk kirawe.

wergêrranî pêwendî: (bawkmirdû desukina, nan û goşitxor deyut serî dekeme kuna). lêre bîr le zimanî mebest kirawe.

Ew nimûnane gullçnêkin le destewajey çwênrawî (tşbîhî) û zarawey wa ke detwanin karibrdî wergêrranî pêwendî pasa bidenewe. herçend weha pasadaneweyek rebeq niye. çunkû zêderroyî le wergêrranî pêwendî detwanê bibête hoy sirrînewey bonuberamey ferhengiy zimanî destpêk.

Taybetmendiyekanî wergêrr

Le naxewe xawenî behre û çêjî wergêrran bêt ke be rahênan û fêrbûnî yasa û rêsakanî wergêrran ziyatir geşe destênê.

şarezayî le zimanî destpêk û zimanî mebestda hebêt û herweha lêhatû bêt le biwarî rêziman û wajegorrî û ronanî wişe.

şarezayî lew babeteda hebêt ke werî degêrrê, bo nimûne eger babetêkî fızıya werdegêrrê debê şarezayî le biwarî fızıyada hebê û eger babetêkî kompiyoter werdegêrrê debê şarezay biwarî kompiyoter bêt.

Her dem hewll bidat nwêtirîn ferheng û wişename corbecorekan gîr bênê û ta boy dekirê têkellî kes û korrî wa bêt ke şarezayî yan ħeziyan le kurdewanî heye.

Le hemû biware corbecorekanda babet bixwênêtewe û watay hemû wişeyek bewrdî tê bigat û hewll bidat be kurdî watakey bidozêtewh, betaybet xwêndinewey rojname û govar û gwêgirtin le radiyo û telefziyon zor besûdh, çunkû lew şwênaneda ziyatir hest be allugorrî ziman dekirê û wişey nwê dexirête berdest.

Le tecrubie û ezimûnî nûseran û wergêrran çî kurd û çî bêgane kellk wergrê. Gelêk witar û nûsirawe û pertûk le biwarî wergêrran be zimane corbecorekan nûsirawe ke dekirê serçaweyekî baş bin bo wergirtinî ezimûn.

Hewll bidat berawrdî ew berhemaney wergêrrdrawnete kurdî legell zimanî destpêkiyanda bikat. zor berhem le înglîzî, ellmanî, ferenisayî, swîdî, nerwîcî, danîmarkî, îtalî, rûsî, turkî, 'erebî, farsî û htd kirawnete kurdî ke dekirê tecrubey başiyan lê wergîrê.

Le seretada hewll bidat deqî kurt werbigêrrê. zor asayîe ke wergêrranekey kirçukall bêt. bêguman wurdewirde başitir û başitir û bepêztir û parawtir debêt.

Hewll bidat le katî nûsînda reçawî yek şêwe rênûs bikat. Wişeyek le çend şwênda be çend corî ciyawaz nenûsêt.

Bêguman zanînî zimanî ziyatir astî lêhatuwî û karameyî mirov le zimanewanî da debate serewe.

Jêderekan

1. هفت گفتار درباره ترجمه، چاپ چهارم 1380، کورش صفوی.
2. وه‌رگ‌گیران هونه‌ره، د. جه‌مال نه‌به‌ز، چاپخانه‌ی ژین، 1958 سلیمان‌ی.
3. پرۆژه‌ی زاراوه‌ی زانستیی کوردی، که‌مال جه‌لال غه‌ریب، سوید 1991.

Lêkolînên dawî li ser zimanên hindûewropayî

Şoreş Reşî

Prof. Jenny Larsson, di hejmara pêncan ya kovara "Språk" (ziman) ya ku li Swêdê tê belavkirin nivîseka balkeş li ser lêkolînên dawî ye li ser zimanî belav kir. Jens Magnusson jî gor reşnivîsê xêzê wê kirine.

Larsson radigîhîne ku lêkolînên dawî yên li ser zimanî, ji encamên DNAYA ji ser hestiyên mirovan derketinê holê. Ew lêkolîn awayekî nû pêk hatiye û belavbûna zimanên hind-ewropayî nîşan dide. Li gorî wê lêkolînê, gelên bi wî zimanî diaxivin ji bakurê behra Reş û behra Kesk belav bûne. Herwiha li gorî lêkolînên berê yên li "Arîyan" hatine kirin jî gelê arî ji heman herêmê belav bûbû. Ev lêkolîna dawî jî ya berî xwe jî heta radeyekê piştrast dike. Ji van gelên belavbûyî, beşekî rêya Romanya, Polanyayê girtiye û heta Danmarkê çûyê, beşê din jî rêya Macaristan, Almanya, Holland û Ingîlîstanê girtiye. Ji vir jî şaxek diçe Îtalyayê. Beşek jî di ser Bulgarîstanê re diçe Yûnanîstanê. Xeta rojhilatê jî di bakurê Behra Kesk re diçe Asyaya Navîn. Beşê dawî jî ji Qefqasya, Kurdistan heta rojavayê Tirkyeya îro belav dibe. Hestiyên di laboratoran de hatine tehlîlkirin, belavbûna zimanî û beşên ku ew lê belav bûne bi vî awayî ispat dikin. Ew belavbûn hestiyê piştî zimanê hind û Ewropayî nîşan dide.



Şik tê de nîn e ku zimanê îro ne wek yê berî hezarên salan e lê lêkolînêran wekhevîya zimanên hind û Ewropayî bi rêya: **” forma gramatik, hevoksazî û peyvên hevpar”** derxistine holê. Bi vê rêyê xwestine xwe bigîhinin kaniya van zimanan. Teknîka nû ya li ser hestiyên mirovan hatiye sepandin, berê ji bo metodên biyolojîk dihat bikaranîn. Bikaranîna wê ji Ji bo arkeolojiyê encamên balkeş dane. Li gor wê, lêkolînêran derxistiye holê ku di navberê 5.000- 10.000 salan berî niha de koça mirovahiyê ya dîrokî pêk hatiye. Vî tiştî jî nîşan daye ku di vê demê de du koçên mezin li Ewrûpa pêk hatine, ya yekem koça ji rojavayê pêşrojhilat pêk hatiye û di serdema cotkariya yekem li Ewrûpayê de ye. Ya duyem, ji deştên bakurê Behra Reş û Kesk û rojhilatê behra Kesk ber bi Ewrûpayê ve pêk hatiye. Ji wê re çandê re **”çanda êlan”** tê gotin. Yanî ew kes in ên debara xwe bi xwedîkirina sewalan û çandiniyê hindik dikirin.

Larsson di gotara xwe dibêje: *”Arkelog ji berê de dizanin ku di dema neolitîk an jî dema kevîrî de çanda `seramîka tê zivirin` li herêmeke pir fireh belav bûye ku gelek taybetmendiyên wê yên hevbeş hene. Wek çêkirina seramîkan, şikilê wan, teknîka wan, bivirên şerî yên li ser wan û gorên wan ku ev giş nuqteyên hevbeş in. Lê arkeologan livhev nedikr ku ew seramîk cara yekem li ku hatine çêkirin. Hinekan li destpêkê digot: `Ew li başûrê Almanya hatine çêkirin. Paşê ew bû rojhilat. Piştî hinekan gotin Polanya û di dawî de jî gotin li çolê.` Niha wê yekê bersîva xwe girt! Ji lêkolînên li ser hestiyên mirovan hatî kirin de derket holê ku ev ji çolê ber bi nav û bakurê Ewrûpayê ve belav bûye.”*

”Lêkolînên li ser hucre/genê mirovî hatine kirin diyar dikin bê ew koça ji rojhilatê ber be rojavayê ve çûye, kengî pêk hatiye û çiqesî dirêj kiriye. Dîsa ew diyar dike ku mirov di nava Ewrûpayê de jî geriyane û çûne û hatine.”

”Lê rastîyek jî heyê ku ziman li ser genan nayê peyitandin, ew zimanê îro em pê deng dikin de derdikevê holê. Babetên gelên hînd û ewrûpa herî zêde li ser diaxifî yek **cotkarî** û yek hertiştê bi **çandiniyê** re giredayî ye.”

Min Kurmancî li lêkolîna Larsson zêdekir, lê pêwîst e ku lêkolînên beşa Kurdî pêşî di navbera zaravayên Kurdî de bên kirin. Piştî ku ew peyv di navbera Kurdî de zelal bûn û pê ve, mirov bi zimanên din re bide berhev dê baştir be. Ez wê beşê ji zimanzanan re dihêlim.

Swêdî	Grekî	Latîn	Sanskrit	Kurdî
Åker (å=o)	agros	ager	ajras	zevî (erdê bêyî ajotin)
Årder	arotron	arêtrum	---	sapan/pulix (erd rakirin)
Årjade(ä=ê)	---	arära	---	êrg (erd ajotin)

”Xeynî çandiniyê, mirov dikare li ser peyvên mîna **şîrêtirş, rûn, dutandinê** jî lêkolînan bike û bigehêje encamekê. Mirov dikare texmîn bike ku mirovên berê bi mî, hesp û şivantiyê re jî mijûl dibûn. Dikare li ser peyvên wan niqaşan bike. Dîsa **hirî, hirî-şehkirin, hirî-veçirin, terbeye kirin, dirûn û teşîristin** jî lêkolînan bike û bigehêje encamake hevbeş. Ev şêweya hevbeşiyê di cureyên hespan de mirov peyda dibe. **Hesp, canî** û peyva **kedîkirinê** de peyda dibe. Lewra 3000 sal bz li çolên behra Kesk hespên kedînekirî hebûn. Peyva hesp pir kevn e û di tevahiya zimanê hind-ewrupayî de heye. Mînak:

Swêdî	Grekî	Latîn	Sanskrit	Kurdî
Ok	zugon	iugum	yugam	qoşkirin (hesp)
Häst	--	equus	aşvas	hesp (esp)
Joar	--	--	--	suwar
Mus	mus	mus	muş	mişk
For	---	ovis	avis	mî
Ko	---	---	---	ga
Ull/karda	--	lena	---	herî
Older	aretrum	arätrum	---	arathar (iraniya kevn)/temen, mezin

Li ser **teker** û **arebên hespa** û tiştên bi wan re giredayî jî lêkolînan hatine kirin. Navê van tiştana di zimanên coxrafîk ne nezîkî hev de jî tên dîtin.

Hjul	kuklos	---	cakra	teker,xirxal
Hund	kuên	canis	şva-e	kuçik-se

Öga	---	oculus	akşî	çav
Öra	---	auris	--	guh
Nesa	---	neris	nêsê	poz-bêvil
Moder	---	meter	mêtar	dayik

Dema mirov li zimanê vedikole, lizimanan kat bi kat dikolê û dibînê ku ew çi qes nêzik û dûrin û dema di navbera wan de çiqese. Pir peyvê hene ku dema mirov nêzikî koka wan dibe dibîne ku bi kultura kevna neolîtîk de ew nêzikî hevin.

Rokonstrikasyona zimanê (vesazkirin û ji-nû-ve-çêkirina zimanê) li gorî mînakên me li jor dane, mirovên li wan çolan dijîn geger e bi zimanekî nêzikî hev biaxifiyana. Bi belavbûnê re û hêdî hêdî berê dîyalekt pêk hatine û piştê jî cudabûna zimanan hat derketiye. Hemû berjeng nîşan dikin ku koçberiya mezin ji rojhilatê ber bi rojavayê, berî 5000-4500 salan pêk hatiye û bi vî awayî ziman ji hev cuda bûne.

Mirov ji pişt an ji dawî de zimanekî çêke pedevî bi dem, zanîn û lêmêzekirinê heye. Metod wiha ye:

1. Zimanan bi deng, peyv û gramatîkê wekhev be.
2. Wekhevî û cudabûna ziman bi hema metodê bîn şirovekirin.
3. Zimanên din jî hema monster-çîn a didine an ne.
4. Wekheviya û cudahiya sîstema deng, peyvsazî û tewandinê.

RAVEK DI SORANÎ DE

Dilyar Amûdî

Navdêr di soranî de ji çend aliyan ji kurmancî cuda ne lê herwiha çend taybetmendiyan hevbeş jî hene lew ta ku em bikarin ravekan di soranî de fêhm bikin, ya baş ew e ku em pêşî li ser van cudahiyan bisekinin û dûre dest bi ravekan bikin:

Navdêr ji aliyê mêjerê ve:

Navdêr di soranî de ji aliyê mêjerê ve dibin du beş:

1. Yekhejmar: ew rewş e ya ku yek kesî an yek tiştî nîşan dide û di qertafê nagire.

Mînak:

Soranî	Kurmancî
Kur	kur
Kiç	Keç/keçik
Jin	Jin
Çeqo	kêr

2. Pirhejmar: ew rewş e ya ku ji bo komekê ji duduyan an jî zêdetir ya kes an tiştan dihê bikarhanîn lê cudahiya wê ji kurmancî ku rewşa xwerû wek kurmancî tune anku her divê qertafa “an”ê bigire: mînak:

Soranî, yekjimar	Soranî, pirjimar
Kur	Kur+an =kuran
Kiç	Kiç+ an=kiçan
Jin	Jin+an=jinan
Çeqo	Çeqo+an=çeqoyan

Nîşe: Eger navdêr bi dengdêrekî bi dawî bibe wê çaxê tîpa kelijandin an alîkar “y” pêwîst e lê di hin rewşan de eger navdêr bi “e”yê bi dawî bibe, dibe ku “e” bê avêtin û pêdivî bi tîpa alîka

Mînak:

Mamosta: Mamosta + an = mamostayan

Qutabxane: Qutabxane + an= qutabxanan

Çeqo: Çeqo + an = çeqoyan

Nîşe: Di hin rewşan de û li gel hin peyvyan paşgirin cuda digirin, ew paşgir(at, hat, cat, wat, gel û eha) in. Mînak:

Bax (Bi kurmancî bax): Bax + at= baxat.

Dê(Bi kurmancî gund): dê + hat= dêhat.

Sewze(Bi kurmancî sebze): sewze+ wat= sewzewat

Mêwe(Bi kurmancî fêkî): mêwe+cat=mêwecat

Kur(Bi kurmancî kur): kur + gel=kurgel

Sall(Bi kurmancî sal): sal+eha= saleha

Navdêr ji aliyê nasîn an binavkirinê ve:

Navdêr ji aliyê nasînê ve dibin du beş:

1. Navdêrên naskirî an binavkirî û awayên wê

Di soranî de navdêr bi du awayan dibe naskirî(nasraw)

a. bi zêdekirina qertafa “eke” yan hin caran jî “e” û li dawiya navderî zêde dibe:

navdêr	qertaf	navdêrê naskirî
kurr	eke	kurreke
çira	eke	çirayeke/çirake
bira	eke	birayeke/birake

Nîşe: eger navdêr bi dengdêrekî bi dawî bibe, ew dengdêr him dikare bimîne eger tîpa kelijandinê lê zêde bibe, him jî dikare bê avêtin û tenê “ke” lê zêde dibe.

b. Di van rewşan de jî pêdîvî bi qertafa naskirinê tune,

1. Bi navên taybet, wek “Ehmed, Şiyar û Dilyar”, navên ajalan wek “şêr, gurg”, navên welat “Êraq, Êran...” û navên herêman wek “Bask, bakur...” û navên bajar û navçeyan “Amed, Mêrdîn...” jî
2. bi cînavkên diyarker “em...e, ew...e, em...ane, ew...ane”¹⁰⁸, mînak:

¹⁰⁸ Ev cînavk di kurmanciyê de wek “ev, ew, ev(pirjimar),ew(pirjimar), vî,vê, wî, wê, van, wan tên bikarhanîn:

Ev heval hat

Ew zilam çûn

Lê di soranî de beşê duyem yên cînavkan li navdêrê diyarkirî zêde dibe: mînak:
em sêwe: ev sêv, em sêwane: ev sêv(pirjimar)

soranî: Em kurre zîrek e, kurmancî: Ev kur(ik) zîrek e.

û wisa ew navdêr dibe navdêrekî naskirî û pêdiviya wî bi qertafa naskirinê çênabe.

2. Navdêrên nenaskirî an nebinavkirî/nediyar

Ev bi zêdekirina qertafên wek “êk” an “ek” pêk dihê û wek kurmanciyê wateya nebanvkinê dide peyvê anku wek çawa di kurmancî de em “ek” li navdêrî zêde dikin:

Mînak:

Soranî: Kurr + êk/ek: kurrek

Kurmancî: Kurr + ek: kurek

Soranî: Kurêk hate mallman

Kurmancî: Kurek hat mala me.

Navdêr ji aliyê zayenda rêzimanî ve:

Di soraniyê de zayenda rêzimanî tune, anku navdêr wek nêr an jî mê nayên hesabandin.

Ravek

Ji ber ku di soranî de zayenda rêzimanî tune lew yek veqetandek tenê heye û ew jî “î” ye.

Mînak:

Kurmancî: Jina kurd

Soranî: Jinî kurd

Kurmancî: Kurê qenc

Soranî: Kurrî çak/baş

Nîşe: Eger raveber bi dengdêrekî bi dawî bibe, wê çaxê berevajî kurmancî, tenê tîpa “y” li ser navdêrî zêde dibe û wisa ravek pêk dihê.

Kurmancî: birayê biçûk

Soranî: biray biçûk

***Em ê niha gav bi gav li ser awayên ravekan di soranî de bisekinin:**

Yekjimariya nediyar: ev şêweya ravekê wek kurmanciyê bi “yek, ek” yan jî “yêk, êk”ê tê duristkirin:

Mînak

1. Kur + êk + î + baş: kurêkî baş(kurmancî: ew(filan) kurê baş=
2. Rojname + y + êk + î + kurdî: rojnameyêkî kurdî(kurmancî ew (filan) rojnameya kurdî)

Teşeya diyar

Raveber + eke + y + raveker

soranî: piyawekey baş, rojnamekey be kurdî

kurmancî: (ew/filan) mêr(ik)ê baş, (ew/filan) rojnameya baş

Anku ev têşe bi tena serê xwe di kurmanciyê de tune lê wek wate, encex bi awayê li jorê diyarkirî were wergerandin.

Pirjimariya teşeya diyar

Ev teşe bi zêdekirina “ekan” û “î” li ser navdêrî pêk dihê û wateya wê dîsa şeweyeke diyarkirî lê pirjimar e.

Mînak

1. Jin + ekan + î + baş: jinekanî baş (ew jinên baş)
2. Kur + ekan + î + çak: kurekanî çak (ew kurên qenc)

Pirjimariya giştî

Ev şêwe yê ravekê di kurmancî de bi veqetabdeka “ên/yên” tê duristkirin lê belê di soranî de ew bi “an/yan”ê tê duristkirin

Mînak

3. Jin + an+ î + baş: jinanî baş (jinên baş)
4. Kur + an + î + çak: kuranî çak (kurên qenc)
5. Kitêbanî xoş: kitêbên xweş
6. rojnameyanî kurdî: rojnameyên kurdî

Nîşe: Di soraniyê de tewang tune lew raveber çî navdêr çî rengdêr be, her di rewşa xwe ya xwerû de dimîne û ti carî nayê tewandin.

Çavkanî:

Nerîman Xoşnaw: Rêzimanî kurdî

Husein Muhammed: Kurterêzimana soranî bi kurmancî

ferhengoka dadnasî ya inglîzî-kurdî

DADNAME



Kurte

/ lêker / verb

n navdêr / noun

r rengdêr / adjective

A

abduct / (mirov) revandin

abducted revandî

abduction *n* revandin

abductor revîner

accept / pejirandin, qebûl kirin

acceptance *n* pejirandin, qebûlkirin

accepted pejirandî, qebûlkiirî

accepter qebûlker, pejirîner

acceptor wergir, pêşwazîker, qebûlker, pejirîner

accomplice hevtawan, kesa/ê ku li gel kesekî din tawanek kiriye

account / hesab kirin, hejmartin, jimartin, mihasebe kirin; *n* hesab, hejmar

accountant mihasib, hejmêrkar

accusation tomet, tometbarkirin, tawanbarkirin

accuse tometbar kirin, tawanbar kirin

accused tometbar, tawanbar, bersûc

acknowledge itiraf kirin

acknowledgement itiraf

acquit / berdan, dest jê berdan, beraet kirin

acquital *n* destjêberdan, hiştin; beraet, beraetkîrîn

act / xebitîn, kar kirin, doz vekirin; *n* qanûn(ek)

action xebat, kar; doz

adjectival law qanûna dadgêrriyê

adjudicate biryar dan, ferman kirin

adjudication biryar, ferman, hukim

administrate bi rê ve birin, îdare kirin

administration birêveberî, îdare

administrator birêveber, gerînde, îdareker

admiral admîral, efserê hêzên deryayî, zabitê qewetên behrî

admissible dadbar, meqbûl, delîlên ku dikin rê bê dank u dozek li dadgehê vebe û dadgeh biryarê li ser bide

admissibility dadbarî

admonish şîret lê kirin, nesîhet lê kirin, tembî lê kirin; hişyarî danê

affiant sondxwer

affidavit sondname

aeronautics firvanî, firokevanî

affirmation erêkirin, belêkirin, qebûlkirin, pejirandin,

affirmative erênî, belênî, qebûlker

agency fermangeh, dezgeh, daîre

agent biker, kirde, kirar, ajan, encamder

agree li hev kirin; hevbîr bûn

agreement lihevkirin, peyman

aid alîkarî; alîkarî kirin

aid and abet alîkarî û teşwîq, alîkarî û kişkirin, alîkarî û handan (bo kirina tawaneke)

air hewa

aircraft firoke, balafir, teyare, amûra firînê

air pollution lewitandina hewayî

airport firgeh, firokegeh, balafirgeh, metar

alien biyanî, xerîb, xaricî, ecnebî, ne welatî, ne hevvelatî

allegation idia, angaşt

allege idia kirin, angaştin

alter / guherandin, guhartin

alteration *n* guherandin, guhartin

alternative alternatîv, vebijark

alternative dispute resolution sulhkirin, sazişkirin, çareserkirina pirsgerêkê bi rêyên alternatîv, ne bi rêya biryarên dadgehan

amend (teksteka qanûnê) guherandin

amendment guherandin(a teksteka qanûnê)

ancillary (mijara) duyem, (babeta) ne serekî

annotation têbînî, nîşe, not

answer *n* bersiv, cewab; / bersiv dan, cewab dan

antitrust dijî tekdestiyê, dijî pawandariyê, dijî monopolîzm, dijî trûstê, dijî

antitrust acts qanûnên dijî tekdestiyê / monopolîzmê

appeal / gilî kirin, itiraz kirin, şikayet kirin; *n* gilîname, itirazname

appear / hazir bûn, amade bûn (li rûniştina dadgehê)

appearance *n* hazirbûn, amadebûn (li rûniştina dadgehê)

appellate court dadgeha gilîkirinê, dadgeha pêdeçûnê, dadgeha temyîz

appellee bergilî, ber-itiraz, kesa/ê ku gilî lê hatiye kirin

appendix pêvek, paşko (belgenamêyên bi belgenamêya serekî ve)

applicant daxwazker, miraceetker, serlêder

application daxwaz, daxwazname, miraceet, serlêdan; sepandin, sepan, aplikasyon

apply daxwaz kirin, miraceet kirin, serî lê dan; sepandin, pê kirin

approach / nêzîk bûn, xwe nêzîk kirin; *n* nêzîkbûn, xwenêzîkkirin

appropriate bikêrhatî, guncayî, lêhatî, maqûl

approve pesind kirin, pejirandin, qebûl kirin

approved pesindkirî, pejirandî, qebûlkirî

approver pesindker, pejirîner, qebûlker

arbitrate navbeynkarî kirin

arbitrator navbeynkar (kesa/ê ku ji aliyê du aliyan ve hatiye destnîşankirin daku pêşniyarekê li ser pirsgirêka wan bike û ew herdu bi pêşniyarê razî bibin)

arbitration navbeynkarî

arraign tawanbar kirin, ji ber tawanekê gazî dadgehê kirin

arraignment tawanbarkirin, gazî dadgehê kirin

arrest girtin, girtin ber çavdêriyê, berbend kirin

ask pirsîn, pirs kirin, pirsiyar kirin

assault êriş, palemar

assign raguhastin, neqil kirin, dan

assignment raguhastin, neqilkirin, dan

assumption pêşbînî, texmîn

asterisk stêrk, asterisk, nîşana *

astronaut stêrger, astronot, esmanger

astronomer stêrnas, astronom

astronomic stêrnasî, têkilî stêrnasiyê, astronomic; (meczî) hejmareka zêde mezin

astronomy stêrnasî

at issue berbiryar, dema ku babet bo biryardanê hazir e

attorney, attorney-at-law parêzer, avûkat, mihamî

attorney-at-fact nûner, wekîl

aviation firvanî, firokevanî

aviator firvan, firokevan, pîlot

aviatrix (jina) firvan, (jina) firokevan

B

bail kefalet, destberî, derhûd

bail bond kefaletname

bailiff fermanber, bicihker, amir, kehya, keyxwe, serkar, şehne

bankrupt iflaskirî, têkçûyî, werritî, faşilbûyî, mehfbûyî (şirketa yan kesa/ê ku êdî nikare ji bin barê deynên xwe derkeve)

bankruptcy iflas, têkçûn, werritîn, mehfbûn

bar yekîtiya parêzeran

bar association yekîtiya parêzeran (avûkatan, mihamiyan)

battery lêdan, lêxistin

belief bawerî, qenaet

believe bawer kirin

bench kursiya dadgêrran, (bi mecazî) dadgêr yan dadgeh

bench trial dadgêriya bê jûrî (lijneya sondxwariyan)

beneficiary mîraswergir, mîrasgir

bequeath diyarî danê (bi wesiyetnameyê)

bequests diyarî (bi wesiyetnameyê)

beyond a reasonable doubt bêgumaneka hişmendane

bill (check) fatûre, wesle, hesab, sened; (bill of law) pêşniyar-qanûn; (banknote) bankenot, pareyê kaxezî

bond kefalet

booking qeyd kirin, tomar kirin (qeydkirina şûntil, wêne û agehiyên din yê naskirinê yê kesekî berguman)

breach binpê kirin, mandel kirin, pêşil kirin, heq xwarin, dijî qanûnekê yan heqê kesekî tiştekirin, li gor peymanê nekirin

breach of contract binpêkirina peymanê, şkandina peymanê

brief têbînî, bîrname

burden bar, berpirsiyarî

burden of proof barê şahidiyê, berpirsiyariya şahidiyê

burglar talanker, şelîner, dizê ku dikeve malan

burglary talan, şelandin, ketin malan û jê dizîn

bylaws rêbazname, rêçikname

C

calendar salname, teqwîm

call gazî kirin, bang kirin, vexwandin

canon of ethics sincname, exlaqname, rêbazname

capacity şiyarî, hêz, qabiliyet

capital *n* sermaye, mal, malîyet, pare; *r* serekî, mezin

capital punishment hukmê îdamê, hukmê mirinê

capital city paytext, serbajar

caption sernav, serhevok

case babet, mijar (li dadgehê)

case law biryarên dadgehan

cause doz, daxwaz

caveat hişyarî, hişyarkirin

censor / sansor kirin, qedexe kirin; *n* sansorker, qedexeker

copyright sansor, qedexe

censure lome, lomêkirin

certificate bawername, belge

certificate of title belgeyê milî

certification rastandin, diyar kirin ku rast e yan resen e

challenge *n* hevrikî, rikmane, dijberî; / hevrikî kirin, dijberî kirin

chamber kabîn, çavî, ode (ya dadgêrran)

change guherandin, guhartin; guherîn

charge berpirsiyarî, wezîfe, peywîr, erk, vatinî

chattel hûrûmûr, malê veguhêzbar, neqilbar, menqûl

chief *n* serok, serek, ser-; *r* serekî

child zarok, eyal, tîfal, mindal, biçûk

chronicles demname, kronîk

chronological kronolojîk, li gor demê rêzkirî

circumstance rewş, destûdar, kewdan, hal, wezîyet

civil medenî, sivîl

civil action doza medenî, daxwaza sivîl

civil code qanûna medenî

civil law dada sivîl, dada bi qanûnnameyan (ne bi biryarên dadgehê) diyarkirî

claim *n* daxwaz, doz; idia, angaşt; / daxwaz kirin, doz kirin; idia kirin, angaştin

class kom, ref; çîn; sef, sinif

class action doza komî

clear zelal, paqij, pak; berçav

clemency efû, bex_andin, efûkirin

client mişterî; (yê parêzerekî) xwespêr, miwekil

cliente koma mişterîyan / bikirran, midawim

code rêbaz, rêçik, qeyd, bend; kod

code of conduct rêbazname, rêçikname

code of laws qanûnname, hemû qanûnên welatekî

codicil guherandina wesiyetnameyê

codification berhevkirina qanûnan

collate rêz kirin, berhev kirin

collect kom kirin, berhev kirin, civandin

collection berhevok, komkirin

common giştî, gelemper, umûmî, amî

common law dada biryarî, dada bi rêya biryaran peydabûyî (ne bi rêya qanûnnameyan)

commission komisyon, deste; destheq; spartin

commit (tawanek) kirin

commitment pêbendî, ehd, soz

commutation efû, bex_andin, efûkirin yan kêmkirina hukmî

company şirket, kompanya, fîrma

complainant gilîker, dozker, itirafker

complaint gilî, itiraf, doz

conciliate sulh kirin

conciliation sulh, sulhkirin

condemn tawanbar kirin, hukim kirin

condemnation tawanbarkirin, hukimkirin; misadere, misaderekirin, desteserî

confiscation desteserî, misadere, istimlak, giştîkirin, neteweyîkirin (malê xelkê ji aliyê dewletê ve hatine standin û heqê xwediye wan jê re hatin dan)

conservatorship serperiştî, çavdêrî (ya kesekî ku nikare birêveberiya male xwe bike)

constitution destûr, qanûna bingehîn, makeqanûn

constitutional destûrî, makeqanûnî, li gor qanûna bingehîn

constitutional court dadgeha destûrî, dadgeha qanûna bingehîn

consume ber xwarin, kurrîn, xerc kirin, mesref kirin

consumer bikirr, mişterî, kirriyar, xerîdar

consumption berxwerî, mişterî, istihlak

contemn / heqaret lê kirin, yariyên xwe pê kirin, bêqîmet kirin

contempt *n* heqaret, yarîpêkirin, bêqîmetkirin

counsel dadnas, parêzer, avûkat, mihamî

counter-claim dij-gilî, giliya dijber

court-appointed attorney parêzera/ê dadgehê wezîfedarkirî

court costs lêçûnên dadgêriyê, mesrefa dadgêriyê

court of justice dadgeh

court rules rêbazên dadgehê, qeyd û bendên dadgêriyê

copy kopî, kopya, nisxe

copyright heqê afirînerî, heqê nivîserî, kopîrayt

consent li hev kirin, razî bûn, qane bûn, qaîl bûn

convince qaîl kirin, qane kirin, pê dan bawerkirin

country welat

countryside gund, derveyî bajaran

coup d'état kudeta, şoreş, derbe

court dadgeh, mehkeme

credit deyn, qerz, qer, kredî

criminal tawanî, cinayetî, cerîmeyî

crime tawan, cinayet, cerîmet

cross-examination lêpîrsîna xaçîkî, pîrsîna ji şahidên aliyê dijber

custody çavdêrî, parastin, spartin, nezaret, wesayet

Dê bidome

Kurterêbera rastnivîsînê

Li vê derê em ê rêbazên bingehîn yên kovara Kanîzar bo rastnivîsînê diyar bikin. Li şûna ku em dûr û dirêj meseleyê rave bikin, em ê bi çend nimûneyan merema xwe pêşkêş bikin.¹⁰⁹

Kovara Kanîzar wiha dinivîse:

- 1) "ku", ne "ko": ew dibêje ku...
- 2) "iy", ne "îy": çiya, jiyar, kiriye...
- 3) "ji bo, li gel, li ser...", ne "jibo, ligel, liser..."
- 4) "kurd im, kurd î, kurd e, kurd in", ne "kurdim, kurdî, kurde, kurdin"
- 5) "zimanê kurdî, gelê kurd, adar, newroz", ne "zimanê Kurdî, gelê Kurd, Adar, Newroz"
- 6) "ez ê bikim, min ê bikira", ne "ezê bikim, minê bikira"
- 7) "hevalê min ê baş", ne "hevalê minê baş"
- 8) "zimannasî, serokkomar, xurttir, bilindtir...", ne "zimanasî, serokomar, xurtir, bilintir..."
- 9) "bigirim, binivîse, nekişînin...", ne "bigrim, binvîse, bikşîne..."
- 10) "Chomsky, Einstein, Shakespeare...", ne "Çomskî, Aynştayn, Şêkirspîr..."
- 11) "cînav di kurdî de, gerînek li Kurdistanê, peyamek ji wî...", ne "di kurdî de cînav, li Kurdistanê gerînek, ji wî peyamek..."

Kovara Kanîzar

¹⁰⁹ Bo agahiyên berfirehtir, binêrin: Rêber – Rêbernameya rastnivîsîna kurdî:
<https://zimannas.wordpress.com/2015/07/06/reber-rebernameya-rastnivisina-kurdi/>